Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

PRE-803

Institut kurde de Paris

OFFERT
PAR
JOYCE BLAU

Institut kurde de Paris

fr... Lo.V.

KITÊBXANA HAWARÊ
HEJMAR
19

CEGERXWÎN

# DÎWANA CEGERXWÎN

Institut kurde de Paris

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1945

Institut kurde de Paris



XWDIYÊ DÎWANÊ

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## DI WARÊ WELAT Û MILETPARÊZIYÊ DE


| | |
|---|---|
| Agir û pîrûsk | 3 |
| Dezgirtiya xortan | 4 |
| Ji bin destan tu derkev | 6 |
| Ji ber derdê ewan | 6 |
| Ma yek ji we nabî beran | 7 |
| Xewa birçiyan nayê | 8 |
| Li dinyê bêserî | 9 |
| Destê şêx maçî mekin | 9 |
| Bilbil digot | 10 |
| Cegerxwîn bes | 11 |
| Divê em bibin yek | 11 |
| Bi seydayê Xanî re | 12 |
| Wezîfey xom | 13 |
| Xwediyê miriyan kor e | 14 |
| Èl yeman beg yeman | 14 |
| Le xewî xeflet helse | 15 |
| Bêriya welêt | 16 |
| Pendname | 18 |
| Dilê Cegerxwîn | 20 |
| Riya rast û dirist | 21 |
| Hêj dey nakin | 22 |
| Ji yewnana bipirsin | 22 |
| Silav li sifra hazir e | 23 |
| Em cegerxwînên her çaxê ne | 24 |
| Ev awa dom nakê | 24 |
| Ji kulan bûme Cegerxwîn | 25 |
| Tarîxa şêx Seîdê rehmetî | 26 |
| Qelsemêr tim dibên 'ax | 27 |
| Xêza qelema Cegerxwîn | 28 |
| Ra welat û al û ol | 29 |
| Rêberê me seydayê Xanî | 30 |
| Xanî kurd ne kir hişyar | 31 |
| Doz li nik şûr û pera | 32 |
| De bigirî li ser tac û sera | 33 |
| Va ye rê | 34 |
| Heke mezin ranabin | 35 |
| Em û gur | 37 |
| Ji xameya min re | 38 |
| Kurdistan im ka | 39 |
| Derdê min kûr e | 40 |
| Fala qereçiyê | 41 |
| Ma tê li ser kê bigrî | 43 |
| Derwêş | 43 |
| Qulingê perşikestî | 44 |
| Pîra torê | 45 |
| Dînê me tête zanîn | 46 |
| Serxwerabûna mirîşkan | 47 |
| Şehnana şehîdan | 50 |
| Nezan bê ço nabê hişyar | 56 |
| Konê reş | 57 |
| Xaniyê cotyara | 58 |
| Xurtiya yekîtiyê | 59 |
| Welat hêj keç e | 60 |
| Cihan û Cegerxwîn | 61 |


Institut kurde de Paris

## MARŞ Û XWEŞXWAN


Em guhderz in 65
Rêçika xortan 67
Tûtin 67
Zilamî bêgane debînim 68
Ola me xortan 69
Em ne kole ne 69
Hex felek 70
Roja xwendevanan 71
Kurdo marş 72
Tev egîd û pehlewan 73
Çaxa me nû dest pê dikî 73
Nûroja Keyo 74
Sermiyan 74
Koma miletan 75
Navtêdan 76
Herne wa 77
Serxwebûn 78
Deşt û lat 78
Keyo 79
Şêrîn 79
Ez ezîn ne ma 80
Dibistan 81
Ji piçûkan re 81
Ala min 82


## NAME Û REŞBELEK


Ji Hawarê re 85
Ji xwediyê Hawarê re 86
Ji kiriyarên Hawarê re 87
Ji Ehmed Namî re 88
Ji Hevalekî min re 90
Şina şêx Kemal 91
Ji Elî Ewnî re 92
Ji Qedrî Can re 93
Ji Osman Sebrî re 94
Ji Hişyar re 95
Ji Wanî re 95
Bersiva şêxekî 96
Bersiva Evdilxaliq Esirî 97
Pêncika min û Zibêrê kurd 98
Ji Hisênê Emîn re 99
Ji Şewket Zilfî beg re 99
Ji mezinên kurdan re 100


Institut kurde de Paris

## ŞIHRÊN FELSEFÎ


Jîn 101
An dirav an derw 102
Ax pere 104
Ez im pîrê mixan 105
Kerê reş 106
Erê xwîşkê 106
Herfên nû 107
Ji Keyo re 109
Dinya teqreq e 109
Ehremen û Hurmiz 110
Dinya ne hêja ye 112
Mirî dimrî şêrîn dibî 113

## ŞIHRÊN EVINDARIYÊ


Bi dil herkes gunehkar e 114
Xanimekî ciwan 115
Ji destê yar 115
Gewrê 116
Çavbelekê 116
Keç 117
Perîzade 117
Ez û bilbil 118
Dilberên cengê 119
Daye derê evînê ye 120
Gulfiroş 121
Çi ye dermanê dilê min 121
Wek Siyamed 122
Çavreşa min 122
Êriş 123
Reş meposê 124
Şeva qedrê 124
Were yarê 125
Yar bi xêr hat 126
Sorgul 126
Zeriya min 127
Ez dibirîn im 128
Temaşa dilber 129
Şehînşahê keçan 129
Rojê ji bircê daye rê 130
Şox û şengê 130
Dûrî dijwar e 131
Xwesriwa rindan 132
Leylê 132
Zilfê meqesî 133
Ava heyatê 133
Hêva li çardeh 134
Serwesehê 134
Mahîtab 135
Çilo ye keç 135
Şepalê 136
Perî 136
Mey û nev 137
Li seyranê 138
Nexweşê evîn im 138
Xezala Kepez 139
Şeva hîcran 140
Çarşefê bavêj 140
Ey dîlber 141
Gazind ji kê 142
Li ser masê 143
Silava ji yar 144
Belîx 144
Cana 145
Li serayê 146
Şekerlêvê 147
Daxên singê 149
Diyariya yarê 150
Pîrî û ciwanî 151
Gulê bê xar 152
Keçê dilber 153
Li bexçe 154
Dîlbera nazik 155
Hahî felekê 156
Surşirînê 157
Serlaca keyan 158
Lavlav çi ne 159
De zû têderanî 160
Dengbêj 162
Ji serleşkerekî re 162
Bi kurtî jîna min 163




Institut kurde de Paris

# CEGERXWÎN

Navê wî Şêxmûs e. Navê bavê wî Hesen û yê diya wî Eyşan bû. Hesen kurê Mihemed, Mihemed kurê Mehmûd, Mehmûd jî kurê Elî ye.

Li gora ko seyda ji min re gotiye ev Elî digel birayê xwe, ji nav gurdilan, ji gundê Pêkendê hatiye Hesarê, nav dekşûriyan. Hesar bi Kercosê ve ye û dikeve rojavayê Heskîfê.

Hesen keçek û du kur hebûn. Keça wî Asiya nûxwiriya wî bû. Di pey keçikê re Xwedê kurek da bû-yê, bi navê Xelîl. Di pey re û di sala 1903an de Şêxmûs di gundê Hesarê de ji diya xwe bûye.

Wextê bavê wî çû rehmetê Şêxmûs hêj kiçik bû, li cem birayê xwe Xelîl dima. Lê ji ber ko li ber destê jinbirê debar ne dikir ber bi xweha xwe ve direviya.

Hesen beriya seferberiya sala 1914an ji Hesarê bar kiri bû û hatî bû Amûdê. Wextê ko çû rehmetê zarowên wî ji nû ve vegeriya bûn Hesarê. Piştî mideki dîsa hatin Amûdê û li wê derê bi cih bûn.

Êdî Şêxmûs li cem xweha xwe dima. Xweha wî ew dişand ber pez û carina jî jê re paleyî û rencberî jî dida kirin.

Lê Şêxmûsê ko di kurahiya dilê wî de agirekî miqedes vêdiket qîma xwe bi vê jînê ne dianî; ji nik xweha xwe jî direvî û gund gund li medresan û xwendegahan digeriya.

Gelek ne ketin navê ew Şêxmûsê sêwî û şivan bû feqeh Şêxmûs û çavên xwe li dinya zanistiyê vekir.

Herwekî di Kurdistanê de adet e: Şêxmûs her û her medreseyên xwe diguhartin. Piştî ko di medreseyên deştê de xwend, çû welatê soran û jê gihaştiye heta deşta Lehîcanê, di nav Kurdistana ecem de.

Wextê Cegerxwîn ji welatê soran vegeriya deştê rast bi rast çû gundê Telşeîrê û lê de bi cih bû û di xwendinê de pê da erdê. Xwendina xwe li nik seyda Ibêdilah qedandi be jî, ji ber ko mela Ibêdilah di vê navê de çû bû rehmetê, icaza xwe ji birayê wî, mela Fetilah, standiye.



Institut kurde de Paris

*Şêxmûsê sêwî yê ko bi rêve bû bû feqeh êdî gihaşti bû paya seydatiyê. Wi seydayê ko piştre di nav kurdan de bi navê Cegerxwin deng bidaya.*

*Piştî temamkirina xwendina xwe, Şêxmûs melatiya gundan dikir. Dibû pêşnimêjê gundiyan, mehra wan dibirî, zeka-ta wan dixiste rêzika şêrietê û bi vî awayî dijî.*

*Vê jiyînê ji gelek dom ne kir. Cegerxwin dev ji melatiyê berda û dest bi cotkariyê kir. Digel kurmancan du gund ava kirin. Navê gundê ko bi xwe tê de rûdinişt kiri bû ceheneme. Seyda ji bo Cehenemê digot, ma ji xwe ne welê ye; miletê ko ne bi ser xwe ye ma sekana wî ne ceheneme ye.*

*Cegerxwin wextê ko dev ji melatiya gundan berda bergehê xwe ji guhart. Cib û şaş avêtin, riha xwe a dirêj û çarkenar ediland û dawiyê kete qelefata xortên vî zemanî, herwekî suretê wi şani dide.*

*Wextê Cegerxwin ev inqilabên ha çêdikirin, di nav miletê wî de ji bi destên çend bijartan inqilabine mezin çêdibûn.*

*Welatjori di şerê biserxwebûnê de şikesti bûn. Qehremanên wi şeri, yên ko ji kuştinê xelas bû bûn, xwe da bûn çiyan û bera neyarên xwe didan. Hinên din xwe gihandi bûn derveyi welêt, elvalin datanîn û ji felata welatê xwe re dixebitin.*

*Di Kurdistana Iraqê de zarowên kurdan di dibistanan de, bi herfên erebi be ji, bi kurdi dixwendin. Li Bexda, Silêmanî û li Rewandizê kovar û rojnameyine kurdî bi der dihatin.*

*Kurdên Rewanê, xêra teşkilata welatên Sovyêtistanê, bû bûn xwediyê elfabêke latini. Bi vê elfabeyê rojnameyên xwe derdixistin û dersa zarokên xwe di dibistanên xweser de bi vê elfabeyê û bi zimanê wan ê mader digotin.*

*Di Sûriyê de ji elfabeke latinî hati bû belav kirin. Herçend ew elfabê di dibistanan de ne hati be jî xwendin, pê kitêbine dibistanî derdiketin, kovar û rojname belav dibûn, xort û kalin ji elfabeya nû ji hev hin dibûn û her tiştên xwe pê dinivîsandin.*

*Seyda jî şûrê xwe ji kalên kişandi bû, bera pût û latên îtiqadên batil û xurafeyan dida: şerê neyarê hundir*

*dikir, li kurmên darê li kurmên ko dar dixwarin digeriya. Ew kurmên ko seydayê Xanî berî sê sed salî pêş me kirine.*

*Seyda rast bi rast bela xwe da bû mîr û beg û axa û şêxan. Ji lewre ji xwe re dijminine xurt û dijwar peyda dikirin. Carina cih lê teng dibû. Lê seyda, bê perwa, şûrê xwe di ser serê wan re vediweşand û eşkere digote wan, ez dikim bi vî şûrî serê we jêkim.*

*Lê divêt bête gotin ko ji zelamên ko di sefa neyarên wî de dihatine ditin, peyayine hêja û welatparêz meyildariya wî dikirin û ji tayê wî dibûn. Nemaze rehmetî Haco axa rast bi rast destê xwe datanî pişta wî, di riya cidal û cihadê de ew dihêvot û jê re digot, "teqsîr meke her eyb û kêmasiya me bibêje, lê têkili din û diyanetê mebe."*

*Tiştên ko me li jor gotî, birekî jînenîgariya (tercimey-hal) Cegerxwîn e. Herweki, ji ber bêgaviyê di vê diwanê de me her tişt kurt û ketebir kiriye, me jînenîngariya Seyda jî bi kurtî got*[1]. *C. A. B.*

## CEGERXWÎN Û DİWANA WÎ

*Ji mêj ve, diwana Cizerî û Mem û Zîna seydayê Xanî, ji meydanê kêm bû bûn. Heweskarên şeir û edebiyata kurmancî li wan digeriyan û bi dest ne diketin.*

*Vê car me dî, ji nişkave, dîwana Cegerxwîn, bi çapeke pir qenc kete meydanê. Ez bawer dikim ko dîwana Cegerxwîn dewsa ku Mem û Zîn û dîwana Cizerî vala hiştine ewê tije bike. Xwendevanên delal, ewê tê de zman û rûhê cenabê Xanî ê xurt û nezma dîwana Cizerî a ahengdar bibînin.*

*Cegerxwîn, pirsên biyanî jî pir ne xistine nav şihrên xwe, bi zimaneke sade û selîs nivîsîne.*

*Qîmeta şehrên wî a mezin ji ev e, bi rûhekî nû ajotiye ser fikrên kevnare û bi zmanekî şêrîn û şe'bî lewş bûn û zerera wan nîşan kiriye.*

*Ez ji şairê me î şe'bî re pêşveçûn û ji dîwana wî re jî rewaceke baş hêvî dikim.*

*Şam: 18-2-945 QEDRÎ-CAN*

---

[1] Me dil hebû em tehlîlekê li ser şihrên Cegerxwîn binivîsînin û wesfên şairtiya wî bêxin ber Ronahiyê. Lê ji ber tengiya wext me dev jê jî berda. Heke Xwedê ji me re hez kir emê wê tehlîlê di kovarekê de dê balav bikin.



Institut kurde de Paris

# DI WARÊ WELAT

# û

# MILETPARÊZIYÊ DE

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# AGIR

## û pirûskên dil û dîwana Cegerxwîn

Agirî tev agir e, dûrî herin dijwar e;
Ne agirê îsal e, lê agirê sedsale kevnar e.

Gava çavên te lê dikevin bi şewq û şemal;
Tu dibê qey qurix e, lê ne qurix e tev ar e.

Bi xwendina wê xew dibî dijminê çavên reş;
Şev tev diçî, lê tu dibê hê êvar e.

Ne dê û ne bav, di bîra te nayên kes;
Wek jana zirav e, lê mêrkuj e, wek mar e.

Ne xwezî bi wî ko carek lê binêrî bes;
Şadî, dijmin û tim bi qîr û hawar e.

Rêça wergirtina taca Keyan didî ber te, lê
Ew rê bi çiyakî bilind ve diçî berwar e.

Ew agir, agirê dilê Cegerxwîn ê pir geş;
Rojek heye bavêjî riwê dijmin, naçar e.

Institut kurde de Paris

## DEZGIRTIYA XORTAN

Nalînek tê guhê min, lê winda û nihan e,
Agir berda dilê min, tev bû pêt û dixan e.
Barek da ser milê min lê barekî giran e,
Dane ser hev kulên min, hemî derd û bela ne.

Dengê kê ye dinalî, nalenala welat e.
Dikî gazî, dikalî rabin çaxê xebat e.
Kurd û zaz û celalî, tev de çêkin civat e;
Kes xwe medin vî alî; îro roja felat e.

Xortên kurdan şiyar bûn, guh nadin van nemerdan,
Bav û kalê me rabûn hemî mirin ji derdan.
Derdên li wan giran bûn, îro li me çi ser dan.
Ne wek bav û bira bûn, yara xwe j' dest xwe berdan.

Xemlandî me seranser dezgirtiya xorta me;
Gerden sêvek sor û zer, li hêviya merdame.
Qelen xwîn e ne gewher, Kurdistana kurda me.
Bê tang û top û leşker, îro we ez berdame.

Kurdistana delal im; herkes tê min dixwazî;
Ez pir şox û şepal im, min deng daye bi nazî.
Ev bûn bîst û du sal-im, li ser min cengebazî.
Kurdo wer min bixwaze, belê bi serfirazî.

Rabe ser xwe binêre, hawîr me tev neyar in.
Li topan guh bidêre, li ser me ber dibarin.
Dijmin li jor û jêr e, ji cengê re li kar in.
Kundên serê şikêra nêçîr ji ber te xwarin.

Îro roja xebatê; serxwebûn e doza we;
Dema jîn û felatê, li kû maye soza we.
Hon tev şêrên di latê, rovî kete koza we,
Şikestî ne di matê; dijmin biriye boza we.

Şev û rojan bixwînin, bibin serbest û zana,
Tovê jînê biçînin, ji bo dil û nezana.

Institut kurde de Paris

Çarek hon dê bibênin van bexçe û rezana.
Kurdistanê derênin ji destê van dizana.

Çavên di reş me kil dan, li ser bana rawestan,
Tox û ala me hildan, baqê gulan li destan.
Sirme, nîşan li mil dan, pişt û kemer me bestan.
Me sed awir li dil dan, xortino werin Kurdistan.

Dosta we me ta sax im, ji bil we kes min navê;
Ez dilbirîn û dax im, ji her vê şewq û tavê.
Ez rengê şevçirax im, şewqa xwe da giravê.
Dilxurt û pir deyax im, di nav wê bend û davê.

Xorto! eger tu rabî, wek başoke herî çûk;
Ne xurt û şehreza bî, tu nastênî ji min mûk.
Ne wek şêr û gura bî, bûkê djdî bi tûtûk.
Ko bê tac û sera bî, tê çawan min bikî bûk.

Bê padişah û leşker kengê dibî serefraz;
Kî bê xebat û tevger dixî destê xwe daxwaz.
Baba û bextî û ler, beraz û torî û zaz,
Nebin tev yek seranser, tev dê bibin belengaz.

Cegerxwîn xweş dibêjî, lê kurd ne çê gihane;
Tim gewheran dirêjî li cem wan bê buha ne.
Ev pîsî û qerêjî, ne yên kurdên niha ne.
Zingar gihaye mêjî, lew dîn dikin behane.

## Ji bin Destan tu Derkev

Ey sergiranê kurdan, bin dest û dîl e kurd tev;
Giriyê me tê li ser we, xew bo me nîne her şev.

Li nav êl û eşîran heryek ji we wekî şêr;
Lê ko diçin serayê tev bê ziman û bê dev.

Wel-lahî pir ecêb e hon vî malî dikin kom;
Bê tac û bê sera ne, ji bo dijmin didin hev.

Heryek ji we dibêjî ez hevalê filankes;
Guh medin-ê tev neyar in, ji bo me re ew û ev.

Malê xwe tev bela kin, ji bo serbestiya kurd;
Xwîna xwe tev birêje, ji bin-destan tu derkev.

Îro roja welêt e, pêş ve herin wekî şêr,
Jîn bo we pir seza ye, pir şerm e bo me ev rev.

Cegerxwîn tim dibêjî, serbestiyê dixwazî,
Di vê rê kiriye gorî, mal û canê xwe wî tev.

## JI BER DERDÊ EWAN

Kurdmanc hemî axa û beg û mîr û mela ne,
Hikmet ev e her dem ko belengaz û geda ne.

Axa û began destê sitem daniye ser wan;
Talanker û diz û keleş û bê ser û pa ne.

Şêxan û melan xişt û def û xayet û Enwar
Wek gurzê giran dane milan, şêrê Xuda ne.

Dûzex wekî mertal e, bihuşt herwekî şûr e.
Kurdan ji kul û derdê evan qîr û eman e.

Her yek bi hezar rengî dixwin vî miletê dîl,
Lê ew bi xwe der bircên belek, xan û sera ne.

Zana ne li cem her yekî sed xap û du sed fen.
Kurdmancê reben hov û dewar, dîl û bela ne.

Ma ez ne ji ber derdê ewan bûme Cegerxwîn;
Ev derd e li nav kurd e wekî jane di can e.

## Ma yek Ji we nabî Beran

Îro bi cengê dijminan daxin li dil kêşane bes,
Xwîn wek ciwên aş û çeman, pêl dane Kurdistan e bes.

Ev tirk û taçîk pir xezeb girtin ji Elwend ta Heleb.
Em dane ber hev rast û çep, tim kuştin û talan e bes.

Dîsa me dil pola ye tev, carek me lê kolaye ev.
Ey kurd bizane roj û şev, tac û key û îman e bes.

Bê tac û şah û bê ser in, bê top û tang û leşker in.
Bê sik-ke û zêrê zer in, rabin ji xew îca ne bes.

Zanîn û xame û rêberî, yektî û miletperwerî,
Nermî û merdî û serwerî ev rûmeta însan e bes.

Îro ne roja serxweşî, îro ne roja bêhişî;
Roja yekîtî, dilgeşî, ya gotin û xweşxwan e bes.

Axa binêr şêxên bedew, mêrên kurê mêran e ew.
Bê fort û bê pesn û derew îro wekî paşa ne bes.

Heryek meaşek dane wan, lê hon pezê tim bê şivan;
Ma yek ji we nabî beran, hon ên kul û derdan e bes.

Bê padişah û dewlet in, lewra ko hon bê rûmet in.
Îro tenê hon kêm ketin, ev kêmiya kurdan e bes.

Herçî nezan e wek me ye, dîsa ewî piştek heye;
Her dem li pey doza xwe ye, leşker li pişt sîpan e bes.

Em kurd tenê bêmêr û pişt, dijmin li hawîr çartenîşt.
Hawîr dibarin tîr û xişt, tim kuştin û zindan e bes.

Pişta xwe em nadin ecem, da em bijîn tev dem bi dem.
Bê kuştin û derd û elem em, kurd kurê Keyan e bes.

Kesra û Key tev yên me bûn, Eyran û Kurdistan ne bûn;
Firsa kevin tev tê de bûn, Ristem li nêv meydan e bes..

Gazî dikim xortên di nû, winda bikin herçî ko çû,
Ên wek Cegerxwîn ka ji kû, ew rêberê xortan e bes.

Institut kurde de Paris

## XEWA BIRÇIYAN NAYÊ

Birçîbûnê serê xwe hilda ev deh sal in;
Kurdên reben li hawîr birçî û bêmal in.

Hin dewlemend û têrmal û pir zêr û gund in;
Lê pirên wan belengaz û reben û bê şal in.

Kurdên jor bi ser ên jêr de hilweşiyan tên;
Xort û gedek û şîrmij û keç û pîr û kal in.

Dewlemendan kodik xistiye nav lingên xwe,
Guh nadêrin ka belengaz çima nal-nal in.

Li alîkî zarok û şîrmij birçî ne diqîrin;
Xewa birçiya nayê, tev zarok û mendal in.

Xuya ye kurd dijminê felekê ye her dem,
Dijminên felekê di her çax û deman mirdal in.

Kes kesî xwedî nakî lê talanên hev;
Ji çolê dibin hin Ristem û hin Zal in.

Ji dijminan re egîd û comerd û nandar in;
Ji xwe re parsek û bêmirês û pergal in.

Ma ji Xwedê rewa ye herkes nanê wan,
Bixwin û ew parsek û evdal in.

Heçî maldar in, ji xwe bi xaltîk û xal in;
Lê heçî bê-mal in, ji xwe bê xaltîk û xal in.

Herkes bi xwendin bûn xwedanê tang û top;
Lê em derwêş in, bi xişt û xencer û kopal in.

Şal û qumaş ji me standine dijmin tev;
Li cihan desteng in; bê pirtî û pertal in.

Cegerxwîn xemhilgir e, li ser we dinalî tim;
Mal nîne, lê xem di ser dilê wî de qerpal in.



Institut kurde de Paris

## Li Dinyê Bêserî

Miletê kurd her tenê maye li dinyê bê serî,
Bes yekîtî tê de nîne, her eşîrek sed kerî.

Rencber in bê rêber in, dijmin li ser wan tim siwar,
Tev mela û şêx û sofî, tev mirid û serserî.

Begler û axa egît in, dijminên kurd in ji dil,
Rêber in bo kuştin û talan û ceng û berberî.

Ger nexwînin yek ziman û berg û yek armanc nebin;
Her bibazin wer bigazin vî berî nabin serî.

Ew kesê birçî nebî nabêjî ez kurd im ji dil;
Paleya dijmin dikin sed Ismet û sed Eskerî.

Pir ecêb e ko di şerqê mane bê tarîx û deng;
Her ji Ristem ·ta bi Deysem bo me tenha rencberî.

Ey Cegerxwîn bes binale şehr û bazar mane sar,
Polfiroşan pol firotin, te bi dest dur ma mirî.

Institut kurde de Paris

## DESTÊ ŞÊX MAÇÎ MEKIN

Destê şêx maçî mekin ew şêş ne qutbê razî ye;
Tac û şewket tev xebata destê sar û tazî ye.

Ev ne dîn e, dîn mebe, dîn serxwebûna milet e;
Ser mebe ber lingê şêx, kengê Xwedê jê razî ye.

Ma ji bo dîn şer dikin xortê Feranse û ingilîz;
Wa li Misrê xwîn dirêjin.bûn şehîd û gazî ye.

Ger nexwînin dê beg û axa me tim talan bikin;
Ev nezanî cangiranî karekî nasazî ye.

Rencberê şêx û mela yî karkerê axa û beg;
Ê hinan pê karine lê ê hinan canbazî ye.

Ew kesê zana divêt tim wek Cegerxwîn bikine qîr;
Rast e, wî zencîr di mil de tim bi qîr û gazî ye.

## BILBIL DIGOT

Min dî li jor dinalî, bilbil bi deng û hawar;
Min got-ê ey Cegerxwîn, çiman te dil birîndar.

Go ez ji derdê kurdan dikim hewar û gazî;
Wer da ji bo te bêjim ehwalê kurdê xemxwar.

Kurdistan pir xweş û geş, ez jê re tim dinalim;
Ew asitanê kurd e, şêrîn e deşt û zinar.

Zinar û baxê û bostan zeytûn û sêv û hirmê,
Hincas û xox û mişmiş, bihok û gwîz û hinar.

Alûç û tirş û bindeq, behîv û ij û rijik,
Şeng û te'ew, belalûk, dirî û şox û çinar.

Kevot û benk û benav, maz û guhîj û êrvist;
Tirşok û lov û gêzer, gilyaz û xir û qîvar.

Gulnaz û çîçeka zer, rîhan û hem qedîfe,
Beybûn û nêrgiza reş, xweş yasemîn û gulnar.

Tirî çi koxer û reş, dirêj û beng û zeytî,
Mezrûn û gewr û kerkûş, nayin zanîn bê hejmar.

Avîk û werz û şênî, rez û bostan û bexçe;
Şebeş, ecûr û qawin, gundor û qet û xiyar.

Ava şêrîn û paqij, çem û newal û kanî;
Cihok û gol û derya, miskar û ça û robar.

Birinc û nok û şolik, têsk û genim, cehê reş;
Têtin di çol û deştan, Dara ê kurd e, cotar.

Ahû, keroşk û rovî pez û dewar û kovî;
Wawîk û hirç û gurg û şêr û piling û keftar.

Maden çi zîv û zêr e, pêtrol û xwê û polad,
Hem ces û paxir û aş, hasin û komir û dar.

Şahîn û baz hilatin, bûm bûye padişahek;
Bermayê tirk û taçîk, talan kir û hemî xwar.

Institut kurde de Paris

## Cegerxwîn Bes

Eger pîr û eger mîr û eger beg,
Çi eyûbî, çi merwanî, çi bermek.
Hemî çûne, belê em mane nêçîr,
Ji xwe dijmin li pey me herwekî seg.

Dijîn em her li ser şax û zinaran,
Kevir balîf e bo me, qad e doşek.
Bi lêdan geh, bi kuştin geh bi talan;
Li çolan em dibazin hacî legleg.

Serê mîrê mela û şêxên kurdan,
Bi çoganê demê ew dane ber şek.
Cegerxwîn bû bes e rabin bibin yek,
Heger mîr û eger pîr û eger beg.

---

## Divê em Bibin yek

Ji paşa û beg û gerdan di vê rê yek ne bû hişyar;
Ji bo serbestiya kurdan, ji wan qet yek ne bû xemxwar.

Hemî talanker û mêrkuj, li ser wan dijminê xwînrêj;
Melan êriş birin Emro, heta Zeydo kirin serdar.

Dirist bû kuştina kurdan, di şer'a şêx û mamostan;
Beg û axan bi deh gundan, digotin her em in xunkar.

Yekî xwenda li bajaran, meger zana dibû, dîsa;
Di bin destê neyaran da, dima ew bê gem û hevsar.

Bi zazî geh bi tazî geh, bi tirkî geh bi tatîkî;
Mijûl bûn ehlê bajaran; gelo kurdan ne bû yek zar.

Bi çil gundan hebû navek, wekî xweşnav û mirdasan;
Ne yek berg û ziman û dil, bi vî rengî mirin yekcar.

Li hawîr dijminê bedxwaz, ji hev em raqetandin tev;
Heya ko ew ji hevdî re, kirin dijmin kirin xwînxwar.

Edîb û şairên kurdan, bi biskên şê mijûl ma bûn;
Yekî wek min hebûna; lê di nav wan de dima bê çar.

Zeman sed firsetên hêja, belaş dan, kes ne bû bêjê,
Heta hasil giha Musil, Cegerxwîn nû dikê hawar.

Institut kurde de Paris

## Bi Seydayê Xanî re

Ey kurd tu çiman wisan dinalî,
Axîn û keser ji her du alî.

Bextê te reş e ji rengê bilbil,
Her dem digerî li xunceya gul.

Doza te gulek ne wek gula ye,
Lewra te li pêşî bilbila ye.

Bexçê ko li nav e ew gula zer,
Bazên di belek li ser dikin şer.

Tim kuştin û ceng û qîr û lêdan,
Ew bexçe kirin ji bo xwe meydan.

Ew bûne xwedî tu dergevan î;
Ew jê diçinin tu bexçevan î.

Ew jê didizin hero gulên zer,
Ew lê dicivin tejê dikin der.

Bê şûr û kemend û gurz û mertal,
Bê şah û sera û tac û bê mal.

Bê bav û mirov û ap û pismam,
Rokê te ji bexçê xwe ne kir tam.

Nabî demekê bi top û xencer;
Rabî û digel te kom û leşker.

Bistênî tu xan û hundirê xwe,
Tacek tu bidî serê kurê xwe.

Em jî demekê bi serfirazî,
Rengê Ecem' û Mexol û Tazî.

Ala te li ser milê xwe rakin,
Dijmin ji hev û dinê bela kin.

Ew rûnî li nêv serayê Amed,
Dîsa vegerî keyaniya Med.

Ey kurd tu bizane ew cihan e,
Wek bûk e, şepal e pir ciwan e.



Institut kurde de Paris

Ev renge cihan e gerçi kewn e,
Tenha ji me re xiyal û xewn e.

Herkes ji xwe re bi şûr dixwazî,
Ê xurt ew e ko di ber de razî;

Bê leşker û top û ceng û lêdan,
Bê şah û sera û tac û eywan;

Bê zor û dirav û bext û xame,
Ev bûke bi herkesî heram e.

Kengê ji dîbaceya Memozîn,
Xweştir tu dibêjî, bes Cegerxwîn.

## WEZIFEY XOM

— *Bi zarê Soranî* —

Nawî Kurdistan pir şewq û taw e,
Gencîneyî fikrim maneyî em naw e.

Ta êsta digirîm bo deştî Lacan;
Demrim le hesret xakî Şeqlawe.

Tu Xwa ey badî seba begihînî,
Selamî min bo kurdî ew naw e.

Şewqî estêrey kurdî Gelawêj
Le şax û baxî Kurdistan daw e.

Qurbanî destî Elî Kemal im,
Esasî merdî bo kurd danawe.

Mangê sih dînar bo hejaran da,
Bo Gelawêj man hêj bêtir dawe.

Bo dewlemend man em xweş mîsal e,
Xîret bekêşin firset ne mawe.

Wezîfey xom her teblîxî kurd e,
Le mirdû herçî demînî naw e.

Cegerxwîn gerçi seydayê kurd e,
Ta êsta pesnî kesêk ne dawe.



Institut kurde de Paris

## Xwediyê Miriyan kor e

Bextê me reş e, qirdê me kore;
Em tim li jêr in, dijmin li jor e.

Darika jîna me hişk û bê-ber,
Xaniyê dijmin bilind û ê me her gor e.

Em şal û qumaşê xwe didin buha-kêm;
Kiras, çapan û derpê naşor e.

Rast e dibêjin: geyayê hewsê tal e;
Lê nizanin ko şekirê dijmina şor e.

Ji me re divên xwendin û zanîn tev,
Miletperestî û serbilindî û tor e.

Li dinê bê zêr tiştek pêk nayê,
Serê her tiştî zêr, lê jê mezintir zor e.

Yekîtî divê berî her tiştî bo kurd,
Çi zaz û kurmanc, çi kelhur û lor e.

Ta al û welat û serek nebin yek;
Kurd li aşê felekê her tim î bê dor e.

Cegerxwîn! kurd mir hê ji nû ve,
Tu bûye xwedî; lê xwediyê miriya kor e.

—✕—

## ÊL YEMAN BEG YEMAN

Beg bê êl nabê, êl nabê bê beg,
Pezê bê şivan, xwedî dibê seg.

Erê beg bê êl, bin dest dimînî,
Qeraşê bê-av wek hacî legleg.

Lê êl û beg tev, eger bibin yek,
Yek dest û yek dil gogê dibin şeg.

Bes e Cegerxwîn kurdên te yekser,
Çi êl û çi beg wek dara bê reg.

Institut kurde de Paris

## LE XEWI XEFLET HELSE

*— Bi zarê soranî —*

Ta be îmro zor helistan gewrekan û mîrî kurd;
Hîç yekîş azad ne bû zanim le kêm tedbîrî kurd.

Her yekî bo xoy dikola, bo yekîtî hewil ne dan;
Bûn sebeb bo kuştin û cewr û cefa yexsîrê kurd.

Poşiman hêşta ne bûyîn bo çî nabin yek hemî;
Ger bibîn ew dem debînin tûj ebî şemşîrî kurd.

Yektîman îmro dibî heyha be kom û hewledan;
Ew deme alem debî êxsîrî bend û nîrî kurd.

Xom digel yek bê tifaq in lew dibin dîl û sefîl;
Her li meydanê siwar in, têne kurd ser tîrî kurd.

Nisbeta xoyan dedin hindek be ewladê Elî;
Ew bi fen û sehrebazî her dikin nêçîrî kurd.

Ger de îmro em nebin camêr û hem sahib qiran;
Menfeet hîç bo me nadit rêzika bapîrê kurd.

Bo çî îmro em feqîr in, têk belengaz û reben;
Wa li meydanê diyar e, qub-beî keşmîrî kurd.

Bes di xeflet de memînin zû şiyar bin têk li xew;
Dijminî xed-dar û zalim çarkenar hewîrê kurd.

Fikrî min wa ye we lakin hakimî fikrim niye;
Zêr nebî em guftogoyem çon didit te'sîrî kurd,

Ey Çegerxwîn bes binale, em zemane hêj xweş e;
Wa te hildaye milê xo, her tenê zencîrî kurd.

Institut kurde de Paris

## BÊRIYA WELÊT

Ka Ferîdûn, ka direfs, taca keyan li kû ye.
Ka Guhderz û ka Ristem, ka ew meydan li kû ye?

Ka padişahê Elwend, ka siltanê li Deynûr.
Ka eyûbî, ka Dêsem, kanî Merwan li kû ye?

Ka mîrekên di baban ka paşayê Rewandiz;
Ka Cizîr û kanî mîr, ka Bedir-Xan li kû ye?

Kanî mîrê Behdînan, kanî mîrê hekaran.
Ka mîrekên di zazan, mîrê Xerza li kû ye?

Kanî mîrên Hesenkêf, kanî mîrê di Sasûn,
Ka mîrekên Mecenkurd, mîrê Şêrwan li kû ye?

Ka Melatye, ka Xerpût, ka Çermûk û Sîwerek,
Kanî Ûrfe ka Sirûc, mîrê milan li kû ye?

Ka Wêranşeh ka Dêrik, ka Mardîn û Nisêbîn,
Kanî Amed, ka Hezo, mîrê Hîzan li kû ye?

Kanî Stewr û ka Midyat, ka Erzen û Bişêrî?
Ka Aşît û ka Hêtem, ka Gurdilan li kû ye?

Ka Bedlîs û ka Seirt, kanî Mûş û Erzerom;
Kanî Qers û Bayezîd, ka mîrê wan li kû ye?

Kanî Miks û ka Xesxêr, kanî sera Mexînan,
Kanî deşta Colemêrg, kanî westan li kû ye?

Ka Şengal û ka Mûsil, kanî Zaxo ka Dihok;
Kanî Akire, Amedi; kanî Barzan li kû ye?

Ka Ûrmiye û Şîno, ka Sablax û ka Nehrî?
Ka Selmas û kanî Xoy, ka Erdelan li kû ye?

Ka Hevlêr û kanî Koy, ka Herîr û Rewandiz?
Ka Şeqlave ka Derteng, mîrê Soran li kû ye?

Ka Kerkûk û Şehrezor, ka Helwan û ka Deynor?
Ka Kelos û ka Neşkas, ka Mehrewan li kû ye?

Ka Tenûre, ka Zelem, ka Meşîle kanî Loy;
Ka Sirûçik, ka Alan, ka Dumihran li kû ye?

Ka loran û ka goran, ka Hemrîn û ka Sefîn;
Ka ew bajar û ew gund, ka Kurdistan li kû ye?



Institut kurde de Paris

Ka ew deşt û ka çiya, ka ew av û ka giya?
Ka ew kon û ka koçer, ka ew zozan li kû ye?

Ka ew dengê pezê qer, ka ew gulên sor û zer?
Ka benefş û ka rihan, ka gulistan li kû ye?

Ka kovî û ka evor, ka ew deng û qoreqor;
Ka şêrîna kewê nêr, ka nêçîrvan li kû ye?

Ka ew cot û ka cotar, ka ew pez û ka dewar?
Kanî berx û kanî kar, ka bêrîvan li kû ye?

Ka ew mêrg û kanî deşt, ka ew bax û ka bihuşt?
Kanî seyran kanî geşt, ka ew dîlan li kû ye?

Ka ew xort û ka kurik, ka ew şal û ka kerik?
Ka govend û ka keçik, ka zirnevan li kû ye?

Ka Dilşa û Gulîzer, ka Şêrîn û kanî Zîn?
Kanî Eyşê, ka Fatê, ka Perîşan li kû ye?

Ka ew mêr û ka ew jin, ka ew kalê rihmezin?
Ka lêlê û ka lolo, ka ew heyran li kû ye?

Ka ew ken û ka geşî, ka şadî û ka xweşî;
Ka sersal û ka nûroj, ka mihrecan li kû ye?

Ka ew ava sar û xweş, ka gundor û ka zebeş?
Ka birinc û ka genim, ka ew bistan li kû ye?

Ka hirmê û ka incas, ka bihok û ka tirî,
Ka ew xox û ka hinar, ka dobelan li kû ye?

Ka ew zîv û ka ew zêr, ka kaniyên gaz û qîr,
Ka ew terş û ka talan, ka ew dewran li kû ye?

Ka welatê me rengîn, îro jar û birîndar,
Çegerxwîno de bigrî, kanî derman li kû ye?

Institut kurde de Paris

## PENDNAME

Ezê bêjim lê hun dilê xwe megirin,
Dinya ne hêja ye emê tev bimirin.

Mala me gelekî kûr e, yek maẍ e,
Ew jî li bin şeş heft tebeqên ax e.

Em tev bira ne, ji yek dê û yek bav,
Ji miriyan re çi maye, ji bil nav.

Qet şiyar nabin, ta kengê razin,
Hon mezin in, em ji we dikin gazin.

Xelk dibêjine me, şêx û hem mela,
Wextê zekata xwe, dibêjin bela.

Çiman hezretê peyẍember gotiye,
Zekatê mexwe, ger tu haşimî ye.

Malûmê we ye, ev qerêja mal e,
Lewra ji şerîfan re ne helal e.

Em bi dilê xwe tev hakim û mîr in,
Di zekatê de, ji qis'mê feqîr in.

Madam ko em warisê enbiyan e,
Çima em xerîkê karê dinya ne.

Bes e, hon ji xew rabin, ez gorî zû,
Ji zarokên xwe re bêjin ilmên nû.

Çiman hezretê fexril-alemîn,
Gotiye; « itlibul ilme welew fis-sîn ».

Misilman kengî li Sîn, hebûn ew çax,
Ax ji derdê we şêx û mela ax! ax!

Hon dibêjin em bûne qutbê razî,
Qet yek ji we nabe miftî û qazî.

Hon bi van her du ritban ne razî ne,
Lewra hon belengaz û pêtazî ne.

Hon tev mêr û çeleng û xort û ciwan,
Hon ji pîsa parsê dikin ji bo nan.

Ez mela me lewra dilê min dêşî,
Xwedê rehma xwe bikî li ên pêşî.



Institut kurde de Paris

Em hînî tu karî ne kirin yekcar,
Lewra em hêj mane tiral û bêkar.

Axa, ez ketme bextê te û Xwedê,
Ezê çend pirsan bêjim tu guh bid-ê.

Di bin destê te de hebûn pê sed xan,
Hemî belengaz û reben û gavan.

Tu malê wan distinî her bi dilêş,
Tevî dixî devê mamûr û derwêş.

Ger we tev bidana bi top û tiving,
Dê hon ji bibûna hemberê firing.

Lakin çi bikim we tev da bi şabaşa;
Qet kes ji we ne bû wezîr û paşa.

Li ser bextê min bî hon mêrê çê ne,
Ax, ax hun êsîrê destê xelkê ne.

Bes e, hon eqlê xwe bidin serê xwe,
Destê xwe bigirin vêcar li perê xwe.

Çiman ji bona ax û mal û xwelî,
Perê xwe didin li hev dikin gilî.

Hon malê xwe bixun her yek bi serbest,
Di hemberê neyaran de bibin yekdest.

Ji hev re pir qenc bin û guh bidêrin,
Li çerxa felekê hon pir binêrin.

Ger-rek ji bo neyar e, yek ji bo me,
A neyar jê re hat, a me bidom e.

Em jî şûva xwe bajon û tov biçînin,
Dê zû şîn bê, emê wî zû bibînin.

Carinan em rezekî datênin deh sal,
Em naxun ji kurê me re dibî mal.

Ewê ko çêkir vapor û balafir,
Deh sal bi şûn ve ne ma û çû mir.

Ew kesê bê xwendin û eql û zanîn,
Li rêza kera ye çi bi dîn û çi bê dîn.

Institut kurde de Paris

Ev tev ji me re, riya dîn û îman,
Hub-bil-wetenî delîl û birhan.

Ez bi xwe bê êl û eşîr û ebr im,
Pêlek maye emrê min ezê bimirim.

Bes ji bona we ye, ev qîrqîra min,
Lê ez çi bikim, hon guh nadin şi'ra min.

Hon dizanin lê hon li xwe nakin bar,
Em jî, ji ber dilêşî dikin hawar.

Fikra min maye min ev tenê ne dixwest,
Lê ez çi bikim li vir qelema min şikest.

Bi kêrê min tûj kir serê qelema zil,
Vê digel a tê, binvîsim, dibin çil.

Eger hon ji gotinên min aciz bûn,
Hêvî dikim efû bikin Cegerxûn.

—o—

## Dilê Cegerxwîn

Agir bi Kurdistanê ket lewra dikit hawar e dil;
Sed bax û sed bistanî ket manendî bilbil jar e dil.

Pêtek ji Kurdistanê hat, mêlak û cergê min dipat;
Aman welat, aman welat, bawer bikin xwînxwar e dil.

Bawer bikin ey yarê min, haval û hem guhdarê min;
Hergav û her êvarê min, naxoş û hem bêzar e dil.

Bêzar û pir naxoş e, ew kincên siyeh-gûn-poş e ew,
Geh Sîn e geh Seydoş e ew, geh Heyderê ker-rar e dil.

Geh Ristem e, geh Hatem e, geh padişahê Deylem e;
Bê yar û dost û hemdem e, lew mest û gerdenxwar e dil.

Geh şah e ew, geh bêkes e, geh kurd e ew, geh faris e,
Geh berber e, geh çerkes e, geh tirk e geh tatar e dil.

Geh çol e geh zozan e ew, geh Dêrik e Geh Wan e ew,
Geh Şax e geh Westan e ew, geh Mûş e geh Zinar e dil.

Geh ar e dil, geh av e dil, geh tar e dil geh tav e dil,
Murxê seher der dave dil, lewra Çegerxwîn par e dil.



Institut kurde de Paris

## Riya Rast û Dirist

Ser ji xew rake binêre ro ji bercê dar der e,
Guh bidêre çarkenarê te bi halan û şer e.

Zani be, ey milet-im ev dem ne ya razan û xew;
Ev dema gurmîn û ceng û tîp û top û leşker e.

Sed wekî Guhderz û Ristem wan bi te deng dan cihan,
Ma ne şerm e, ko tu îro maye bê mîr û ser e.

Pir nexoş î, ev du sad sal bû li te jana zirav,
Şêx û axa bûne mîqrob ketne laşê te î zer e.

Dijminê meztir ji van bê xwendin û nazanî ye,
Korî û nayektî û bêbextî zanim sêser e.

Ev welatê wek bihuşt bû, bûye zindan kur û teng,
Dîl û gerdenxwarî tê de bê şibak û pencere.

Ev çi ye ey milet-im, bê dost û dijmin bê jimar,
Rêçika ko şêx û axa dane ber te, tê mere.

Şêx ne dilxwazê te ye, lê rêncberê navê xwe ye,
Tekyexana wî divê ko tê hebin çend kerkere.

Ew bi xwe parsê dikê, kengê Xwedê wer gotiye,
Ma keramet tizbî ye, yan tang û top qunbere.

Xaniyê axê mezin herdem di ser gund re bilind;
Lîs û hêlîna diza ye, wek şikefta sêder e.

Ma ne bes ey milet-im, van rîp û xapan berde zû;
Ev riya rast û dirist e, bes Cegerxwîn rêber e.

Institut kurde de Paris

## Hêj Dey Nakin

Gelî kurdan ji xew rabin werin carek temaşa kin;
Yekîtî qenc e, pir baş e, di Kurdistanê peyda kin.

Ji xew rabin gelî yaran, werin, bigirîn wekî baran.
Temaşa kin li nayaran, li Kurdistanê meyza kin.

Birayên me divê dewrê gelo çawan dikin sebrê.
Li ber vê zilm û vê cewrê, hemî bin destê etrak in.

Gelek mêrên wekî Ristem, gelek mîrên bi rengê Cem,
Gelek dot û gul û cewcem, dikuştin hêj qe dey nakin.

Bi rengê dêwê guhderzî bikin dinya bibî lerzî,
Hezar rengê Kemal Fewzî şehîd in, wan ji nû rakin.

Bi rengê sirb û bilxarî ji vê rê xwe medin alî.
Du sed wek Xanî û Nalî, Cegerxwîn dilbirîn şa kin.

## JI YEWNANA BIPIRSIN

Werin dîsa ji xew zû hon şiyar bin;
Digel rext û tifingên xwe li kar bin.

Bikin cengê digel dijmin hero zû,
Heta ko em bibênin ew verabû.

Bibin em serbilind û hem cihangîr;
Xwedan text û şehinşah û beg û mîr.

Berê em bûn xwedanê tac serdest,
Di nav xakê cihan de xurt û serbestî.

Eger bawer ji min nakin bipirsin;
Ji ehlê ilm û tarîxan metirsin.

Bipirsin hon ji yewnan û firengî,
Ji derbên kurd û qîl û qal û cengê.

Ji bo we dê bibêjin gotin û raz;
Ko kurd û qurd û xurd in pir serfraz.

Hezar rengên Selahedînê kurdî,
Cegerxwîn karî carek jê xeber dî.



Institut kurde de Paris

## SILAV LI SIFRA HAZIR E

Ey sûxteyê bê nav û deng,
Dijmin li ser balafir e.
Pir leşker û top û tifeng;
Seyda ew e, ew mahir e.

Sed sal in ev Zeyd û Emir,
Ceng e digel rîşa melê.
Mertal di dest wan de bihuşt,
Gurzê di dest wan agir e.

Şêxê ko tac û teylesan;
Wergirtiye rengê Xidir.
Rûniştiye l'Birca Belek,
Şahê ecem şeh Nadir e.

Ew sofiyê dîl û reben,
Serqot û xwas û tazî ye.
Digrî bi hawar û fixan,
Şêxê me Evdilqadir e.

Carek li şêx ew nanerî,
Da zani bî rast û derew.
Kincê li şêx şal û qumaş,
Kincê li sofî çadir e.

Axa bi deh gundên xwe ve,
Bawer dike Keyxusrew e.
Talanker û diz û keleş,
Wî daye ser rêça gur e.

Halê me kurmanca ev e,
Em dê çilo serbest bijîn.
Herçî ko çûye guh medê,
Silav li sifra hazir e.

Seydayê rast û ronî ye,
Lewra Cegerxwîn namidar.
Zana dizanin ew kî ye,
Ên ker dibêjin kafir e.

Institut kurde de Paris

## Em Cegerxwînên her Çaxê ne

Kurdistan tev kûp û bel û deşt û kel û şax in,
Dexl û av û dar û ber û gund û rez û baẍ in.

Bi çavekî dùrbîn lê dinêrin û dilên sozdar,
Sond xwarine ew ji bîr nakin her û her ta sax in.

Li ser lingê dijmin û li bin canê paqij ê kurd,
Di xanikî kûr û teng û yek-maẍ in.

Ciwananê kurd û miletperweranê kurd tev,
Li hawîr dinalin dilbirîn û dildaẍ in,

Wek bilbil dinalin û wek baz nêçîrvan in tev,
Lê çi bikin bindest û bextreş in wek zaẍ in.

Milet bi xwe maye bê xwendin û zanîn bes,
Her êlekê sed bend û her gundekî deh taẍ in.

Bê mîrek û Kesra û bê wezîr û paşa tev,
Şêx û mela û beg û marmij û aẍ in.

Mêrkuj û xwînxwar û hov û bêmirês in bes;
Milet nezan e, hêj dibêjî ew ocaẍ in.

Ji berê de kurd û Kurdistan dîl in ax,
Bawer bike ey kurd em Cegerxwînê her çax in.

## Ev Awa Dom Nakê

Ey dewlemendê serbilind, ma te çima ser daye xew,
Pir zêr û mal û milk û gund, bo çi dixwî tim nan û dew.

Carek li Ewropa binêr, herçî xudan milyonê zêr,
Çaxa ko tê roja welat, zêra didin merdane, ew.

Rabin li we îro xebat, çêkin dibistan, û civat,
Em jî digel we bo welat, zarok bixwînin roj û şew.

Îro xebat karê we ye, lewra ko şans yarê we ye;
Herkes di bin barê we ye, peyvên we rast, yê min derew.

Dîsa ceger min bûye xwîn, dîn çû ji dest min mame dîn,
Bo min welat şêrîn û zîn, her şev li ser nalîn û tew.

Institut kurde de Paris

## Ji kulan bûme Cegerxwîn

Meyger tu were em qedehek mey bifirênin;
Serxoşî bibin em kul û derdan birevênin.

Gazî ke keçê, lê bi xwe re sazê werînin;
Da em li serayê bicivin, ser bihejênin.

Awaz û newaz xweş biçitin çerx û felek tev;
Da xob û perizade ji perda xwe derênin.

Mestane bibin em ji xiyalên xwe xeber din;
Da kul di dilê kuştiyê goran de nemînin.

Zendî ji me lewma ko nekin piştî me re ew;
Kêmasiyê xêzên me nivîsîne nebênin.

Xêzên me nivîsîne bi xwe ayetê kurd in;
Dê piştî me re ew di civatan de bixwînin.

Doza ko me kir ew bi xwe Mûsa ne gehiştî;
Kurdên me dizanin bi xwe rêça me bibênin.

Meyger tu binê ez li dinê herwekî fîl im;
Şûva ko me ajotiye; tovê xwe biçênin.

Ger ez bimirim, axa cebana me bixwî tev;
Mizgîn ji welat bo me di gorê de bişênin.

Pir tîr û xedeng in, ji neyara me dil de;
Xortên bi hiner dê bi xwe heyfa me hilînin.

Ma qey tu nizanî, ji kulan bûme Cegerxwîn;
Dermanê me ye serxwebiwîn, bo me werênin.

Institut kurde de Paris

Sala hezar û sê sed, hem çil û çarê hicrî,
Rabû ji nav me kurda paşayê textê Xusro.

Ew Ristemê zeman e, Behramê milk û dewlet,
Sê çar mehên Biharê tirkan digel wî şer bû.

Çend Qeymeqam û walî girtin di wê Biharê;
Tirka dikirine gazî, aman ji destê kurdo.

Zaza wekî pilingan bi dar û şûr û kopal;
Berê xwe dane tirkan, gazî kirin ero-ro.

Bi sûnd û soz û peyman, rabûn digel vî şahî;
Bi deng û qîr û halan, êrîş dibine tirko.

Dengê tifing û topan giha semayê banî;
Xwîn bû rewan ji xortan Zab û Ferat û co co.

Hindek ji kurdê nazan xaîn dibûn di dil de;
Bergîl û bed û sersem, meşhûr e navê Qaso,

Rabûn li ber vî şahî wek pilingan diçûn hev,
Tirkê me bûye dewlet, wek dewleta Helako.

Wan şêx Seîd efendî girtin di cejne-rojî;
Gelek mezin digel wî xistin şerîtê, yaro.

Mela û şêx û begler, kuştin, serê di wana,
Li ber tifing û topan manendî gog û kaşo.

Pîr û ciwan û bûkan biskên di reş qusandin;
Wan şeng û şoxeqamet, ebrû hilal û rûro.

Gazî dikirne Yezdan, yareb Xwedo tu zanî,
Em mane jar û mehrûm, bê mal û mêr û zaro.

Sed şah û begler û mîr, kuştin ji me neyara,
Namûs ne ma bi carek, bo şêxekanê bedgo.

Pîvaz çi sor û gewr e, tev tûj û no ye her dem;
Tirko çi dost û dijmin, dijwar û tal û her no.

Min dî yekî ciwanmêr, ko ev xeber me guh kir;
Yanî Seîdê kurdî ev gotina ko tê go.

Go em heçî we kuştin tev bûn şehîd û gazî;
Her dem ji bonî kurdan ta heşrê em diago.

Institut kurde de Paris

Saxê me dê li şer bin, her dem digel we tirkan;
Het-ta ko bêne ser min, bê rabe, tirko rabû.

Wel-lahî bûm Cegerxwîn, derdê min pir giran e,
Ji her du çavê min xwîn, wek Zab û Dicle der bû.

## QELSEMÊR TIM DIBÊN AX

Em ax in ji lewra em, tim tim dibêjin ax.. ax..
Ax.. ax.. ji destê axînê sed carî ax, ax..

Axînên min kûr in, hey tên ji dilê kul,
Ji hundirê min ava, ne hiştin yek max,

Axîn deng e, ji bo daxwazek giran tê,
Ji axînên min şiyar bûne ta Dutax.

Ew daxwaza ko li ser dibêm ax, ax...
Keç e, çavreş e, wek şox û şenge kemax.

Ne bes li ser dinalim, lê gelek wek min,
Li ser ceng û talan û kuştin û menax.

Li hawîr tazî û ecem û tirk û rom,
Wê bi şûr dixwazin û em dibin kelax.

Me di riya wê de laşê xwe daniye ber şûr;
Ji xwîna me sor bûne pir çiya û pir şax.

Zendên me tim rapêçayî ne ji bo şer;
Hasinker û agir hene lê nîne nepax.

Naçare em dikin axîn ey Cegerxwîn,
Qelsemêr û dilkul tim dibên ax . . ax.

Institut kurde de Paris

## Xêza Qelema Cegerxwîn

Şabaş û sipas ji bonî Yezdan,
Bo yektî û xoş tifaqî kurdan.

Ger çendî ne dî me ew tifaq e,
Lakin me heye digel elaqe.

Behmen ko li min dikî hewar e,
Rabû me bi lez ji nêv mezar e.

Dengê wî li min qewî çi xoş hat,
Şewq û tereba dilê me coş hat.

Em pêk ve mirî li hev civa bûn;
Têk de bi civanê kurdî şa bûn.

Em tev de diçûn sera li banî,
Min gazî dikir Xwedo, tu kanî.

Ev rast e dibên ko kurdê xemxwar;
Tev bûne bira, heval û nayar.

Hatî ji hewa bi navê mizgîn,
Dengek bi hewes newayê şêrîn.

Go rast e, we ye, bes e tu Xanî,
Rabe tu bijî di vî zemanî.

Rêber tu yî, warisê te Zerdeşt,
Gazî dike ser çiya û ser deşt.

Ew pir hiner û xwedan wefa ye,
Herçî ko dibêjî ew rewa ye.

Ev Xanî ji min re kirye telqîn,
Xêza qelema min ê Çegerxwîn.

Institut kurde de Paris

## KA WELAT Û AL Û OL

Ey felek kanî li kû man ew welat û al û ol;
Çavbelek kanî li kû man bûne xanim tog û tol.

Kanî ew xortên dilbengî kanî ew kalên bideng;
Ketine bin xeşma firengî pir dinalin polepol.

Kanî sorgul, kanî bilbil tev de mane mest û dil,
Deşt û zozan mane bê av tev çiya û ça û çol.

Kanî bax û kanî bîstan, kanî dar û kanî ber;
Kanî ew rez, kanî ew pez ka dewar û cot û col.

Kanî şêr û kanî ejder, ka piling û ka egîd;
Kanî roja cejn û şadî, ka li kû ne hêl û hol,

Koç û koçer tev ne mane, birc û heywan hilweşîn;
Ax li zozanê me rengîn, ka li kû ne kon û kol.

Ka Ferat û kanî Xabûr kanî Dicle kanî Zab;
Kanî gola Wan û Nazûk, kanî ewqas gêr û gol.

Kanî Gor û kanî Lor û kanî Bext û kanî Zaz.
Ka Şikak û kanî Aşît, kanî Mil û Zil û Zol.

Kanî Kerman, kanî Kerkûk, kanî Wan û Erzerom.
Ka Kelîs û ka Melatya, tev de bûne xak û xol.

Wan neyaran kirne wêran tev de kuştin xan û beg.
Dê ji wan bigrim bi destê xwe ko nemrim doz û tol.

Ey Cegerxwîn bes bibêje fort û pesnan hilde xwe,
Pir di vê rê de çirandin van egîdan sal û sol.

Institut kurde de Paris

## RÊBERÊ ME

SEYDAYÊ XANÎ

Di navbera çemê Ferat û çemê Şet;
Cizîrek e zirav û dirêj e, yek xet.

Tev çiya û deşt û dar û kanî,
Kelat û sera û gund û birc û xanî.

Kaniya ereban Tilebyed û Ras-el-eyn,
Derbasî û Amûd û Qamişlo, Nesîbeyn.

Tirbe-sipî Dêrûn û Dêrik û Eyndîwer,
Digel Hesîçe bajarên kurd in yekser.

Beraz û mil û kîk û taqor û pînaralî,
Sinceqa aşît û deşta hesinan û Alî.

Ev tev kurd in û Kurdistan welatê wan;
Lê bê xîret û bindest in tev mane wek bêgan,

Bêzar û xwendin û tarîx tev bêkes,
Bê ser û ber in, ne wek çeçan û çerkes.

Berg û zar û nav û gonê wan sed reng in,
Li nav xelkê bê nav û nîşan û deng in.

Her êlekê çar hezar mêr in bê goman;
Hemî rêncber û cotar û şivan û gavan.

Di nav her êlekê yek axa ye xwînxwar,
Nebîrbir û bêhiş û xwendin û bêkar.

Gerçî wek Ristim û Guhderz û Êzdînşêr in,
Lê çi bikim ji hev re tev egîd û mêr in.

Rojekê bîr nabin ko destên hev bigirin,
Ji bona welatê xwe serbilind bimirin.

Çiqasî ew mêr in, hewqasî ew merd in;
Tev nandar û navdarên nejadê kurd in.

Ji wan re divê yek hozan û yek pispor,
Wan bigihînî hev geh bi xwendin û geh zor.

Xuya ye ko kurd bi çend sal berî Aşûr,
Li ser Zab û Dicle, Ferat û Xabûr.



Institut kurde de Paris

Her bi vî awayî tev mane bê rûmet,
Bi zarê kurmancî ne kolane yek xet.

Tarîxên Aşûr û Kildan û hem Ermen,
Firs û Ereb û Fireng û Rom û Germen.

Ji we mijûl in, her bi kuştin û talan;
Guhderz û Ristemê kurd bin destê Eyran.

Kurdistan ne pîvaye, seydayê Meltebrûn,
Paşayên me najmêrî yewnaniyê Ksênêfon.

Ne pêxemberên me ne Zerdeşt û Mezdik û Manî,
Yek rehberê me heye seydayê Xanî.

Seyda ye, suxteyê wî her Cegerxwîn,
Li nav kurda ye, lê wek cihayê bê dîn.

Institut kurde de Paris

**Ehmedê Xanî**

KURD NE KIR HIŞYAR

Miletê kurd tu.şiyar nabî, heta kengê ne bes;
Ê nexweş wa li dinê, her tu tenê maye ne kes.

Em li ser te reuhê goyîn tim bi nalîn û girî;
Lê bi vê nal û girînê te ne dî yek du nefes.

Bend û zencîr tim li gerdan rast û çep tên û diçin,
Dîl û gerdenxwar î ey kurd murxê baz î der qefes.

Çarkenarên te bi carek hev divên û xweş divên;
Lê bi tenha kurd li ber çavên neyaran xar û xes.

Şûrê Şêrgoh, gurzê Ristem ger li meydan bêne der,
Dê di bin lingên te dijmin, wer bimînî wek teres.

Ey Cegerxwîn Ehmedê Xanî bi naqosa mezin,
Kurd ne kir hişyar, ji bo çi wer dinalî wek ceres.

Xameya çalak tu binivîse bi lez,
Wa li gerdûşê dinê bû gurg û pez.

Bes tu ax û zar û feryadî bike,
Pesnê kurdan zû bi dilşadî bike.

Şûr bi dest in, tev neyar û destê me,
Bê biha ye wa li sukê postê me.

Ê neyar in, pir bi jehr in rengê mar,
Ê ko dost in, hîlekar in, sehredar.

Ferqê lor û zaz û gor û bext çi ye,
Em hemî kurd û ziman kurdmancî ye.

Kê diye ko mil-letek çend perçe bî,
Her yekî bêtir ji milyonek hebî.

Ka hûriy-yet, ka edalet Ewrupa,
Dewleta madî li kû ye text û pa.

Ey civata mil-letan ey şah û key,
Carekê pirsê ji min nakî tu qey.

Ev çi Dara ye di nav xakê me de,
Ev çi eywan e gelo qey serhed e.

Kanî Dara, kanî Kesra ka Kubad,
Kanî Ezd û Erdeşêr û Tîredad.

Kî dibêjî têk ecem bûn ew milûk;
Ferqê naxî nêv qumaş û germesûk.

Ker dizanê ko ji Ûrfa bê nîşan,
Tev de kurd in ta biçîte Kermanşa.

Vê bizane tu jî Cegerxwîn ey bira;
Lê bizane doz li nik şûr û pera.

Institut kurde de Paris

## De bigirî li ser Tac û Sera

Ey dil li qiraxê çemê Amed rûne sergerdan;
Rind çavên xwe veke, temaşa ke welatê kurdan.

Li bajarê Amed çikandine çend sêpî,
Bi wan ve daleqandî ne cindiyê zazan.

Li alîkî tac û teylesan bê xwedî ne;
Li alîkî kolosên kevej ketine bin lingan.

Ji bêrika xwe destmalekê derxe û çavên xwe,
Paqij ke, ji wan hêstirên xwe wek tav û baran.

Destên xwe li ber guhê xwe deyne û guh bidêre,
Li dengê Axtî ko dibêjî her bijî Kurdistan.

De bigirî bi dengê xwe ê zîz tim bike gazî,
Ey Amed, ta kengê bijî tu bi van kul û derdan.

Wek te xwînxwar in, Agirî û Dêrsim û Sasûn tev,
Wek te diljar in, Tor û Bext û Berzan.

Wek te bindest in çiyayên Singal û Hemrîn,
Wek te reş girêdaye Sefîn û Girdê Seywan.

De bigirî û binale ey şarê Amed ey xwînxwar,
De bigirî li ser tac û sera û textê Merwan.

Ax birano, ez nexweş im, nexweşê welatê xwe,
Derdê min jana ziravê, serxwebûn derman.

Ezê bimrim bi vê êşê her ev e daxwaza min;
Teneşoyê min çêkin ji textê ber derê zindan.

Darbesta min çêkin ji darên sêpiyên Amed, hem,
Qerqerê min çêkin ji teylesan û şal û şedan.

Dixwazim min bişon bi ava Dicleyê Amed, hem,
Ji ber gulavê li min bireşînin hêstirên keç û bûkan.

Eger li min negirîn kovar û rojname û tarîx,
Bila li ser min bigirîn çend Dilşah û Perîşan.

Ma kî wê nebêjî sed xwezî me bi dilê Cegerxwîn,
Ko ez li gornistana Amedê carek bibim mêvan.



Institut kurde de Paris

## VA YE RÊ

Bes e, ey korê derewker, va ye rê wer bide ser,
Destegîrê te me îro, te ji rê naxime der.

Tu çilo karî herî, tim te li pêş av û çirav,
Şev û şûv tev de reş in, hem te ne dar û ne rêber.

Dest bi destê yekî kor e, ew nezan û tu nezan,
Dane ser yek xaçerêkê, me li pey hev ker û ker.

Ez ji korê xwe re bêjim çi rewaye tu diçî,
Wê li pêş te yekî kortir, ji te hem bê ser û ber.

Ji te re eşkere nakî doz û daxwaz ji binî,
Were nik min, ji te re da ko bikim zêr û zeber.

Dev ji gor û kodikê berde bigir şûr û kevan;
Tac û gewher tu li ser deyne, bigir gurz û kemer.

Navê Keyo tu vejîne weke Ristem bide deng;
Pesnê Şêrgo tu bixwîne, çi dixwazî ji Emer.

Ev çi şêx û çi mela ne, çi keşîş û çi feqîr;
Ev çi mizgeft û çi dêr in, bes e Laleş me di her.

Bes e koro, tu ne kor î, lê li pey kora diçî.
Tim dikêşî tu ji dil axîn û sed ax û keser.

Tu welatê xwe dixwazî, ji me çêtir wekî xwe.
Te girêdane li dorê du hezar sênc û çeper.

Ey Cegerxwîn bes bibêje, kî heye guh bidî te;
Ji hewar û keser û dengê te dil tev bû keder.

Institut kurde de Paris

## Heke Mezin Ranabin

EM Ê HÛR RABIN

Begler û paşa û axa, rîsipî û muxtar;
Xudanê bircên belek, bax û rez û cot û cobar.

Heryek bi dilxoşî û serfirazî û bê hoşî,
Li cihan dijîn bi vî terz û awayî bê zar.

Qet kes li me zarokan pirsê nakê carek îro,
Herçendî em ji naçarî dikin qîrîn û hawar.

Em kurd îro belengaz û jar û bê xwedî ne;
Kurdistan qimaş e, welê jê re nîne xerîdar.

Di destê me de heye pirtalekî taze û pir çak;
Lê herwekî Xanî gotiye pir kesad e bazar.

Ger hev negrin kurmanc bi tevayî û yek dil;
Bê fêde ne îro ev gotin û çîrok û eş'ar.

Ko heryek ji cihê xwe hûşyar bibin bigrin şûr;
Karin û ji wan tê, lê we-lîkîn bûne sersar.

Em kêm xistin şêx û mela, û began tev;
Lew em ji hikûmetan îro nayêne hejmar.

Berê em hikûmetke cihangîr bûn li dinya;
Wer temaşa bike eywana Kesra, neqş û nigar.

Bi vî awayî şêx û mela û axa û begler tev;
Nema me bixapînin, em tev ji xew bûne hişyar.

Em miletê kurd tucarî minetê hilnagirin;
Em belengaz bûne serefraz û ji hev re xemxwar.

Lê hikûmetên Ewropa ji me re destûr nadin;
Da em bigerîn li Kurdistan, wek feleka dew-war.

Em canê xwe didin, qet terka Kurdistanê nadin;
Lewra pir xweş e deşt û newal û çiya û zinar.

Hemî gul û yasemîn û benefş û rîhan,
Hîncas û tirî û mişmiş û hem hinar.

Derya û gewher û kîmiya, û gaz û kaniyên neft;
Aş û avî û bistan û zevî û mêrg û robar.

Institut kurde de Paris

Îro şêx û begler û paşa dixwin lew xem naxwin;
Xwarina wan birinc e, xwarina me çi ye, savar.

Ew radizin di bircan de, li cem zerî û gewran;
Em radizin li cem pêxwasan, di kuncikên tar.

Xanîkî min heye pir kure wekî çala bêjen;
Dirêjî û panî çar gaz heye bi gazê necar.

Li alîkî kûz û mirîşk û nivîn û firax in;
Li aliyê dinê agir û serşok û zarok û çend dar.

Ez nadim bi avaniyên Selahedînê kurdî;
Ko li Şamê ji me re bûne fexregah û asar.

Li nav kurda me, ne weke hacî Qadirê Koy;
Li welatê roman di binê zindanê de pir jar.

Kurdistan pir xweş e, çawa em dibêjin hergav,
Eynik û eyndar, pêkend û minar wek textê xunkar.

Binêrin li Ewropa û Emêrîka û Asya tev;
Hon nabênin ji bil me kurdan belengaz û rûsar.

Em ne ê vî qasî ne, welê em bê xudan in ey;
Birano, roj di cîkî teng de li me çûye êvar.

Em bi hev re bê tifaq in, lewra em kêm in îro,
Ji her çar terefan dest xistiye nav me nayar.

Êzidî çi ye mesihî çi ye wiha reng e misilman,
Qey tev ne kurd in; yaxûd ne bavik in her sê par.

Alem tev bûn xudanê sinhet û dewlet û hikmet tev;
Em kurd tenê mane belengaz û pir jar û bê kar.

Bes e, eger hon mezin ranabin em ê hûr rabin,
Ji berê de mezinan şûr avêt biçûkan, da dar.

Cegerxwînê jar ta sed salî bêjî û binvîsî;
Xelas nabin gotin û şîret, lê aciz dibin guhdar.

Institut kurde de Paris

## EM Û GUR

Ey destbirakê gur, hûn jî weke me mêr in,
Lê hûn gamboxe ne, hevalê piling û şêr in.

Em û we hevalê hev in, bi belengazî,
Em bi roj dikin qêrîn, hûn bi şev dikin gazî.

Em kurd û gur yek in, ya desbirakê hev in,
Em jî weke we, tim li ser çiya direvin.

Me jî weke we dî germ û serm û dûman û toz;
Kî ji me hate kuştin weke we ma bê doz.

Şênahî ji xelkê re, ji me zinar û çol,
Dijminê we lawê Fendo, dijminê me lawê mexol.

Daxwaza me Kurdistan e, daxwaza we tim pez,
Hûn jî weke me, heryek dibêjî ne tukes ez.

Em destê xwe bidin hev, li ber dijmin bibin yek,
Qet zora me nabin ev dijmin û ev seg.

Hov û mirov ji xwe re destbirak û heval,
Em û hûn bê mal mane, lewre bê xwaltik û xwal.

Kurd û gur herdem digerin bûne keleş û diz.
Belengaz in, pir şerm e bo Ehreman û Hirmiz.

Gur belengaz, gerdenxwar, dilbirîn,
Kurd bêçare, giş bîmênin Cegerxwîn.

Institut kurde de Paris

## JI XAMEYA MIN RE

Ji xamê re min gotî ey xame-tîj;
Li ser rûyê kaxez bi qêrên û qîj.

Di fermanê rabe, tu çak û çeleng,
Li kurdan biqore bi hawar û deng.

Divê ko tu kurdan ji xew rakî zû;
Ji ba min, ji wan tu bikî arezû.

Bibêje ko herkes bi min bûn mirov;
Di qada xwe de hon tenê mane hov.

Erê xameya nav-şirîn û şirîn,
Ji ezman te girt ta gihiştî zemîn.

Buhayê te arzan e, sê çar firing,
Tu çêtir ji top û ji tang û tifing.

Çi dermanê top û tifinga ye, rev,
Bi derman birînên te nayêne hev.

Bi te ez nijadê xwe hişyar bikim,
Bi carek li cenga neyar kar bikim.

Bi top û tifing û bi tang û şinar;
Ji hawîr bi hev re herin ser neyar.

Li pê wan biqorin bi halan û hay;
Ji ber me ko bişkên bi ay û bi way.

Ji sînor û qada xwe derbas bikin;
Ji nû ve hemî kes me xweş nas bikin.

Bibî yek dilovan ji kurdan serek,
Li wî tim bibin kom, sed û neh gerek.

Ji wan çend mirovên ko zana û jîr,
Vejêrin, ji bo me, bibin xweş wezîr.

Li her gundekî çêbikin xwendegah,
Ji wan derkevî leşkerê xweşpenah.

Bi xweşxwan biqîrin, dilê ateşîn,
Li ser her derê al bikin baweşîn.

Li min xort bibin kom bi dilpaqijî,
Serê wan ji gewher bihîlim tijî.

Institut kurde de Paris

Ezê oleke pir ciwan çêbikim,
Ji bo ez di wê de ewan rê bikim;

Bi rastî bi hev re herin wek bira,
Menêrin li nav û li gund û pera.

Heçî ko di roja welêt rakevî,
Ji ser text divê ew bi xwe dakevî.

Bizan xameya nav ciwan û ciwan;
Ko îro me nîne tu nav û nîşan.

Eger kurd nebî serbilind û firaz;
Ji bo me çi hêja ne şadî û naz.

Wekî ko me gotî eger wa bibî;
Jin û mêr hemî kurd bi te şa dibî.

Di xan û sera de tu şêrîn dibî;
Li sînga ciwanan tu şêrîn dibî.

Bes e, xameya nav-şirîn û şirîn,
Ciwan-im ji bo çi ceger bûye xwîn.

Institut kurde de Paris

## KURDISTAN IM KA!

Baẍ û bistan im ka, Ax gulistan im ka;
Dijmin tev girtin ax, Ax Kurdistan-im ka!

Em anîn cihan wê, Em kirin insan wê,
Lê me zû ew berda, Ax Kurdistan-im ka!

Geşt û seyran-im çûn, Heyran xan-im çûn.
Çavê-m li ẍurbet ma, Ax Kurdistan-im ka!

Guh nadim ê çû do, Şev diçî zû, tê ro.
Te ji bir nakim na, na, na; Ax Kurdistan-im ka!

Min ceger tev bû xwîn, Bê xwendin û zanîn.
Bê tac û bê Kesra, Ax Kurdistan-im ka!

## Derdê min kûr e

Derdê min kûr e, wek çemê Aras.
Leşkerê ẍem her wek şahê Ebas.

Di rêça te de me dane kuştin,
Gelek çeleng û fêris û mêrxas.

Jar û gerdenxwar, tev mane bindest,
Hezar Ristem û egîd û gernas.

Dwazde emaret me kirne wêran;
Ketin bin lingên Selîm û Îlqas.

Hemî xudanê zîv û zêr û tac;
Îro tev mane tazî û pêxwas.

Nav û dengê kurd dinya tev de girt;
Me xwe winda kir, em mane nanas.

Axa Kurdistan gelek wek Idrîs,
Anîn dinyayê zana û çeknas.

Zanim pir xweş e, tev baẍ û bistan;
Şaẍ û Şeqlame, Kercos û Bagas.

Elmas û gewher Cegerxwîn mefroş,
Şivan çi zanin gewher û elmas.

Institut kurde de Paris

## FALA QEREÇIYÊ

Rokê yeke qereçî,
Reş û pêxwas û birçî;

Kincûl kevn û zîvarî,
Bi dest darek çinarî;

Bejinzirav, pîr û req,
Dev û lêv û rû bi deq.

Keça wê l'ser milê wê;
Serjêr bûn hingilê wê.

Derewker û hem bê ol;
Di ber pişta wê de pol.

Mêr û jinê nava gund;
Lê bûne kom, weke kund.

Her yek jê re tiştek bir,
Pîrê fala xwe vekir.

Wan çi got û wê go tew;
Fala pîrê tev derew.

Paşê hate mala me;
Ka geşt û sersala me.

Min jî da-yê hinik ce;
Wê rahişte polê xwe.

Polê kevn û pir xweşik;
Tê de hebûn sê qulik,

Tilya xwe min danî ser,
Pîrê xwarin çend keser.

Pîra weke melkemot;
Nêrî pol û paşê got.

Ey seydayê Cegerxwîn,
Fala te wek dûrebîn.

Te barekî pir giran,
Daye ser xwe bêguman.

Ev ne barê yek û do,
Dev jê berde bes e lo.



Institut kurde de Paris

Ji bo bar û karê te,
Hemî kes neyarê te;

Kurmanc tev de mêr û jin;
Ew ji bona te dijmin.

Te divê ko ew bibin mêr,
Xwedan text û tac û zêr.

Bi yek can û dil û deng,
Digel dijmin bikin ceng.

Tev de bidin soza xwe,
Zû bixwazin dozaxwe.

Weke mêra bibin yek;
Bi dest bigrin gurz û çek;

Li ser çiyan bibazin;
Doza xwe tim bixwazin.

Ji Kermanê ta Ferat;
Mûsil bigirin ta Xelat,

Yek serdarê xurt û jîr,
Li cem rûnin çend wezîr.

Ji bo kurd û Kurdistan;
Ava bikin dibistan,

Da bixwînin keç û kur;
Çêkin top û balafir.

Xwendewarên qenc û baş,
Li pêş leşker bikin marş.

Wek seydayê Cegerxwîn;
Bikin hawar û qêrîn.

Institut kurde de Paris

## Ma tê li ser kê bigrî

Xanîkî reş tê de rûniştiye kalekî rîşîn,
Çav şil û kezeb şewat û dil birîn.

Şadî û xweşî, dijmin û kul û derd dost,
Saz û naz jê dûr û hemnişînî wî nalîn.

Yek axînê wî bihuştê dikî herwekî dojeh;
Yek nalînê wî Biharê dikî herwekî Havîn.

Li ber kelaşê kur li dor lêlê û hem lolo,
Zerî hêstira dimalin û çavreş û perî digrîn.

Kalo bi kul û derd e, xanî lê bûye zindan,
Kula kezebê kûr e, lê ne wek welatê şêrîn.

Evqas begler û paşa bi destê dijminê xwînxwar,
Canê xwe sipartin axa cebana wek mîr Ezdîn.

Ka mîrekên baba û sora û paşay Rewandiz,
Ka mîrekên Cizîr û Temir paşayê zengo ê zêrîn.

Gelek wek van dijmina tev dane kuştin,
Ma tê li ser kê û kê bigrî ey seydayê Cegerxwîn.

---

## DERWÊŞ

Dema xişta çûye, dema tang û top e,
Irbanê bavêje dijmin qope-qope.

Ev rêça hun tê de, rêçek xwar û kêm e,
Rêça serxwebûnê çi xweş rêç û şop e.

Çiman wer nezan î, bi xişt û irban î.
Ji devê wer bûye hêj î hope hope.

Cobarên zanînê tev gihane dijmin,
Ê me yek cihok e ew jî yek dilop e.

Ey derwêşê nazan dizê jîna kurdan,
Dermanê nezana tenê zanim çop e.

Cegerxwîn dibêjî lê hun guh lê nakin;
Dema parsê çûye dema tang û top e.

Institut kurde de Paris

## QULINGÊ PERŞIKESTÎ

Zivistan hat, pir xweş e ev Zivistan,
Berfê kilisand ev çiya û zozan.

Geh bi kulik tê, berfa sipî wek şirş;
Û geh li ser reprepa baran.

Xumîn û nalnal e, sed newal û sed co.
Gelî û bandev, miştin ji mij û moran.

Xurmîna peza kovî tê li ber daran,
Xweş qebqeba kewê nêr e, li ser latan.

Bayê kur tê, sergerm e, çeleng e dijmin;
Ji ber wî dihejin wek min çilpiyê daran.

Li jor tê dengê qulingê perşikestî,
Rê winda ye, şop û rêç lê bûne leylan.

Ji refê xwe mayiye ev qulingê bextreş;
Wek min dil bi kul û derd e bê goman.

Nizanî qir û serma heye ev dil-kul;
Kanûn û Sibat lê bûne wek Hezîran.

Ev quling, qulingê welatê me ê jor;
Lîs û hêlîn dijminan tev kirine wêran.

Qulingê me warê xwe berdaye naçar,
Nema karî, vegerî wek mirovê bê gan.

Nêçîrvanê mêrkuj devê tifinga xwe,
Dayiye pêsîra qulingê min, hey aman.

Li jêr û li jor, li rast û li çep hawîr,
Têne qulingê min bi qêrên û halan.

Herê qulingo, ji refê xwe qetiyao bes,
Em bi kû ve herin, kuştin e, yan zindan.

Lê metirse ev feleka xwar û tim xûz,
Geh dikî Paîz û geh dikî Zivistan.

Ne tenê dilkul î, qulingo û ne tenê ez,
Vegere Ararat û Sasûn, nav kurdan.

Institut kurde de Paris

Li xortên gerdengaz meyizêne tev dilkul,
Tazî û pêxwas, birçî û bê dexl û dan.

Li ser wan balafirên dijmin dirêsin;
Li jêr gurmîn e, dengê tifing û topan.

Sêpî li Kurdistanê çiqandine herdem;
Bi wan ve daleqandine torinên kurdan.

Qulingo, ma ez çi bêjim ji me re pir şerm e,
Ko em birevin, ji welatê xwe ê Kurdistan.

Tu dilbirîn û ez Cegerxwîn, em çi bikin,
Nejadê kurd nezan û reben û xezan.

☆ ☆ ☆

## Pîra Torê

Hilkişî me çûme jorê her du rex min bend û rez,
Min dî pîrek tê ji Torê ker di ber de tê bi lez.

Hate nêzîk rojbixêrek da û wek min dil bi xem,
Pîrebî bû por-sipî bû, taqî-reş bû, rû gewez.

Min ji pîrê xweş dipirsî: ey metê tu ji kû ve tê;
Go: ji Sêrtê diçme Bêrtê, xûniya romê me ez.

Xan û eywan kirne wêran mêr û jin ser jê kirin.
Min go pîrê qey tu kurd î? çûye tilyên xwe bi gez.

— Belkî benda rez bi guh bit, dengê xwe pir hilmeke;
Pir ditirsim ez ji derbê singûyê roma teres.

— Min digot; axa û beg; wê go: kurê min guh medê,
Ew şivan in, sermiyan in, dane gur wan col û pez.

Min kurek tenha heye, ew şandî bajêr medresê,
Wî du sê pirs bo me gotin pê helandin cerg û bez,

Gotî: dayê, em dixwînin wek Cegerxûn gotiye;
Zû bixwînin hev bibînin biçne Kurdistan bi lez.



Institut Kurde de Paris

## Dînê me tête zanîn

Nifrînekê ji Yezdan dikim, tu bêje amîn;
Şêx û melayê kurdan belengaz û geda bîn.

Lewra yekî ji wana qanûn bi zarê kurdî,
Ji bo me çênekir qet, ji ber vê em nezan în.

Xwe pîr dikin di wed'ê hem serf û nehw û mentiq;
Bê zar û xet û xwendin, li nav xelkê dewar în.

Paîz û hem Zivistan her sê mehên Biharê,
Her dem dikin mitala, daxwaz ji wan re Havîn.

Her dem dibên em in ê ko warîsê nebî ne;
Lê def û çerx û govend wan kirne ayîna dîn.

Dibên eger bi kurdî ilim ko bête xwendin,
Em dê bibin qizilbaş, Kurd û Bixar û Maçîn.

Feqî bi xwe nezan e, seyda dinêrî qamûs;
Heryek bi dil dibêjin em miftiyê zeman în.

Bi kurdî ger bixwînin bê renc û bê giranî;
Bê qeyd û şerh û haşî cahil bi xwe dizanîn.

Dînê me têtê zanîn bi her ziman û her xet;
Bi kurdî yan firengî, yaxud bi xetê latîn.

Wel-lahî bûm Cegerxwîn ji derdê şêx û seyda;
Qelem digel ziman-im her dem bi ax û nalîn.

Institut kurde de Paris

## SERXWERABÛNA MIRÎŞKAN

Li welatê me Xerza,
Dîkek hebû şehreza.

Rokê ew çû nav dîka,
Ji wan re go hêdika:

Rabin bêjin mirîşkan,
Bes xwe bidin enîşkan.

Dîk û mirîşk bûne kom,
Berê xwe dane cem bûm.

Leşker tev de bûne lek,
Hin çeleng û hin kulek.

Berê xwe dane çolê,
Tevlî koç û tev êlê.

Teyra dî ko nagehan,
Hatî leşkerkî giran.

Tev de firîn ji malan,
Berê xwe dane balan.

Ew jî li hev bûne kom,
Yekî rabû gote bûm;

Ey padişahê teyran,
Wey serbilindê Tûran.

Rabe ser xwe tu mîro,
Ji bo me bêje îro;

Ev leşkerê bê jimar,
Gelo heye jê zerar.

Bûm kenî û gote wan;
Ba kin bazê pehlewan.

Hudhud rabû serefraz;
Wî çû bi lez gote baz:

Go rabe ey tu bazî,
Şeh te îro dixwazî.

Baz çû cem şeh li banî,
Destê xwe l'ser hev danî.

Institut kurde de Paris

Go ey xwendekarê min,
Zû li min ke barê min,

Bûm gote bazê xwînxwar,
Bi lez rabe here xwar.

Bazî rabû weke şêr,
Firek da xwe hate jêr,

Bazê terî bi rêşî,
Hate cem dîkê pêşî,

Destê wî girt û hejand,
Nitqek jê re dirijand.

« Olan sen nêrelîsin ? » [1]
Go em xelkê Bedlîs in.

« Sizin bûrda ne îş war ? » [2]
Dîk xeyidî lê da dar.

Bazî şehda xwe anî,
Dîk jî darê xwe danî.

Go bi zor û bi gazin,
Em heqê xwe dixwazin.

Baz go kî ye serleşker?
Go tu nizanî ey ker,

Ez im paşa, ez im mîr,
Ez im şahê cihangîr.

Bazî çû cem dikê dî,
Dî ko ew jî wekî wî.

Tevan go paşa û mîr,
Kesî ne go ez wezîr.

Nefer bûne yûzbaşî,
Heta giha ê paşî,

Bazî rabû çû banî,
Li ber destê bûm danî.

---

[1] Yanî: Kuro tu ji kû yî?
[2] Yanî: Îşê we li vir çi ye?

Institut kurde de Paris

Tilûr tev lê bûne kom,
« Qale ya ey-yûhel qewm »

Ev hatine ji mala xwe,
Divên istiqlala xwe.

Bûm go bazê dilawer,
Gelo kî ye serleşker.

Go tev paşa û mîr in;
Bê wezîr û gizîr in;

Bûm hêdî rabû ser xwe,
Taca xwe da serê xwe.

Go bi taca serê min,
Kes nîne hemberê min,

Rabin wek pehlewana,
Dê em herin ser wana.

Hatin teyrên dubirak,
Ba kirin kund û qirak.

Go hon werin binêrin,
Ka em îro çi mêr in,

Dîka xwe da enîşka,
Bû qîrqîra mirîşka.

Go fermana we rabû,
Koma wa j' hev bela bû.

Ê ko kuştin ê ko man;
Hatin gundan bê goman.

Wan jî weke me kurdan,
Destê xwe j' ber xwe berdan.

Elok û tûtik û qaz,
Tev de bûne belengaz.

Tev de ketin koxê reş,
Çîroka me ji we re xweş.

Wek seydayê Cegerxwîn,
Hemî bûne dilbirîn.

Institut kurde de Paris

# Şehnama Şehîdan

Dixwazim ey dilo jaro bi çakî,
Herî mîrên welatê me tu rakî.

Bibêje ey şehîdên dîn û milet;
Bes e rabin, serê roja me derket.

Beg û axa ji we îro digazin;
Bes e rabin, wekî mêran, merazin.

Dilo jaro, ji Xalid beg re bêje;
Bi serbestî tu yek nitqê birêje.

Bibêje Xalido, rabe dereng e,
Hemî kurdan bi hev re daye deng e.

Ji wê rabe here bêje Fiad beg;
Ji kurmanca re rêzan î, tu bê şek.

Qelem fêde dikî îro tu rabe;
Xewa şêrîn ji bo me pir ezab e.

Di vî wextî kesê wek te ne zaye;
Belê çi bikim ji min îro cuda ye.

Dilo bêje Kemal Fewzî tu kanî,
Tu dilxweş be, bi van rojên ciwanî.

Dizanim ko di vî wextî, tu rabî,
Welatê me ji xwînrêjan cida kî.

Dilo, Ûsif Ziya rake ji gorê;
Bere kuştî bi carek bidne dorê.

Ji bo kurdan bikin cehd û xebat e;
Hela rabin sibe îda welat e.

Riza rabe, cihan bûye serefraz;
Di dinya mane tenha em belengaz.

Binêrin hon cihê textê Şerefxan,
Xerab bûye ji destê lawê Tûran.

Eya salih begê Hînê heleste;
Welatê me li ser te jar û mest e.

Institut kurde de Paris

Bi destê xwe tu bigre şûrê kurdan;
Bi dev bêje ji bo me we'zê quran.

Dilo rabe bibêje hacî Extî,
Bira rabe xwedanê text û bext î.

Kurên te tev dikin qêrîn û hawar;
Ji kurda re hemî bûne fedakar.

Li cî rabe, ji cî rabe Ileqî beg;
Li şûnbazan dixwînin hacî legleg,

Welatê we xela rakir li şêran;
Niha seyd e ji bo kundê şikêran.

Were Xeyrî begî rabe ji Dêrsim;
Ji te halê welatê xwe bipirsim.

Herê ew maden û bax û rezana;
Gelo rast e ketin destê nezana.

Bes e Rasim tu rabe ey efendî;
Bixwîne tu ziman û zarê zendî.

Binêre xweş li vê cehd û xebatê;
Ji rojava hetanî rojhelatê.

Ji Hîzanê tu rabe ser xwe Birhan;
Tu birhan î, ji bo dawa me kurdan.

Bi navê te dikin cehd û xebat e;
Netîca me belê tola welat e.]

Were rabe mielℓim tu ji Pîran,
Ne Pîran e, belê pîr e ji derdan.

Gelek jar e ji ber derdê kurên xwe,
Xerab kir xanimanên hundirên xwe.

Teyib Alî werin carek şiyar bin;
Qelem bigrin li şînbozan siwar bin.

Belê zanim ko em pêk ve bibin yek;
Emê gogê berî xelkê bibin şek.

Were rabe Silêman lawê Ehmed;
Welatê te hemî zozan û serhed.

Bes e rabe, ji bo te hatî Ferzend;
Belê ferzendekî Ristem, hinermend.

Institut kurde de Paris

Were rabe Efîf beg wek egîda;
Li meydanê bidin xar û cirîda.

Eşîra Heyderan û hem Celalî.
Ji meydana kemalê mane xalî.

Bibêje Ûsifo rabe dereng e;
Li her alî binêre qal û ceng e.

Welatê te hemî mêrg û bihuşt e;
Delalê min tu rabe çaxê geşt e.

Dilo Xalid begê Ûsif bibêne;
Ji xew rake Kerem beg pê re bêne?

Bibêje ey hinermend û serevraz,
Tu rabe bo te hazir bûye daxwaz.

***

Were ey şêx Seîdê pir minew-wer;
Bes e rabe tu îro ey dilawer.

Zemanê te ne ew çax e tu razî;
Bi serbestî tu heqê me bixwazî.

Belê wextê tiving û top û şûr e;
Ezîzê min necata me ne dûr e.

Tu Evdilqadirê şêxê li Nehrî;
Di alem de tu mnşhûr û bi fexr î.

Kerem ke rabe ser xwe ey tu serwer;
Ji bo kurda tu rêzan û tu rêber.

Tu Şemsed-dîn î roja dîn û mil-let;
Ji Qamişlo tu rabe pir bi him-met.

Belê zanim ko qehra te çi doje,
Were cergê neyaran Pê bisoje.

Were şêx Evdilahê Melekanî;
Şehîd î, tu di nava melekan î.

Li zozanan tu binêre li xwînê;
Li canê me tu nabênî birînê.

Were şêxê me Eyûbê bi semax;
Binêre tu li zozanê Qerejdax.

Hemî gund û hemî kanî, hemî war;
Xerab bûne ji destê zilm û nayar.

Werin rabin gelî şêxên di Çanê;
Binêrin hon li vê axirzemanê.

Felek bê bext e, lewra xûz û xwar e;
Heta îro bi kurdan re, ne yar e.

Were şêx Evlilahê narikî zû;
Binêre tu li me yek carekê zû.

Welatê me wekî aşê neyara;
Serê kurda dihêrit her bi bara.

Were ey şêx Şerîfê sahibê dîn;
Ji kurda re belê zanim tu dûrbîn.

Tu bawer be honê rokê bibînin,
Emê heyfa we dê carek hilînin.

Dilo jaro here nik Evdirehman,
Ew e şêx û şehîdê dîn û îman.

Tu geh bigrî, tu geh pê re binale,
Belê şêxê te pir qenc û delal e.

Hezar hêstir bi yek çavî birêje,
Edeb bigre li ber wîjê re bêje.

Cegerxwîn bo te herdem pesnedar e,
Hezar rehmet li gorna te bibare.

Ji Tepê rabe ser xwe ey tu seyda;
Rihê şêrîn ji bo kurdan te key da.

Çilo sebra to tê îro di gorê,
Birayên te ketin bin destê zorê.

*
* *

Institut Kurde de Paris

Were batûyan Emer axa, delalo,
Li halê me binêre ey tu xalo.

Ji bo we pir fehêt û ar û şerm e,
Kurên Cengîz bi carek têne ser me.

Were rabe Fetahê hacî delî,
Welatê te hemî zozan û gelî.

Binêre tu li welatê jêr û jorîn,
Hemî kurd in, kurên Behramê Çopîn.

Temir axa ji Hîzolî tu rabe,
Binêre tu li bextê me xerab e.

Belê îro hinek yar e ji bo me,
Belê çi bikim ko êvar e ji bo me.

Were Ûsif begê zazî bi gorî,
Bidêre guh hewarek tê ji sûrî.

Heçî kurd in wekî Ristem kurê Zal;
Welê çi bikim, nehin hal û nehin mal.

Were rabe tu Seyful-lahê hînî,
Tu dê halê welatê xwe bibînî.

Welatê te kete destê neyara;
Heçî kurd in li ser şax û diyara.

Dilo jaro bi Yado re xeber de,
Bila rabe mecala qewmê kurd e.

Were carek li kurda em binêrin,
Hemî xort û piling û şêr û mêr in.

Were rabe ji nav Botan tu Gurgîn;
Tu dilxweş be, ji bo te hate mizgîn.

Birayên te şiyar bûne bi carek;
Di nav wan de ne maye qet neyarek.

Erê Sebrî? kurê Faro tu kanî,
Gelo dîsa li ser şax û çiyan î.

Belê zanim di gorê de dinlî,
Tek û tenha û jar û bê heval î.

Institut kurde de Paris

Ji Erxen rabe Şewqî pir bi şewq î,
Ji kurda re tu dilxweş û bi zewq î.

Binêre tu l' welatê me diyar in,
Hemî kurd in li ser wana firar in.

Ji nav qewma tu rabe ey Mihemed;
Hemî kurd in, ji nik te ta bi serhed.

Wekî te ew hemî şêr û piling in;
Bi yek carî bi qîl û qal û ceng in.

Heso Têlî Birahîm beg tu rabe;
Li zozanê Eraratê xuya be.

Bijî dîsa bijî dîsa Birahîm;
Ji kurda re ti wî dîsa Birahîm.

Dilo bêje Elîcan û Seyidxan;
Şehîd in hon, belê xwîna me kurdan.

Belê zanim cihê we pir bilind e,
Bira rabin xewa şêrîn ne rind e.

Ji Tewfîq û hevalên wî re bêje,
Heçî kurd e, wekî me xwîn direje.

Bi qurbana we bin sed şah û kêxwe,
Digel mal û eyal û zarowên xwe.

Dilo bes bes, xelas nabin ibarat,
Hezar rehmet li zozanê Erarat.

Hene tê de şehîd û şêx û xazî,
Ne wek şêx û şehîdanê mecazî.

Belê sondê dixwim carek bi Laleş,
Bi Zardeşt û bi roj û heyv û ateş.

Bi Ehremen, bi Hurmizgah û Yezdan;
Şiyar bûne belengazên di kurdan.

Tiving çûye, niho dor hate xame;
Xewa şêrîn li çavê me heram e.

Binêrin hon li zozan û diyara,
Hemî sor in, ji ber xwîna ezara.

Institut kurde de Paris

Keç û duxt û ciwan û qîz û bûkan,
Ji derdê me ketin rengê pepûkan.

Ne bes kuştî ev in lê em nenas in;
Di Goran de, di Loran di çiqas in.

Ji wan dûr im, wekî kor im di tarî;
Hezar rehmet li gorna wan bibarî.

Belê roja ko kuştî çûn wefat e?
Çi xweş roj e, wekî cejna welat e.

Ji wê rojê cegerxwîn û cegersoz;
Bi qurbana we bim, îda we pîroz.

**Nezan bê ço nabê hişyar**

Bes e ey kurd ji bo me ev qeder ar;
Ji dest derket me tac û dewlet û dar.

Me bext û talî û fersend bi reş tên,
Kesî dîro li nîvro bûye êvar.

Ji xew rabin gelî mêran û girdan;
Temaşa kin li kurdê jar û xemxwar.

Wekî Ristem werin cenga neyaran;
Ji guh bavin dirav û zêr û dînar.

Hinek rûnin li ser textê med û goş,
Hinek rengê me rakin deng û hawar.

Bi şîret ez ji kurdan re dibêjim;
Nezan bê ço tucarî nabe hişyar.

Cegerxwîn destevala hate meydan,
Dikê qîrîn ji lew bû dil birîndar.

Institut kurde de Paris

# KONÊ REŞ

Konê reş bi pişkoj û rewake û çît;
Bi pêşmal û perde û pargon û şerît.
Di bin de çewal û ˜tejber û kulav û nivîn;
Bi pez û deve û hêştir û dewar û mehîn.

Kebanî sipîdê radibî pir çeleng e bê xew,
Sêpiyê li dar datênê û li dar dixî meşka dew.
Bi dest navkil û du lewleb in û di bin re mexmer,
Mast dibî dew û bi ser dikevî nîvişkê zer.
Nîvişkê xwe, xwê dikî û tavêjî binê hîz;
Li welatê jêrî hîz e, li welatê jorî dîz.
Sivika hindirû keç e, yan bûk e yaxud qerwaş.
Benik bi desta û tûrê rengî li paş.
Kom dikî quncik û sitûrik û sergîn;
Malxo rûniştiye Çeko, Çerzende û Gurgîn.
Pez tê ser dana û bêrîvan diçin der,
Şivan pez dikî kom û serbêrî li ber.
Şîr didoşin û vedigerin ciwanik û pîr;
Kod bi desta û li nav piştê evarşîr.
Êvarî agir û pêtî geş dibî li nav konan,
Wek çirax û loks yan stêrên li ezman.
Rencber û malxo bi tifing in bi qîrqîr û gizgiz,
Terşê xwe diparêzin ji dijmin û gur û diz.
Çend rojan li warê xwe dimênin ew koçer,
Bar dikin hêştir û bergîr û huştir û ker.
Bi ir û zir deng ji wan tê geh bi şêhîn û kalîn.
Koçer diçin, siwar in; xort û kal û keçên narîn.
Wardozî tim diçin digerin li waran,
Dengê pez tê kalîna berxa û warîna karan.
Kona datênin şerîta vedireşênin paş û pêş rind.
Li pişt hev rêz dikin wek bajar û gund.
Mêkut radibî ser serê sing û di bin re pêwend,
Pev diçin pêsîr û benî û quflik û bazin û zend.
Diçêrênin kulîlk û hoşib û gihayê rengreng;
Li wan diborin sal û dem û gav û çax û beng.
Bi şadî û dilxweşî dimênin bê keser û bê şîn,
Li cihan temaşa nakin ey seydayê Cegerxwîn.





Institut kurde de Paris

## XANIYÊ COTYARA

Xanîkî kur teng, li dor çar dîwar,
Li ser wî pûş û li bin beşt û dar.

Sifirne û şirik bi kunc û eywan,
Bi kulek û refik hem bi nêrdewan.

Her çar dîwarên wî ji ax û av,
Mal û sermiyan zar û zêç di nav.

Kulav û balîf û doşek û mitêl,
Beroş û mersef, hem teşt û hem sêl.

Qadûlk û kodik, kaxik û hîzik,
Meşk û eyarşîr, cewdik û dîzik.

Misîn û legen, sênî û rûnpêj,
Moxil û bêjing, serad û girbêj.

Hestîf û maşik, tifik, xaçirgan,
Bêr û zembîl û bivir û dûstan.

Kevçî û kefgîr, derxwîn û berfmal,
Heçî û werîs, werqîl û çengal.

Xaş û bendek û çewal, tûr û têr;
Şûjin û derzî, cawbir û hem kêr.

Di ber zavê de xencerke nêriz,
Li serê malxwe zêr-taca Hurmiz.

Keçik werdigrin şar û kesrewan,
Di ber datênin çîçek û reyhan.

Dilxweş in her wek Sitî û Tacdîn,
Cegerxwîn welat, man wek Mem û Zîn.

Institut kurde de Paris

# XURTIYA YEKÎTIYÊ

Hero şêrê Silêman, Diçû şarê mûristan...
Ewî şêrê neynûk-koj, Bajar li wan dikir doj.
Bi wan pencên xwe ên tund, Wêran dikir li wan gund.
Bi vî karî dexl û dan, Ji wan distand bi talan.
Kavil hiştin, şar û sûk, Kuştin zar û zêç û bûk.
Li wan çawan bû hawar, Li ser hev bûn kar û bar.
Ne axa man ne jî beg, Teva şora xwe kir yek.
Tev de rabûn, yekî jîr, Ji bo xwe re kirin mîr.
Dane hevdî soz û bext, Jê re anîn tac û text.
Hemî çûn ber derê wî; Sonda wan bû l' serê wî.
Tevan çepkên xwe kutan, Bijî, bijî mûristan.
Mîrê wekî Sikender, Ji eywanê hate der.
Ewî mîrê dilovan, Bi serbestî gote wan.
Ez dixwazim zîv û zêr, Da ez herim giliyê şêr,
Zîv û zêr û dil û can, Dan-ê, çû cem Silêman.
Bi wan lingên xwe ên hûr, Berê xwe da riya dûr.
Belê mîrê qubd û jîr, Dane cem xwe çend wezîr.
Geh firîn û geh meşîn, Ta gehane Felestîn.
Xelkê bajêr hûr û gir, Tevan karê xwe zû kir.
Xwas û peya hemî çûn, Pêrgî mîrê mezin bûn.
Xweş, xweş hatin gote wan, Li eywanê bû mîvan.
Her du mîran şev û ro, Pev re kirin guftûgo.
Go ey şahê serbizêr, Ez hatime giliyê şêr.
Gerek wî daleqînî, Tola me jê bistînî,
Silêmanê kêscihû, Pirsek ne xweş daye rû.
Go ez mûkî dûvê şêr, Nadim bi sed hezar mêr.
Mîr rabû ser lingê xwe; Lê vegerand dengê xwe,
Go j' niha û çarê dî, Binêr çi tê serê wî.
Silêman jê ne bû tirs, Ne kir serê xwe ev pirs.
Mîr nivîsî yek ferman, Şand bajarê mûristan.
Li kû hon şêr bibînin. Çavê wî zû derînin.
Şêrê mezin pir qelew; Ji êvar de kete xew.
Mûrî rabûn weke mêr, Ketin poz û guhê şêr.
Şêrê sor û qirbelek, Nava rojê bû kelek.
Hudhud gote Silêman, Ka ew şêrê dergevan.



Institut kurde de Paris

Kurê Dawid pê kenî,
Hudhud gotê ezbenî,
Ew şêrê pir hinermend,
Îro sê ro bûye mend.
Mûrî tev de bûne yek,
Kuştin şêrê çavbelek.
Arîkarî, yekîtî,
Mûrî kirin rûsipî.
Ta ko kurd û Kurdistan,
Nebin weke mûristan,
Ne bajar û ne jî gund,
Tev de nabin serbilind.
Go tune bin mêr û zêr,
Emê çawa herin şêr.
Torîk û şêr û keftar;
Dê me bikin tar û mar.
Bê yekîtî em dijîn,
Lewre em bûn Cegerxwîn.

## WELAT HÊJ KEÇ E

Keçek min dî ciwan û xame ber bext,
Li wê çûne gelek çax û dem û wext.

Me jê pirsî ji kû ye, ey keça rind,
Kenî û go ji loran ta biçî bext.

Me go ey keç tu Kurdistan î, ez kurd;
Kenî û go: ne kurd î, ka ber û rext.

Serê xwe, min tewande ber nigê wê,
Binêr gorî dilê min bû hemî şext.

Me kir qêrîn keçê ka tac û ala.
Girî û go çima nabê key û text.

Me go qîz î, we yaxud bûye jinbî,
Go ez qîz im, Cegerxwîn zêr û zor next.



Institut kurde de Paris

## Cihan û Cegerxwîn

Cihan û Cegerxwîn li hev dane ceng,
Ne top û ne leşker, ne tîp û ne teng.
Ji gerden gez û hem ji rû ramîsan,
Ji lêvan vexwarin, diran ber diran.

Bi ah û bi naz û bi lêdan û bez,
Bi ken, hem bi awir, vebû cerg û bez.
Dilan xew revandin, ji çavên belek,
Ji şadî, giran maye çerxa felek.

Şevê mest û serxweş kirî badegîr.
Bi weş da dilê min, keçê gez û tîr.
Şevê daye destê xwe, gurz û kemend,
Bi zorê ji rojê standî du bend.

Revî roj û şev, pey ketî girtî dîl,
Wekî pêşiya reş, li ber pozê fîl.
Li me roj û şev, bûne yek çehr û reng,
Ne meyger vewesta, ne awaz û çeng.

Xweşî kul dikuştin, dilan dil dizîn,
Leq u xir bû textê me, doşek rizîn.
Çirandin me hewran û mîtan û şal,
Kiras û qutik, çarçef û pêştemal.

Ji govend û dîlan, ji ber dans û ger;
Bela bûne morî, şikestî kemer.
Kum û tac û kofî ketin ber piya,
Weke berxê mîjo herin ber miya.

Nivîn û tejik, mane ber toz û ax,
Şibake deristin û cam bûn pelax.
Qetandin me pişkoj û qulpa guhar,
Me zîvarî kir, çarik û reş-xumar.

Ji sîngê re, mertal e her destê çep,
Bi destê dinê tim dikir çerp û rep.



Institut kurde de Paris

Bi êriş gihan paxilê her du dest,
Ji nû ve cihan maye, bin dest û mest.

Bi axîn û nalîn, bi guft û bi ken,
Bi talan me girtin, dev û lêv û çen.

Bi simbêl û zilfan, li hev dane şîr,
Bi birhan, di hev wer kirin gurz û tîr.

Bi navê, me hev girtî wek pehlewan,
Ji tozê li jor bûne heşt asîman,

Me keç bir û anî bi manendê çerx,
Ji ber qonderê, me vebûn kort u erx.

Bi çavên di reş, hem bi lêvên xweşik,
Bi gaz û gilî, hate min ev keçik,

Te kuştim, bes e, ey tu canê cihan,
Tu Ristem, bi destê te gurzê giran.

Siwar be, li ser sîngê bes tu bilîz,
Ko dêwê sipî me, li ber te me çîz.

Bi lav-lav û dîlek, keçik hate min,
Felek ma li jor û zevî ma li bin.

Ji ber kon rewake hilanî bi lez,
Ji destê xwe derket xwedî mame ez.

Bi carek me girtin, der û xan û sûk,
Ji şev ta seher; bûne zava û bûk.

Cegerxwîn cihan girt û da ber şegan,
Bi tîr û bi xencer, bi gurz û keman.

# MARŞ Û XWEŞXWAN

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## EM GUHDERZ IN

Em guhderz in, serbilind in, devçirên in,
Weke Ristem bidin deng.
Doza xwe em her dixwazin, welatê xwe,
Dê em bigirin her bi ceng.
Xwîna xwe em dê birêjin bi dilxweşî,
Ji bo kurd û Kurdistan.
Bi serbestî weke Birho, weke Seydo,
Ka Ferzende, ka Ihsan?
Heta sax in, ji bîr nakin.. ji bîr nakin,
Roja cenga Şêx Seîd.
Ka ew mîr û ka ew paşa, ka ew axa,
Ka gernas û ka egîd?
Top û tifing tev diteqin, em narevin,
Sînga xwe em didin ber.
Dijmin revî, bi paş ve çû, de bidine dû,
Weke mêran bidin ser.
Gelî xorta, jêhatî bin, xwe rapêçin,
Di rexta de weke fîl.
Da em herin cenga dijmin, qumandara,
Weke mêra bikin dîl.
Bi sêpiyan daleqînin, em li wan xin,
Şûr û xencer, dar û gurd;

Institut kurde de Paris

Weke mêra em bistînin, canê dijmin,
Heyf û tol û doza kurd.

Xwendegaha em jî çêkin da bixwînin,
Herçî kurd in hûr û gir.
Da em çêkin otmatîk û mîtralyoz û
Top û tifing, balafir..

Bi serbestî li meydanê, em jî rabin,
Weke Ristem pehlewan,
Li Kurdistan tev de yek bin, xort û mêr û
Şêr û ejder nijdevan.

Em bikujin gerd û mîra padişah û
Qumandar û serleşker.
Tev walî û qeymmeqam û yûzbaşî û
Onbaşî û tev nefer.

Saz û awaz, tev de lêxin bidine pey hev,
Kewt û leşker, tîp û kom.
Da em bigrin Şare-zûr û Kermanşa û
Bayezîd û Erzerom.

Em arî ne, Îranî ne lawê Rustem,
Lawê guhderz, serbilind;
Ma ê kê ne, ev kelat û ev sera û
Birc û eywan, şar û gund.

Em tev mêr in, serpola ne, gurçikhesîn,
Lê em çi bikin dilbirîn,
Çerxa felek çep geraye, ax û aman,
Îro bûne Cegerxwîn..

Institut kurde de Paris

## RÊÇIKA XORTAN

( kurt )

Rêçika keşaf û xortan yektî û dilpaqijî,
Em dixwînin da mezin bin sertijî eql û mijî.

Pêşî her tiştî riya me zanebûn û pêşketin,
Em fidakarê welêt in, rêçenasê milet in.

Begler û axayê kurdan serbilind in xanedan,
Şêx û seydayê dilovan rê me dan dîn û îman.

Pêşî her tiştî riya me zanebûn û pêşketin,
Em fidakarê welêt in, rêçenasê milet in.

Nav û dengê miletê kurd çûye heta Hind û Çîn,
Geh bi xwendin geh bi kuştin pasibanê ilm û dîn.

Pêşî her tiştî riya me zanebûn û pêşkestin,
Em fidkarê welêt in, rêçenasê milet in.

Karperest e miletê kurd, her bi nav û rûmet e,
Ta ebed her serfiraz e bendewarê xîret e.

Pêşî her tiştî riya me zanebûn û pêşketin,
Em fidakarê welêt in ,rêçenasê milet in.

Sond û peyman bî li ser me, em di vê rê tim herin,
Wek Cegerxwîn barê milet tim divê em hilgirin.

Pêşî her tiştî riya me zanebûn û pêşketin,
Em fidakarê welêt in rêçenasê milet in.

---

## TÛTIN

Dewletên zana û jîr dinya bi zanîn dotine,
Roj û şev karê ewan her tim kirîn û frotin e.

Va di nav destê me de tûtin gelek bê rûmet e,
Lê serweta dinya hemî ma kî nizanî tûtin e.

Jîr û hozanê dinê tang û tivinga çêdikin,
Lê şêx û seyda rîdirêj cergê mirîdan sotine.

Wa Cegerxwîn tim dibêjî karekî nakî ji dil,
Rast e ma ez dê çi bêjim ê me herdem gotin e.

Institut kurde de Paris

## Zilmî Bêgane Debînim

*— Bi zarê soranî —*

Ey welatem pût û latem pîrî xemgînê te me,
Rencberê lawanî tû me, peykê migzînê te me.

Gerçî kurdit pêm delên bê dîn û gawir pêm xweş e;
Dîn û îmanim tiwî, men dîn û bê dînê te me.

Em perîşanî û zilet têk le işqê tû exum,
Pêm delên em şêt û dîn e, rast e men dînê te me.

Ezdê alem pêm delê teblîxî qewmê kurd bika,
Têk de rabin çon bira bin şêrê Ezdînê te me.

Gerçî Mûsa rêşinasê Tûrê sîna ê ereb,
Rêşinasê Dêrsim û Agrî û Hemrînê te me.

Tamî sebrem tamî sebre tal û tûjî zor me xwar,
Wa be alem tal û tûjim çunkî şêrînê te me.

Dûr ne maye serbilind bî rengê şax û lateket,
Rêberê lawanê tû me, çawî durbînê te me.

Bes yekîtî xweş divêtin da ko têk serbest bibin,
Men be qurbanê sera û ale rengînê te me.

Zilmê bêgane debînim wa li xakî tû dibî,
Şuhretî dawe di alem men Cegerxwînê te me.

Institut kurde de Paris

## OLA ME XORTAN

Em welatê xwe nadin bi Berlîn,
Deşt û latên xwe em nadin bi Çîn,
Welatê me ye, bilind e şêrîn.

Ola me xortan miletperestî,
Ji me dûr dixî xwarî û sistî.

Îro namûs e, rabin ey milet,
Doza xwe bikin bi dîn û dewlet;
Welatê me ye, xweş bûye cenet.

Ola me xortan miletperistî,
Ji me dûr dixî xwarî û mestî.

Pismamê Ristem kurd û madî ne,
Hemdemê roman, xortên kurdî ne;
Bê xwendin mane Çegerbixwîne.

Ola me xortan miletperestî,
Ji me dûr dixî xwarî û mestî.

Institut kurde de Paris

## EM NE KOLE NE

Ey welatem tev li kar in bendê fermana te ne;
Rencberê lawanê tû ne, lê ne ebd û kole ne.

Em hemî yekdest bira ne, êdî kurd navê sitem,
Serbilind em dê bijîn tev şah û gavan dem bi dem.

Ger nejîn em tev wekî hev ser xwe najî ev welat,
Rengê kevnare me navê, me divê jîn û felat.

Ma nizanî em çima her dem bi hawar û eman,
Tazî û birçî dinalin tim dixwazin kinc û nan.

Çol û deşt û lat û şaxên te hemî miştin ji zêr,
Dijminan ew tev revandin mane em bê xêr û bêr.

Wa şiyar bûne kurên te tim li kar in wek piling,
Çar kenarên te dibazin wek Cegerxwîn qîr û deng.

## HEY FELEK

Hey felek felek, hey zalim felek,
Ka ew kurdistan, ka bircên belek.
Min navê cenet, ji te bi minet;
Serbest û aza, va çûm cehenem.

Te mal ne da me, ka hec û zekat;
Min jî qet navê ev sewm û selat.
Bendên qanûna te tev çirandin,
Ka sozên te wek isbet-il-imem.

Ev hezar sal in, t'em kirne ebîd,
Te em xapandin bi wad û weîd.
Qet ji min pê ve, kes te nas nakî,
Bavê te tirk e, dayka te ecem.

Her çar kenarê me bûne neyar,
Berê me li te qêrîn û hewar.
Dengê me nakî, boçi dey nakî?
Bextê te ev e, ey çerxa alem.

Welatê me ye, xweş e Kurdistan.
Zozan û deşt e, tev baẍ û bistan.
Qenc e xerab e, welatê me ye;
Bi me pir xweş e, wek baẍê îrem.

Me tê de kuştin, egîd û gernas,
Me tê de hiştin, fêris û mêrxas.
Ser bextê te bî, ma em ne mêr in,
Nayên bîra te, Guhderz û Ristem.

Ka Ebû-Mislim, Şêrgûh û Merwan,
Ka Selahedîn, kanî Kerîm-xan.
Ka ew begler û ew mîr û paşan;
Ka Bedir-Xan û Ẍanim û Dêsem.

Institut kurde de Paris

Ma ne hêja ye, em herdem ba kin,
Ax û xewliyê bi ser xwe dakin.
Yan bibne dewlet; yan bêne kuştin;
Yan dilxweş bimrin, yan dil bi matem.

Dermanê me ye xwendin û zanîn,
Xortên xwendevan, tev bûn cegerxwîn,
Her bijîn, bijîn xortên nûhatî,
Her bijî, bijî Kurdistan herdem.

## ROJA XWENDEVANA

Îro roja xwendevana, — Kurdên hêja xortên zana;
Roja mêran, roja şêran, Roja kurd û pehlewana.

Doza me serxwebûn, Yekîtî û peşveçûn,
Bilindî û zanebûn, Rabin ser xwe kurdino.

Rabin îro roja me hat, Yek deng yek dil biçne welat;
Bigrin gund û şar û kelat, Her dem divê bo me felat.

Doza me serxwebûn, Yekîtî û peşveçûn,
Bilindî û zanebûn, Rabin ser xwe kurdino.

Em ta kengî razin hemî, Bin dest bijîn em her demî;
Lawên Guhderz nevyên Çopîn, Rabin îro tev Ristemî.

Doza me serxwebûn, Yekîtî û peşveçûn,
Bilindî û zanebûn, Rabin ser xwe kurdino.

Institut kurde de Paris

## KURDO MARŞ

Tev tev rabin, îro bù şer,
Ev ev roja ceng û tevger.

Tev de rabin kom û leşker,
Haydê kurdo, marş marş.

Bes bes, tev de rabin wek mêr;
Herkes pev re rabin weke şêr.

Tev de rabin, dest bi xençer;
Haydê kurdo; marş, marş.

Em em, tev de kurd in mêrxas,
Em em, tev egîd û gernas.

Ji xew rabin mîr û serwer;
Haydê kurdo marş, marş.

Pek, pek, va ye dijmin tê tê,
Hek, hek, rabin, mêrên çê çê.

Hemî weke şêr û ejder,
Haydê kurdo, marş, marş.

Şing, şing, hun binêrîn bù ceng,
Ding, ding timatîka da deng,

Ringeringe, top û qumber,
Haydê kurdo marş marş.

Hey, hey, dost û dijmin bûn yek;
Wey, wey, hatin ser me lek lek.

Weke mêran em li hember;
Haydê kurdo, marş, marş.

Gî, gî, em tev dilbirîn bûn,
Kî kî, em tev cegerxwîn bûn.

Marşa cengê bêjin ezber;
Haydê kurdo, marş marş.

Institut kurde de Paris

## Tev Egîd û Pehlewan

Em kurd in, kurd in kurd in, Welatê me Kurdistan.
Mêr û gernas û merd in; Tev egîd û pehlewan.

Roja cengê em şêr in, Welatê me Kurdistan,
Xwedanê tac û zêr in, Tev egîd û pehlewan.

Em pismamê Guhderz in, Welatê me Kurdistan.
Xwedanê şûr û gurz in, Tev egîd û pehlewan.

Em kurd in, em kevnar in, Welatê me Kurdistan.
Tev nandar û navdar in. Tev egîd û pehlewan.

Roja ko em giş rabin, Welatê me Kurdistan.
Dijmin zora me nabin, Tev egîd û pehlewan.

Em îro dilbirîn in, Welatê me Kurdistan.
Em tev de cegerxwîn in, Tev egîd û pehlewan.

Institut kurde de Paris

## Çaxa me nû dest pê dikî

Van demên hêja divêtin em li hev tev binerin,
Çar kenarên xakê Kurdistanê em tev bigerin.

Dest bi destê hev bidin em serbilind bin wek berê,
Xwarî û dîlî û sistî da ji nêv me zû herin.

Bexçeyê jîna welatê xwe biparêzin bi şûr,
Destê dijmin ko dirêj kirye welêt em bibirin.

Serbilind bin em li meydana cihanê wek medan,
Nameya Lozan û Sadabad bi carek biçirin.

Top û tangan em bi dezgên xwe derênin wek firing.
Em çekên xwe tev ji hasin çêbikin da nekirin.

Her kesek çaxa xwe dî, çaxa me nû dest pê dikî,
Em ciwan in dê bilind bin, gerçi dijmin bimirin.

## NÛROJA KEYO

Adar e, adare, Nûroj û Bihar e,
Adar e rengîn e, Dem û benga jîn e.
Zivistan wek doje, Adar e, nûroj e.
Dijmina der daye, Sersala kurda ye.
Nabî wek Nîsanê, Cejna Kurdistanê.
Xeml û xêza welat, Sersera, ser çava.
Dîsa Nîsan, va hat.

Em derketin deştê, Bîna gula xweş tê.
Seyda xweş rêzan e, Keyo borîzan e.
Ê biçûk û ê xort, Em tev diçin cot cot.
Berê me da çolê, Ji bo gog û holê.
Ev meha Nîsanê, Cejna Kurdistanê.
Xeml û xêza welat, Ser sera, ser çava.
Dîsa Nîsan, va hat.

Hemî xeml û xêz in, Li pê hev bi rêz in.
Çengê me tazî ne, Bihar dema jîn e.
Dîsa em rûgeşt in, Ber bi malê xweş tên.
Tiştê xweş dibînin, Xweşxwana dixwînin.
Ev meha Nîsanê, Cejna Kurdistanê.
Xeml û xêza welat, Ser sera, ser çava.
Dîsa Nîsan va hat.

## SERMIYAN

Sermiyan ev xakê Kurdistanê tev berbadî çû,
Dest bidin şûrê edalet, dewrê istibdadê çû.

Ger bi hev re ranebin em wek pilingan serbilind,
Pêş ve naçin em bi carek, xurtî û azadî çû.

Tev de rabin wek bira bin, dest bidin şûr û tiving,
Kurdino rabin hey hewar e, xakî kurd û madî çû;

Ev dema top û tiving e, tim divê xwîn û mirin,
Serxwebûn tim tê standin, bes dema feryadê çû.

Institut kurde de Paris

# KOMA MILETAN

S.D.N.

Welatê kurda tev xêr û bêr e,
Hemî maden e tev zîv û zêr e,
Lê çi bikim îro maye j'xelkê re.

Welatê kurdan hemî çîmen e,
Egîd û şêr û piling tê hene,
Hemî haval û pismamê me ne.

Pêşî li dinyê du dewlet hebûn,
Yek jê Faris bû, ew em bi xwe bûn,
Tirk û tazî û ecem tune bûn.

Em ne tazî ne, ne tirk û rom in,
Xwendan paşan e, leşker û kom in,
Îro wêran in bin destê bûm in.

Xelkê em kuştin avêtin çeman,
Begler û paşa di nav me ne man,
Koma miletan eman û eman.

Koma miletan ma qey tu ker î,
Çavê te kor e tû l' me nanerî,
Yaxud dijmin î, tu j' me nagerî.

Koma miletan hûn polperest in,
Der heqê me de hun qewî sist in,
Dijmin bi dostî em îro xistin.

Gunhê me çi ye bo çi dey naki,
Pirsê ji halê me kurdan naki,
Em kêm ketine tû me ranakî.

Ev ne huryet e, kotek û zor e,
Lê hun dizanin dinya bi dor e,
Çerxek li jêr e çerxek li jor e.

Xewa me nayê, em qet ranazin,
Em ji we dikin hêvî û gazin,
Em jî heqê xwe her dem dixwazin.

Te em xapandin civata rengîn,
Ji destê te em giş bûne xemgîn,
Ne ez bi tenê tev bûn Cegerxwîn.

Institut kurde de Paris

## NAVTÊDAN

Ey kurên Guhderz û Ristem, wek pilinga herne ceng;
Zengilê cenga welêt, wa lêdixî qêrîn û deng.

Serxwebûn doza me ye,
Lê
Pêşveçûn bo me divê.
Herne pêş, herne pêş,
Herne pêş ey xortê kurdan,
Nûciwan.

Ala rengî ta bi kengî dê li ser sînga me bi,
Lê divê ew serbilind bî, ser serayê berze bî.

Serxwebûn doza me ye,
Lê
Pêşveçûn bo me divê.
Herne pêş, herne pêş,
Herne pêş ey xortê kurdan,
Nûciwan.

Kurd şiyar bûye ji xew, êdî dijî qet namirî;
Ma ne bes taca Keyan ta kengî dijmin wergirî.

Serxwebûn doza me ye,
Lê
Pêşveçûn bo me divê,
Herne pêş, herne pêş,
Herne pêş ey xortê kurdan,
Nûciwan.

Ev çi jîn e ko di bin destê neyara jar û dîl;
Lê berê em serfiraz bûn şêr û ejder mêr û fîl.

Serxwebûn doza me ye,
Lê
Pêşveçûn bo me divê.
Herne pêş, herne pêş,
Herne pêş ey xortê kurdan,
Nûciwan.



Institut kurde de Paris

Bav û bapîrên me her dem deng û nîşan dan cihan;
Serbilind û serfiraz bûn, em bi van lat û ciyan.

Serxwebûn doza me ye.
Lê
Pêşveçûn bo me divê.
Herne pêş, herne pêş,
Herne pêş ey xortê kurdan,
Nûciwan

## HERNE WA

Bê welat bê felat, em çi ne kurdino,
Bê civat bê xebat em çi ne kurdino.
Bê xelîc û bê ferat,
Bê Cizîr û bê xelat,
Bê sera û bê kelat,
Em çi ne kurdino.

Tîp û kom ko nebin em çi ne bê ewa,
Tang û top ko nebin em çi ne bê ewa.
Tîp û kom kewt û geş,
Tang û top bidne pêş,
Vaye dijmin revî,
Herne wa herne wa.

Pehlewan ko nebin kengî pêk tên hemî,
Xwendevan ko nebin, kengî pêk tên hemî.
Xortino herne ceng,
Rengê Ristem bi deng,
Da bijîn xurt û rind,
Serbilind em hemî.

Institut kurde de Paris

## Serxwebûn

Kurdino, merdino pir xweş e serxwebûn,
Ew demên tar û teng ko me dîn vane çûn.

Dest bidin hev hemî pêş kevin em hemî,
Da biçin bo welat yan mirin yan felat.

Roj li me hate der, zû şiyar bin ji xew,
Ev dema ceng û şer paş ketin êdî hew.

Dest bidin hev hemî pêş kevin em hemî,
Da biçin bo welat yan mirin ya felat.

Min divên ol û bext, min divê pêşveçûn,
Min divên tac û text, min divê serxwebûn.

Dest bidin hev hemî, peş kevin em hemî,
Da biçin bo welat yan mirin ya felat.

## DEŞT Û LAT

Roja ez çêbûme min dîn ev deşt û lat,
Rojek nû, rûsipî min dî zû lê hilat.

Bo me herdem divê pêşveçûn û xebat.
Koletî min nevê, min divê tim felat.

Serbestî doza me, doza me serxwebûn,
Serdestî karê me, karê me pêşveçûn.

Bo me herdem divê pêşveçûn û xebat,
Koletî min nevê, min divê tim felat.

Ez kurê tang û top, min divê qîr û ceng.
Ez kurê tîp û kom, min divê nav û deng.

Bo me her dem divê pêşveçûn û xebat,
Koletî min nevê min divê tim felat.



Institut kurde de Paris

## KEYO

Ey keçê rabe bixwîne da tu serbest her bijî,
Zû ji xew tû ser hilîne bes bimîne bê mijî.

Rencbera hundir tiwî tim rind û jîr û zane be,
Bo te bêtir her divêtin xwendxwarî, paqijî.

Wa hevalên te li her cî serbilind pêş ve diçin,
Rabe ser xwe ey keça kurd serbilind bimre tu jî.

Ger bixwînî dê bidî xwendin tu ê hundir teva,
Ger nexwînî kes ji bo me êş û derdan nakujî.

Wa Cegerxwîn xweş dinalî da ko jin pêş ve herin,
Da bibêjin her bijî kurd her bijî kurd her bijî.

## Şêrîn

Ey keça kurd nû gihame tim dixwazim pêşveçûn;
Doz û daxwaza me herdem tac û ala serxwebûn.

Tim divê ko em bixwênin da nemênin jar û dîl,
Min nema êdî divêtin ev xeyal û qal û qîl.

Paqijî karê me ye seydayê hundir her em in,
Dayika Guhderz û Ristem kurd perest in dilxem in.

Ez ji xew rabûme serxwe ev dema kar û xebat,
Tim li ser ola Cegerxwîn canfida me bo welat.

Institut kurde de Paris

## Ez Ezîn Ne Ma

Xortino werin em bi pişt û mil,
Bo welat xebat, em bikin ji dil.

Serxwebûn divê bo me her demî,
Pêş kevin hemî pêş kevin hemî.

Em bi nav û deng, her bikin xebat,
Serbilind hemî, em biçin welat.

Serxwebûn divê bo me her demî,
Pêş kevin hemî pêş kevin hemî.

Ez-ezîn ne ma, ne ma kes mezin.
Xort û kurd hemî wek bira bibin.

Serxwebûn divê bo me her demî,
Pêş kevin hemî, pêş kevin hemî.

Min divê welat min divê serek,
Serbilind hemî em bijîn gerek.

Serxwebûn divê bo me her demî
Pêş kevin hemî pêş kevin hemî

Bo me bes divê yektî û mijî,
Her bijî welat her bijî, bijî.

Serxwebûn divê bo me her demî,
Pêş kevin hemî, pêş kevin hemî.

Xortino hemî em ceger bi xwîn,
Yan mirin divê yan bilind bijîn.

Serxwebûn divê bo me her demî,
Pêş kevin hemî, pêş kevin hemî.

Institut kurde de Paris

## DIBISTAN

Her çar xêzên Kurdistan, Hemî çiya û zozan,
Tijî piling û şêr in, Bijî bijî Kurdistan.
Ez biçûk im dixwînim, Zilma dijmin dibînim.
Bi kuştin û bi ferman, Bijî bijî Kurdistan.
Mezin bibim bidim deng, Digel dijmin bikim ceng.
Bi girtin û bi zindan, Bijî bijî Kurdistan.
Ez nûhatî me ferx im, Ji dest dijmin te derxim,
Ji Sêwas ta bi Kerman, Bijî bijî Kurdistan.
Xebat bikin roj û şev, Şûr û qelem digel hev.
Xortino herin dibistan, Bijî bijî Kurdistan.
Ez dixwînim dilbirîn, Seydayê min Cegerxwîn.
Xwendewar im pehlewan, Bijî bijî Kurdistan.

Institut kurde de Paris

## Ji Biçûkan re

Şêr û piling tev de çûn, Rastî serîk penîr bûn.
Vî jê xwar û wî jê xwar, Her diwa li hev dane dar.
Yekî ji ê dî re got, Her dû rabûn bûne cot.
Go em herin cem rovî, Seydayê wehş û kovî.
Ewê me li hevdu bênî, Çavê mêrik derênî.
Her dû çûne cem rovî, Bûne derwêş û sofî.
Doza xwe jê re gotin, Dil û çergê wê sotin,
Rovî go de rabin zû, Ji mi'r bînin terazû.
Wan terazû anî ber, Rovî penîr danî ser.
Alîk pir û yek hindik, Yek ma giran, yek svik.
Lekmek ji ya giran bir, Ew ji a dî bû siviktir.
Geh ev xwar û geh ew xwar, Heta ko ma ben û dar.

# ALA MIN

Ala rengîn pîroz î xweş, Te hildigirim diçim bi meş.
Tu l'ser milên xortên ciwan, Di nav te de yek roje geş.

Ala sê rengî tû,
Bê nav û deng î tû,
Nîşan cegî tû,

Ey xortên kurdan, Selavê lê bikin.

Îro me tu kirye hembêz, Rojek wê bê te bikin rêz.
Li eywana, li ser bana, Roja şadî tu xeml û xêz.

Kesk û sor û zer î,
Sipî û gewher î,
Nîşan zefer î,

Ey xortên kurdan, Selavê lê bi kin.

Te bi zîv zêr tev de kil dim Roja cengê ez te hildim.
Ger ez bimrim ger ez rabim Cegerxwîn im serbilindim.

Ala sê rengîn î,
Pîroz û şêrîn î,
**Nîşana mizgîn î,**

Ey xortên kurdan Selavê lê bi kin.

Institut kurde de Paris

# NAME Û REŞBELEK

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## JI HAWARÊ RE

Hezar carî pîroz bitin ev hewar,
Gelek xob û rind e wekî gulizar.

Gulistanê zarê me ye pir ciwan,
Pesendîde ko min berê wê dixwar.

Çi mêwek şêrîn e, berê wê giha,
Ji bo bilbilê dilnexweş bû Bihar.

Hezar bilbilên dilşewat û bi xwîn,
Di nav bexçeyê wê dikin ah û zar.

Hezar ah û zaran dikin lê ez im,
Ji wan bilbilan ê cegerxwîn û jar.

Hewar pir ciwan e keç e, nûgiha,
Gelek dîlber û nazik û nazdar.

Çi bistanekî berxweş û zûgiha,
Hemî sêv û xox û bihok û hinar.

Li ber wê heye bexçevanek mezin,
Şehinşah û paşa ye ew xwendekar.

Serefraz û comerd e ew bexçevan,
Didî her kesî wî berê abidar.

Qelen kêm û erzan e pêsed qirûş,
Bixwazin ji Alî Celadet bi ẍar.

Institut kurde de Paris

## JI XWEDIYÊ HAWARÊ RE

Di kurdan de me dî yek mîr û hakim,
Ji ber eqlê wî girtin ayîna Cem.
Edîb û jîrek û zana û hêja,
Xerîqê rehmeta wî cimle alem.
Xudan nav û nîşan e, bo me rêber,
Ji navê wî bi qedr e Nûh û Adem.
Cihan sifre, sitêrik jê re xulman,
Nihan bûye di sifra wî de Hatem.
Bi mîranî şehinşah û serefraz,
Bi mêranî ji wî mexlub e Ristem.
Ji ber rûyê wî girtin sûretê Çîn,
Fehetkar e ji ber husna wî Cewcem.
Bi qurban bin ji bo wî alê Osman,
Bi xizmetkarê wî bin alê Xwarzem.
Celadet beg bi nav e, min bi şahî,
Qebûl kerdem, Cegerxwîn bûye an dem.

---

Begê min serwerê min ey Celadet,
Şehê min rêberê min pir edalet.
Tu binvîse di hawarê selaman,
Ji ber min ve li kurmanca temaman.
Çi kurmancê Enadol û çi sûrî,
Çi goran û çi loran û çi sorî.
Çi gavan û çi sapan û çi mîr e,
Gelek bêtir li kurmancê Cizîre,
Ji Nafiz beg bipirse ey begê min,
Çi derman e ji bo derdê dilê min.
Belê Îsa ji ezman hate xware,
Welê dîsa ne dî jê re tu çare.
Li ser sînga me danî destê taze,
Di rengê ayînê dî dil ne saz e.
Dikir qêrîn digo derdê evîn e,
Eve derdê li Ferhad û Şirîn e.
Eve derdê ko pê çûne Mem û Zîn,
Tu dê bimrî bi vî derdê Cegerxwîn.



Institut Kurde de Paris

# JI KIRIYARÊN HAWARÊ RE

Hewar e hey hewar e, çiman wisan dinalî,
Seyd heyf û sed mixabin bê zîv û zêr û mal î.

Hewar tiwî di kurdan di her mekan û erdan,
«Ehyeytê fikre qewmin edha minel xiyalî».

Ey serbilindê kurdî kesê hewar divêtin,
Divê hewar xwedî kin, bi her hewa û halî.

Hewar e hey hewar e «ya ey-û hes-sukara»
«E'tul filûse huben fî sefhetil mecalî »

Pir şerm e ko hewara me ta ebed nemînit,
Hewar keç e ciwan e xweş bûk e çardesalî[1].

«Ya eyuhel kiradû daqet lenal biladû,»
«In-nel kerîme men qed e'ta bila sialî».

Peran bidin hewarê da ko bi ser xwe bêtin,
Bigrî di erdê Şamê kemalê bê zewalî.

Hatem yek e bi tenha kurdên me tev de Hatem,
Hawar e rengê bêjen ka Ristemê ji zalî.

Hewar direfşê Kawe, kaxet qumaşê sade,
Jê re peran bişînin kurdino bi dil, helalî.

Çi hewce ye ko bêjim çêtir ji min dizanin,
Hewar çiqas delal e naket li me delalî.

Wel-lahî bûm cegerxwîn ji derdê kurdê nazan,
Herçî dibêjî kurd im, guh bidne ber meqalî.

[1] Wextê Seyda ev şiir nivîsandiye hejmarên Hawarê hêj nû bû bûn çardeh.

Institut kurde de Paris

## JÎ EHMED NAMÎ RE

Namî, me ji nameya te zanî,
Seyda yî ji bo melayê Xanî.

Serbestir î ez feqihê Feyran,
Sed rengê Herîrî bo te heyran.

Textê te ye taqê çerxê gerdûn,
Neqşê te ye her kelamê mewzûn.

Xêza qelema te nexşê çîn e,
Hub-ba elema te riknê dîn e.

Meşhûr î ji rengê mah û rojî,
Hub-ba te gelek dila disojî.

Pertavê te bû di rûyê şêrîn,
Ferhadê reben li ser te bû dîn.

Mehbûb tu yî der sera Medînê,
Mem çû bi xelet serayê Zînê.

Ger çendî niha li Til-şeîrê,
Yûsif tu yî, min tu xistî bîrê.

Lakin tu di Misrê dil de şah î,
Sahib elem î, xudan kulah î.

Ey pertewê can û her du çavan,
Her gavê li te dikim selavan.

Gel al û heval û dost û yara,
Herçî ko ne çûye nêv mezara.

Cemşîd e di gulşena Biharê,
Bişkoj e nû çûye der ji xarê.

Lewlew dikî ew e' jî dinosim,
Apo ji te dest û pan dibosim.

Lakin çi qeder zeîf û gêj im,
Pesnê te ne şim qewî bibêjim.

Her dem me di dil de jan û derd e,
Ew jan e ji derdê qewmê kurd e.

Institut kurde de Paris

Heta sibehê neşim ko razim,
Qîzek te heye neşim bixwazim.

Zanim ko qelen gelek giran e,
Hindik ev e, xwîn û dîn û can e.

Heta ko rehet bibim ji derdan,
Ez dê bigirim welatê kurdan.

Paşê ji te ez ewê bixwazim,
Bê mehr û qelen di ber de razim.

Apo ji te re kelamê şêrîn.
Bavê mi' nivîsiye Cegerxwîn.

Institut kurde de Paris

Ey canê ciwan ,pakê hewes hemdemê xweşvîn,
Ez husnê tu mehcûb e hezar Yûsif û Şêrîn.

Ey ateşê nêv can û dilê sed Mem û Ferhad,
Wey nûrê ruxê mahê felek, tabê ruxê Zîn.

Ey totiyê bistanê gulê rojê ciwanî,
Wey bilbilê dilşadî li zozanê Şerevdîn.

Ey Ehmedê meb'ûsê dilem ayetê esra,
Elqabê tu « Taha » û dîger wesfê te « Yasîn ».

Atêşperes im men sofiyê hezretê Zerdeşt,
Ser ta bi qedem, can û dil ez dûriyê xemgîn.

Canê min û canê te di laşê me de bûn yek,
Ger hedê nezer dûr î welê çeşmê me dûrbîn.

Şeb ta be seher ez bi xeyala te re dildar,
Ez eşqê tû pir jar e dil û canê Çegerxwîn.

## Ji Hevalekî Min re

Ezîzê min, enîrojê bi rùmah.
Di iqlîmê suxen da mîr ù yektah.

Şehinşahê delalan ù ciwana,
Serferazê egîd ù pehlewana.

Wekî Ristem li meydana şecaet,
Wekî Hatem li nêv deşta sexawet.

Du çavên te reş in bê kil ù kildan,
Cilakî keb, lebê şêrîn ji qendan.

Esefkêş e, ji rùyê wî re sorgul,
Telebkar e ji dîna wî re bilbil.

Di ewsafê kemalî bê qisùr e
Belê dùr e, çiqa dùr e bi nùr e.

Selamê min gelek ser wê civatê,
Çi Eyşê ù çi Rewşê ù çi Fatê.

Li apê min, li xalê min temaman,
Li axa ù li xatun ù xulaman.

Birayê min bi mektùba te ko hat,
Tereb hey bù, belê derdê me pê mat.

Bi qurbana te bim Ehmed ne eyb e,
Eve şê'ra min e bê şik ù reyb e.

Belê şê'r e gelek rind ù ciwan e,
Mede destê biçùk ù hem nezana.

Ricakar im, nekin carek itabê,
Binêrin lê, bi sed çavên sewabê.

Institut kurde de Paris

# ŞÎNA ŞÊX KEMAL

Der deron im, ah û hesret nalenal û hezn û şîn,
Sal û mah im, roj û gav im, rengê dojeh xemcivîn,
Mest û sergerdan û jar im, tên ji dil ah û enîn,
Wey Cegerxwîn! hê ji nû ve axivîne sed birîn,
Çûye rehmet, pîrê pîran şêx Kemalê qutbê dîn.

Firqeta wî mal û milkê dil bi talan tev revand,
Herwekî rad û birûskê ew li kê ket, rahejand,
Xanûman tev kirne wêran, leşkerê eşqê şikand,
Rengê Eskender li Dara dewleta min wergerand,
Kirne wêran birc û eywan ew sera û şaneşîn.

Şerhê wesfê wî bibêjim, lazim e dilsafî bim,
Lê nikarim, xweş beyan kim, ger bi xwe keşafî bim;
Haşiya Ûsam û Larî ko li şerha kafî bim,
Yan wekî Ferdewsê Tosî pîrê merdê lafi bim,
Ne bi tenha aciz im, lê sed wekî Ibnil-yemîn.

Hikmet û adab û rafet der cihanê bê heval,
Zuhd û taet, hilm û şefqet, ilm û eql û pir kemal,
Sidq û cûd û heq û himet ro ji husna zulcelal,
Mahîtab û rojcebîn bû, qed û qamet îtidal,
Destegîr û şêx û mirşid, we hiwe Zeynûl-abidîn . .

Dil wekî mir'atê saf e, camê bel-lor, can û ten,
Kaniya ava heyatê, ew kelam û guft û ken,
Şerbeta qend û nebatê, la'lelêv bûn tûreçen,
Hamidî-yul-eslî heq-qen, Ehmediy-yun, nisbeten,
Namê an qutbî kemalest, min çi hacet an û în . .

Çûye rehmet, baẍê cen-net, barî jê re kir meqam,
Ey nesîmê subhî en-nî belliẍit-turbes-selam,
Ba edeb, jê re bixwîne, namiya şêrînkelam,
Ey seba bêjî tu zanî, ey ezîzê Misr û Şam,
Jar û ẍemgîn e li ser te, cîm û gê û rê û xwîn . . .

Institut kurde de Paris

## Ji Elî Ewnî re

Ey Ewnî ey Elî beg, ey şehsiwarê çalak,
Nav û dengê te yek yek, gihane çerx û eflak,
Belê dûr î ji min, wek şêr û piling î pir çak.

Şêrgoh î tim li Misrê, welatê te perîşan,
Sed heyf û sed mixabin, ji bo xortek xwedî şan,
Li welatê biyanî xwedanê nav û nîşan.

Namûs bike binêre, li welatê me . . jar e,
Şarezor û Siwêrek hemî çol û beyar e,
Dijmin li ser dibazî, ji kurda re neyar e.

Li zozanê me kurda, xweş tê dengê tilinga,
Dengê top û teyara, dengê gurz û kulinga,
Xortê kurda bavê min, mêr in wekî pilinga .

Dikin hewar û gazî, li ser çiyan dibazin,
Herdem bi serfirazî doza me ew dixwazin,
Eger tu rast dixwazî, ji me kurdan digazin.

Çendek ji wan me dîne, gelek cara dibêjin,
Werin destê me bigrin, xwîna xwe tev birêjin,
Em tim li ser çiya ne, lê ne dîn û ne gêj in.

Belê tu serbilind î, ew xameya te zêrîn,
Her dem ji bo me kurda, dikî hewar û qirîn,
Ne ez, ne tu bi tenha, lê kurd hemî Cegerxwîn.

Institut kurde de Paris

## Ji Qederî Can re

Ey hevalo delalo, tu her tiştî dizanî,
Di zimanê me kurdan tu wek melayê Xanî,
Tu xortekî çeleng î ez kalekî zemanî,
Dîl û gerden şikestî bendewarê xizanî,
Xwedê te xweş bihêlî, tu xortekî ciwan î.

Erê rûyê te roj e, tava wê da diyara,
Devê te wek biskoj e, nû derkevî ji xara,
Porê serî te sor e, weke gula zinara,
Serê te kehruba ye, mû distînî ji mara,
Ayîneya Skender, çavê te bû li Dara...

Birhên te pir zirav in, her dû wekî du hîva,
Pozê te î çilakî, sade ji zêr û zîv e,
Bejna te ya Siyamed, li zozanê Silîva,
Sondê dixwim bi ateş bi wî xirqê kirîva,
Li ber tava te mane Zaz û Tor û Birîva..

---

Dêrik çi xweş e bi dar û av e,
Ev ave, li her derê belav e.

Yek xab e belê, bihuşt û mawa,
Pir mişmiş û sêv û dar û selwa.

Pir gwîz û hejîr û xox û hinar,
Pir kanî û aş û av û cobar.

Yek dî heye pê dibên Kulêbê,
Gorî ne ji wê re Xurs û Şêbê.

Pir aveke sar û pak û şêrîn,
Pir dar û ber û giyahê rengîn,

Bilbil digirî bi ah û zar e,
Daxwaz bi xwe komela Hewar e.

Mizgîn didî ew heval û yare,
Qedrî ko li Şamê xwendewar e.

Çepkan dikutin dibên birawo,
Gorî te bibin xweh û birao.



Institut kurde de Paris

### Ji Osman Sebrî re

Erê Osman te agir da dilê min,
Te pir kir derd û êş û hem kulê min.
Te da destê me, carek destê Ristem,
Te zenar û kemer dane milê min.

Mixabin ko tu çûyî ez tenê mam,
Li ser te her dinalî bilbilê min.
Dixwim sondê bi Yezdanê dilovan,
Di piştî te ne maye aqilê min.

Welatê me dibêjî her şev û roj,
Gelo ka pertewa can û dilê min.
Dikî qîrîn bi ah û zar û feryad,
Were Osman binêre kavilê min.

Eger bawer nekî carek binêre,
Dibistana de zer bûn sinbilê min.
Ko dengê te hero carek neyê min,
Qe geş nabin di baxan sorgulê min.

Tenê maye li ber bîna diya xwe,
Bi gorî bim ji bo te dumbilê min.
Cegerxwîno! bike gorî serê xwe,
Ji bo wî re digel xwe gurdilê min.

~~~~~~~~~~~~~~~~~~~~

Bi gorî bim ji bo te ey birayê min tu kanî,
Ji dûrî ve te destê xwe di nêv destê me danî.

Bi min û te du dest in, bê çep û rast ey birader,
Belê her du qewî jar in di yek laşê giranî.

Me pirsî derdê kurmanca ji çerxa etlesa jor,
Nezanî bo tevan derd e, belê ê me xizanî.

Belê zêr e, belê zêr e, belê zêr e, belê zêr,
Xwedanê wî cihangîr e bila ker bit di xanî.

Ji bo me, ne eqil fêde dikî ne xwendina pir,
Ji bo me ço divêtin da ji tirsa bidne banî.

Felek vaye ezê bimrim, ji dinyayê herim zû,
Bi çerxa xwe, bi gera xwe, te daxwaza me nanî.

Cegerxwîno! eger bimrî bi pê te vaye Osman,
Belê ew rêber e îro bi wehya asimanî.



Institut kurde de Paris
~~~~~~~~~~~~~~~~~~~~

## JI HIŞYAR RÊ

Ey Hesen, Yezdan dizanî dûriya te dil me pat,
Bê jmar derd û xeman şîn kir di dil de tirh û kat.

Jan û kul golên mezin berdane ser cobarê dil,
Kaniya êş û xeman îro di dil de bûn Ferat.

Ey Hesen! dijwar e ev rêça ko em tê re diçin,
Em bi dîlî û nezanî vir dixwazin ta Xelat.

Bê nivîsîn û nivişt û xwendinê çon em dijîn,
Serxwebûn kê girtiye bê komel û ceng û civat.

Ey Hesen! hişyr î lakin wek Cegerxwîn dil bi kul,
Her bijîn xortên ko nuh tên ew fîdakarê welat.

———

## JI «Wanî» RE

Peyamek da welatê baniyê min,
Cegerxwîno! bide fermaniyê min.

Ji derdê we dinalim ez şev û roj,
Ziwa bûne li ser we kaniyê min.

Xera bûne ji bo we gund û bajar,
Rez û baẍ û kel û avaniyê min.

Gelo ka ew milûk û şah û siltan,
Gelo ka Guhreş û sasaniyê min.

Gelo ka ew egîd û fêris û mêr,
Gelo ka Ristemê îraniyê min.

Gelo ka ew nigar û neqşê rengîn,
Ji wan bêzar e îro maniyê min.

Du Ehmed, min ji bo we kirne rêber,
Çizîrî yek ewê dî Xaniyê min.

Cegerxwîno! bes e êdî menale,
Ji te xweştir dinalit «Wanî» yê min.

Institut kurde de Paris

## BERSIVA ŞÊXEKÎ

Keyxusrewê xanûman û serayê rengîn,
Pêşrewê bêçaregan û serwerê alê yeqîn.

Her çawan te ferman kir ji devê Ehmedê meb'ûs,
«Ed-dînû en-nesîhetû» guh bide xêzê jêrîn.

Dîn bi zor û zêr e, ne bi sîwak û xişt û tizbî,
Û ne bi kuncê xelwet û teylesan û postneşîn.

Selahedîn ko dinya girti bû bi zor û bi zêr,
Ne şêx bû wek cenabê Qutbidîn û Şemsidîn.

Xebat ji bo dîn û milet wacib e, lê di îro,
Qenc e ko em bimrin, ji bo welatê xwe ê şêrîn.

Alîkî welatê te maye perîşan û bindest,
Li aliyê dinê, talan û kuştin û tim qîrîn.

Çi wijdan e ko em rûnin, bi serbestî û dilxweş,
Lê di ser me re kurd dikin hawar û qîrîn û şîn.

Pir şerm e ko ev rêber û dîndarê wek te îro,
Şwîrê wan sîwak û cenga wan hewqele û yasîn.

Dijmina ji me kuştine hezar begler û paşa,
Birayên me ên kurd mane perîşan û dilxemgîn.

Ka Bedir-Xan paşa, bavê Behrî beg û Têlî beg,
Ka Ibrahîm paşa û Temir paşa Zengozêrîn.

Pîr û kal û keç û xort û şîrmij û zarok kuştin,
Porgijgijî, sergever in, tu li wan dinêrî wek dîn.

Zarokên xwe, ji ber sînga xwe davêjin, ji tirsa,
Baz didin û li wan vedigerin, dil bi kul digirîn.

Li jor balafir û li jêr otmatîk û mîtralyoz,
Dikin qêrîn û dibêjin, haydê lêxin kurd revîn.

Çiqas bêjim bê fêde ye, wek bilûra ber ga,
Ax ji destê we şêx û melan, ez bûm Cegerxwîn.

Institut kurde de Paris

## Bersiva Ebedil-Xaliq Esîrî

*—Bi zarê soranî—*

Ey bira şehbazê ewcê fen û hem irfanî tû,
Sed wekî Ibnil-esîrî gorî û qurbani tû.

Tîrî xweşxwanê te sotan can û dil ey kake xom,
Natiwanim ez xwe ragîrim li ber xweşxwanê tû.

Bax û bistanit xweş in her çonî fermanî kirî,
Cen-netil maway e şaxek ez rez û bistanê tû.

Zab û Dicle rengê Xabûr û Ferat her la diçin,
Abê sûrî û Iraq ez kanî Kurdistanê tû.

Faris û rom û ereb mihtacê dexl û danê min,
Tacirê dinya hemî mihtacê şuxlê Wanî tû.

Dîn û mil-let herdû fewtan kes li wan nabit xwedî,
Hîç le xew hişyarî nabin alim û şêxanê tû.

Daîmen cuhl û nezanî bo xwe isbatî dikin,
Menfiet hîç bo me nadin şêx û mamostanê tû.

Heytewanê mekteba min ger serefrazî bibin,
Dê bijî ew dewleta sasan û hem keyanê tû.

Sed Selahedîn û pêsed wek Ebû-mislim hebin,
Faîde hîç bo me nadin setwet û şahanî tû.

Guft û goyet pir xweş in her çonî fermanit kirî,
Nisbeta arî bes e bo en'en û inwanê tû.

Lazim e em hewl bidin her bo yekîtî kakî xom,
Bextî û zazanê min hem sorî û babanî tû.

Hêvîdar im ko xeta negrin le xweşxwanim çiko,
Ez ne mîdanem bilêm ser şîwe û goranî tû.

Zor seleman ez dixwînim her le ekradê Iraq,
Lacerem dost û heval û hogir û cîranê tû.
Ger meha paîzî paşî bê bi xêr û pir xweşî,
Lê hebin pare le nik min dê bibim mêvanî tû.

Men Cegerxwîn im le derdan lew li min sotaye dil,
Melhema derdî dilê min lawik û heyranê tû.

Institut kurde de Paris

# PÊNCIKA MIN Û ZIBÊRÊ KURD

*— Ji Celadet beg re —*

Ey şehê alîcenab, wey hakim û bextiyarê kurd,
Wey Şerefxanê cihan, wey bingehê hawarê kurd.
Kawisê zêrînkulah, wey Ristemê serkarê kurd,
Serwerê alîcenabê qewmê kurd ẍemxwarê kurd,
Baisê fexrê gerohê miletê xembarê kurd.

Kurd perişan maye îro têk de bûn serqot û rot,
Dijmina ew dane ber hev dil bi ateş wan disot,
Têk li ber topan biriştin kal û xort û bûk û dot,
Ger dipirsî tû li halê miletê meqhûrê xot,
Horî bedbext û xiffet girt û dil hoşarê kurd.

Hakimê çakman ne mawin rû be xakî kirne we,
Dîl û nadanî bi carek kewte nawman çon xew e.
Ger şivan razê bizane bo dizî her dem şev e,
Em kesaney erzel in, îmro be sayey cuhlewe,
Bûn be hik-kam û emîr û axa û serdarê kurd.

Men le xabî zû helistam ev heye deh salê min,
Şêx û momosta bi carek manie eqwalê min,
Dîn le bo xwe kirne alet pê dixwin emwalê min,
Fikrê dînî bûye zehrê qatilê emsalê min,
Boyî paşkewtin le cem'ê serserî û cilxwarê kurd.

Min Cegerxwînê bi şûr im, lê çik im şûr im şika.
Kaniya awa heyatim lê çi kim awem çika,
Rêberê kurd im di îro pêşrewî min mezdika.
Carekî çawit hilêne seyrî ehwalim bika.
Da bizanî boç ẍerîb e le Zibêr sey-yarê kurd.

Institut kurde de Paris

## JI HISÊNÊ EMIN RE

Hisênê Emîn emînê welat,
Ş'êra te xweş e mizgîn û berat.

Pir bi min xweş tê dengê te ê zîz,
Qêrîna quling qebqeba ribat.

Ez mandî ma bûm ji rê derketim,
Lingê min têşa xewa min dihat.

Ez raketî bûm, xew pir şêrîn e,
Riya me dûr e nijadê me tat.

Te dey li min kir, ji xew qevistim,
Serê xwe hilda, roja me hilat.

Tava xwe daye çiyayên bilind,
Tev pê xemilîn, bajar û kelat.

Rengê zêrînî xwe berda welêt,
Sor û zer mane ev zinar û lat.

Ey xortê hêja mizgîn-im li te,
Xweş ber girtiye bexçeyê welat.

Belê demarên tehliyê mane,
Qet şêrîn nabin bê ceng û civat.

Hisênê Emîn, emînê welat,
Te ne hişt razim, xewa min dihat.

Ez bûm cegerxwîn, bê ol û bê dîn,
Li te bî mizgîn, va roja me hat.

Institut kurde de Paris

## JI ŞEWKET ZILFÎ BEG RE

Bes e Şewket ji min çi dikî birayê min tu mîro,
Ezê bimrim ji ber jana evîna dil di îro.

Eger Loqman ji nêv tirban sivik ew bête ser min,
Nehin çare ji bo derdê dilê min ey emîro.

Heger bimrim bi van derdan ne pir şerm e ji bo min,
Heçî kurd in hemî mirdin Cegerxwîno esîro.

# JI MEZINÊN KURDAN RE

Bi navê xwedanê cihan û felek,
Ji bo we nivîsîme ev reşbelek.

Civata belengazê kurdê reben,
Ji bo we gelek ew sipasan dikin.

Çiko hun beg û şah û keyzade ne,
Ji derdê dilê kurdî re çare ne.

Ji bo we felek text e ey merdê çak,
Meger em dirêjin li ser rûyê xak.

Dilên we xweş in hon di xanên belek,
Dirûnin belê dilkul in em gelek.

Vexwarin ji bo we dibit noşî can,
Ji bo me dibit êş û derdê giran.

Berîkên we tê de hene zêrê sor,
Berîkên me tê de hene marê kor.

Hinik rîdîrêjên me kurdan hene,
Neyarên reh û ol û koma me ne.

Çiqas em dikin tiştekî çêbikin,
Ji wan em newêrin ko dest pê bikin.

Çi bedkar û bedgo ne ew der cihan,
Ji destê ewan min diye sed ziyan.

Digel gur dixwin goştê berxê û kar,
Digel min dikêşin hezar ah û zar.

Hewar e ji bo me verêkin hewar,
Ji bo dil bi me xweş nekin ev neyar.

Di îro neyê ger di hana me ew,
Ji çavên me re nîne razan û xew.

Nehin kes wekî me bi hawar û ah,
Çi paşa û axa çi mîr û çi şah.

Bi ah û bi nalîn wekî tûtiya,
Cegerxwîn dinalî li deşt û çiya.



Institut kurde de Paris

ŞIHRÊN FELSEFÎ:

# JÎN

Ey jîn tu çawa derketî rowê zêmîn,
Tu ji kû ve tê, tê bi kû ve herî ey jîn.

Te cihan daye ber xwe ma tu çi dixwazî,
Em û te li pey hev in wek fîl û ferzîn.

Em tune bin tu hêja ye çi ey bextreş,
Hebûn û tunebûn çi ne jîna dîn.

Çi zanim Xwedê tu daye yan te ew,
Hun ji hev nayen zanîn wek sîn û şîn.

Em te dixwazin tu jî me dixwazî,
Em û te, bê hev nabin wek Mem û Zîn.

Ezê çawa ji xwe re laşekî peyda kim,
Dîwar xurt û hundir xweş wek birca şêrîn.

Ez û te, tê de rûnin bê pîvan xweş,
Bê kul û derd û bê keser û bê şîn.

Da em bibênin bextê vê cihana bextreş,
Hela çi dikî ji xort û keç û bûkên narîn.

Wek tolika biharê ye bextê wê,
Wek çeka qelsa ye bê havil û bê tîn.

Neı ez tenê jê digazim lê herkes,
Ji kul û derdên wê bûn wek Cegerxwîn.

Institut kurde de Paris

## AN DIRAV AN DEREW

Ey dil tu giran be, çaxê ko te dî yar,
Beyhûde sivik mebe, li pêşî dildar;
Ew dêmên di geş çavên di reş, kenê di xweş,
Wek aletê sihr in, keçe caziw e seh-har...

Bi lêvan çi got bawer meke ey dil,
Bi çavan çi got, bawer meke ey dil,
Dest li ser gerden û lêv li ser lêv,
Her şev em nebin cot, bawer meke ey dil.

Dost qanî nabî bi xortê bedew,
Barek dirav divê, yan barek derew,
Divê rê de em serxweş û mest in,
Xwedê nenas in, ne ez û ne ew...

Yar dil bi dil nedî, dilketin nabî,
Dilketin çi ye, eger tim bi hîla bî;
Paşiya dilgirtina rût û xwar,
Dê her nexweşî û derd û tabî.

Wek Zînê, dost perdê neçirînî,
Kur wek Mem, laş bê can negerînî,
Çi ye ew evîna ko bext û fersend,
Me her diwa, li Birca-belek necivînî.

Rojî û nimêjê min in keç û can,
Zikrê min xweşxwan, tesbihê min deşnam,
Sazbend Cibrîlê emînê min e, her şev,
Nazil dikî, li ser tûrê dil im, peyxam.

Ger te divê xemxwar nebî, ey xort,
Dilê serxweş bêzar nebî ey xort,
Ji destê madamê, medamê binoş,
Ta di heşrê rûsar nebî ey xort...

Li meyxanê rûne, çi ye mizgeft û dêr,
Xirqe rehîn dîne; te çi hacet zêr,
Bila digel Nemrûd em herin dojeh,
Çi bikin ji bihuşta kerê nebî Izêr?



Institut kurde de Paris

Qedehek ava şêrîn vexwe a bin-den,
Xirqe li xwe ke, û li ser girêde ben,
Sazbend ê dengxweş werîne meydan,
Li sazbend qîr û bi rûperiyê tim ken . .

Şev qet bê sazbend û cam û dêmdur nabî,
Li civatê saz nebi, dê qiyamet rabî,
Ko seyda gazî kir « Hey-elel-felah »
Tu bê na ! na ! « Heye-elel-şerabî » .

Min dêr û miyzgeft navên û min navê kenişt,
Min hûr û peri navên û min navê bihuşt,
Li ser pira siratê naçim, ma qey ez dîn im;
Ne derwêş û şêx im, li xwe naxim xişt.

Perda şermê ji ser rûyê xwe bavê,
Cama meya sade vexwe wek avê,
Ji Xwedê bitirse lê serbest bêje,
Cam û keç para min û bihuşt min navê.

Dîndar mebe, serxweş bibe wek dîn,
Can erzan mefroşe, ne stêle ye ev jîn,
Li kunca meyxanê rûne, ta bi êvar,
Ser bitewê ber nigê şêrîn û mebe xemgîn. .

Ji meyê vexwe ava rezê kerkûş,
Li ser masê deyne şaş û hem terbûş,
Ta jîndarê serbest bijî wek min,
Jîna bindestî ne hêja ye du qirûş . .

Sipîdê serxweş rûne, ta bi êvar,
Guh bide sazbend û dil bide dildar;
Ev cihana xwar û dêl û tol,
Wek tiyatro ye ji kesî re nabî yar.

Jîn sê par in, biçûkî û kalî û bengî,
Ta ko biçûkî nezan û bêdeng î,
Kalîtî bi xwe mirin e ey dost,
Bengîtî çend sal in, hin xweşî û hin tengî.



Institut kurde de Paris

Ev cihana pîs û bêmerês e ko em tê,
Wek me gelek gernas çûne vê semtê,
Ev jîna ko em dibênin bê ser û bin,
Çi dirêj û çi kin, li pey mirin tim tê...

Li dinê, çi ne qanûn û nîzam û dîn,
Mizgeft û kenişt û sebt û lehd û în,
Mihemed û Îsa û Mûsa û Zeradeş,
Derbas bûn û em li pê wan bûn cegerxwîn...

## AX PERE

Ey «pere» ka tu li kû maye were,
Me ji bona te di dil de keder e.
Dilbijokê te me ez, her şev û roj,
Çi dibî ko te bibînim ji xwe re?

Carekê min tu diye sor û sipî,
Hê ji tava te ye dil, sor û zer e.
Dûriya te sotiye kîs û berîk,
Destê min maye çikûs, çav li der e.

Tu nebî kî heye, yek hilmê bijî,
Çi geda û çi şehînşah û ser e...
Şev û rojan, hemî kes kar û xebat,
Ji berê ve dikitin her ji te re.

Xaniyê ko tu hebî tê de bihuşt,
Ê nebî tê de wekî koxê ker e.
Te dixwazim, ne ji bo xwe bi Xwedê,
Lê ji bo jîna welêt bête bere.

Lê nizanim bi te ye yan bi Xwedê,
Ji nebûnê hemî tişt hate der e.
Ne ji te, ne ji Xwedê hêç me ne dî,
Arîkarî ji welat û ji me re...

Institut kurde de Paris

## Ez Im Pîrê Mixan

Ez im pîrê mixan îro tu guh-dêre li tefsîlê,
Çi kim îro bi tewrat û bi firqan û bi încîlê.

Ne Mûsa ma, ne Îsa ma, ne zardeşt û ne Taha ma,
Kufir nîne di vê wextê bi hikmê serf û tehwîlê.

Nehin pêşî, nehin paşî, hudûs û hem qidem kanî,
Ji alem ra nehin şahid, bi tesrîf û bi tebdîlê.

Kî ye xaliq, kî ye raziq, kî ye mabûd, kî ye meşhûd.
Du sed roh-el-qudis bêtin ji şekê nayê tebdîlê.

Eger raziq hebî kengî belengazî dibî peyda,
Tebîet xaliqê rohê micesem nûrê qendîlê.

Bes e ey alimê nazan temaşa nakî dinyayê ?
Bi vê gerê bi vê dewrê bi vê teswîr û temsîlê.,

Çi tiştê ko esil nîne çima pir jê xeberdar î,
Tu vî tiştî qe nas nakî bi tekrar û bi tehsîlê.

Hemî alem ji yek niqtê miheqeq aferîn bûye,
Kî ye kafir, kî ye mu'min serapa hikmê tedlîlê.
Bizane ew demên borî heta îro cehenem bû,
Eger bighên Merîxê ew bihuşt e mezhebê «qîlê».

Wekî min gotine Pîrê Cizîr û Hafizê Şîraz,
Serîhê wan temaşa ke meke bawer bi tê'wîlê.

Cegerxwîn bû ji ber derda me dîn û hem cihan berda,
Nikarim ez yekê bigrim bi tercîh û bi tevdîlê...



Institut kurde de Paris

## KERÊ REŞ

Di bihara sala par,
Min dî kerek qut û kem,
Bê hesar û bê sergoş,
Bi zirzir û qoreqor,
Min rahişte gulek geş,
Ne bîn kir û ne jî xwar,
Ez daketim devê çem,
Min tev li ber kirin kom,
Wî ew qîfar û kelbeş,
Piştî ko xwar kat û rot,
Ey seydayê Cegerxwîn,
Tu zanî meqseda min,
Ma tu kurd û Kurdistan,
Ger tu dibî Yezdê Gurd,
Salê carek tê bihar,
Dixwim vê kelbeşa xweş,
Evqas sal û demê çûn,
Perîşan û dilbirîn,

Ro di esrê çû bû xwar.
Diçêriya li ber çem.
Min ban kirê kero şoş.
Ji çem derket hate jor.
Da ber pozê kerê reş.
Keser vedan go qîfar.
Min jê çinîn çend kelem.
Çi kelbeş û çi geysom.
Bi keftikan xwarin xweş.
Li min nirî kerê got:
Tu wer maye dilo dîn.
Çima ew gul te da min.
Didî bi sed Hindistan.
Her tê bibê eman kurd.
Li ber pozê min qîfar.
Ez dê çikim gula geş.
Carek ne dî serxwebûn.
Navê te bû Cegerxwîn.

## ERÊ XUŞKÊ

Bê bend û zincîr tu tê girêdan,
Bi her sê pirsan tu tête berdan.

Tu me neh mehan çawa hildigrî,
Kê dirist kirye ji bo me lêdan.

Te ji sînga xwe em afirandin,
Em bê te îro çêdikin insan.

Zardeşt û Mûsa, Taha û Îsa,
Tu bin dest hiştin, kirin perîşan.

Minê doza te ji wan bigirta,
Lê tev winda nebin erd û ezman.

Cegerxwîn her kes wek hev dibênî,
Rastgo ye Seyda, paqij e wijdan.

Institut kurde de Paris

# HERFÊN NÛ

Min ji Ehreman dipirsî bûye serma gotî a,
Wê li zozanê me rengîn xweş dibarin berf û ba.

Kesk û şîn tev hate kuştin pel ji daran tev weşîn,
Ba û bahos tev weşandin dar û ber hişk bûn du pa.

Ehremen Yezdan û Hurmiz her sê navê min hene,
Wer bizane ey Cegerxwîn ez cihangîr û Xweda.

Leşkerê min pir giran e ez ji zozana ve têm,
Ey Cegerxwîn wer temaşa an kuca ye în kuca.

Berf û zîpik tev helandin ba û baran hate ser,
Van newalan kirne xum-xum co û çem robar û ça.

Girtine min deşt û zozan hov û tilor mane jar,
Ketne bin axê ji tirsa min cinawir ejdeha.

Ev mirovên mêr û gernas ketne hundir dil bi tirs,
Agirê zerdeştperest in tûz û reng çûne ji wan.

Xaniyê kurdên te tev de van dilopan nirçe nirç,
Ey Cegerxwîn wer binêre av di jorê wan de za.

Kurd nezan e wek şivan e, tim perîşan û reben,
Ev welat e bê xebat e tim xezanî lê rija.

Ev mirovên çax û benga te li te qerfa dikin,
Tu bi xwe firdewsê kurdî em dibênin wek ciha.

Ev çi ye pirsê tu her dem her ji Kurdistan dikî,
Carekê pirsê tu nakî qet ji wan biskên du ta.

Pir hene xweşxwan dibêjin lê ji bo dîlber dibên,
Bes tu xweşxwanan dibêjî her li ser deşt û çiya.

Rast e seyda ev çiya û deşt û zozan pir xweş in,
Her binale ka xweşî û ka geşî û ka û ka.

Institut kurde de Paris

Mêr û gernas tê ne mane, şêr û ejder jê revîn,
Rovî û keftar dilîzin bore bore hirç û ga.

Bêje kurdan tev de rabin em biran e tev de mêr,
Xwe di rexta de bipêçin sîne bidine ber gula.

Serbilind bimrin we yaxud ser bi xwe dê em bijîn,
Hon ji bo vê rojê zane haydê êrîş kes ne ma.

Ez cihangîr im dikarim zû cihan wêran bikim,
Ez di xurta de çi xurt im, dijmin im bo rebena.

Ez di merda de çi merd im, ez di mêran de egîd,
Ez di qelsa de çi qels im, ez di kêman de wisa.

Ez di dil nerma de nerm im ez di dil hişka de hişk,
Ne ditirsim ne dipirsim ho venadim ez di a.

Yek tenê baz e çeleng e, ew li bala ser bi xwe,
Ew dixwî bacê ji hov û xulxul û kewt û refa.

Şah çima şah e di bin re sed hezar leşker heye,
Ma ji bo çi lê dirist e kuştin û xwîna teva.

Dewlemend bo çi du milyon zîv û zêrên wî hene,
Wan belengazan ji bo çi xwe sipartin xaneqa.

Dê çilo zengîn bibî ê ko du sed bacê bidî,
Ê nezan bî, dê çilo rûnî li eywan û sera.

Ê ko li Ewropa xwendî dê çi lo parsê bikî,
Ê li pey gayê belek bî nabî carek mîr û şa.

Institut Kurde de Paris

## JI KEYO RE

Li dinyayê temaşa ke kurê min,
Tu dê paşê binasî, xweş bibênî.
Li jorê kumbedê gerdûne Seyda,
Li jêrê xwe hemî tiştî dibênî.

Tu daxwaza dilê min qet nizanî,
Heta perdê ji ber xwe hilneyênî.
Hemî kes dilbijokê kerş û toz e,
Nikarê gewherê paqij derênî.

Dibênim talibê dinya hemal e,
Dixwazî wê li pey xwe rakişênî.
Xelet çûye mirovê zêr û gewher,
Di pêsîra kerê reş daleqênî.

Mirovên zane û hêja li cem me,
Wekî gewher di sergo de hilênî.
Gelek jar û pêrîşan û belengaz,
Heta dimrî tenê navek dimînî.

Cegerxwîn destê rastî girt û kêşa,
Dixwazî ko ji pişt perdê derênî.

---

## DINYA TEQREQ E

Wa diyare darê dinya giş cefa û teq-req e,
Ew kesê gavek bi pêş de ko herê ma ew deq e.

Dûrnebîn e, rengê dîn e, mamegurg e dil bi tirs,
Pê bi pê ew pê de tê, lê ew nizanî ko feq e.

Ger li aşî guh bidêrî çerxê gerdûn tête bîr,
Ê nezan qet nabihîzî xeyrî deng û çeq-çeq e.

Bingehê vê alemê niqtek ji gola qudret e,
Heykela candariyê rengê diranî tim leq e.

Ev cefaya ko me dî hêj kêm e lê bêtir divê,
Wek seq li gora wî heq e, heq jî li gora wî seq e.

Vî zemanî her kesek sermaye da hev tev derew,
Ey Cegerxwîn rast dibêjî lê tukes nabê heq e.



Institut kurde de Paris

## EHREMEN Û HURMIZ

Dûkel ji golan radibî û li jor digrî rav,
Ba wê dibî û tênî, li banî dikî ewrav.

Deng ji ewran tê û birûsk dikin qîrîn,
Bapeşk davêjî û tavan dikî nalîn.

Geh baran tê û geh teyrok bi rep-rep,
Ba berfê davêjî geh rast û geh çep.

Rengê zeviyê bi spî tê guhartin,
Xaçerê û şeverê têne girtin.

Bi zorçone, ji banî ve tim tê serm,
Bi paş ve direvî û ji ber dişkê germ.

Serma warê germê wer dikî kambax,
Germ, bar dikî, direvî dikevî bin ax.

Serma bi bager û bahos û pûk û zîp,
Şînahî dikujî, dimênin kelem û xîp.

Sînga zeviyê diçirî li bin dibî pingav,
Zevî dirixunî dibî teqan û çirav.

Serma şînahî dikujî, lê di rehan de germ,
Wa hişkedara ji nû dikî nerm.

Berf li çiya dikî wenda dibin ber û dar,
Baran li berfê dixî diherikin rûbar.

Xumîn bi çeman dikevì, newal bi nalnal,
Wenda dibin navrok û pir û berpal.

Xwe bi axê şêlo dikî, xwe dikî wek zêr,
Bi lez ji banî ve tê, bi bez diçî ber jêr.

Bayê kur tê dikî qîr qîr û dikî fîz-fîz,
Zemberîk bi daran ve dirêj dibin wek hîz.

Ne gul di baxa de dimînin û ne beybûn.
Tilûr û hov û mirov dimînin bê gûn.

Sê meh serma dibî serdar û xunkarê cihan,
Kurdan navê wan mehan kiriyê Zivistan.

Serê Biharê ye, roja pêşîn e Nûrûz,
Cejna kurda ye her dem dibî pîrûz.



Institut kurde de Paris

Germ karê xwe dikî, bi leşker û top û tifeng,
Tê ser sermayê bi talan û kuştin û ceng.

Geh leşkerê Ehremen xurt e û geh Hurmiz,
Şîn dibin gul û giya kulîlk û nêrgiz.

Serma dişkê û germ her didî ser,
Xwe li çiya digrî wek leşkerê Hîtler.

Koçer bar dikin, bi rê dikevin, diçin konan,
Kalîn dikevî pez, û şêhîn dikevî hespan.

Li çiya dibî şêrîn û qebqeba kewê nêr,
Candar tev dikin pesnê Hurmizê camêr.

Şingşing ji ewran tê û dibarî baran,
Keskesor çêdibî û diferikî tavan.

Kanî dizên û diherikin co û cobar,
Şîn dibin lal û çîçek û sinem û gulzar.

Sinbil dirêj dibî herwekî şaxê Ristem,
Cotar dibî camêr û her kes dibî Hatem.

Hurmiz xwe digîne çiya û Ehremen direvî,
Ji nû şîn dibî giya û dibişkivî devî.

Ji ewram kêm dibî ew req-req û ew deng,
Zevî reng dibî bi sed hezar reng.

Bayê kur, ji kul û derdê Biharê dimirî,
Bayê rojava tê û li deşta dadimezrî.

Navê van her sê mehan, kurdan kirne Bihar,
Ehremen dişkê û Hurmiz dibî serdar.

Lê sê meh ji paş ve, tên ji wan re dibên Havîn,
Ehremen direvî ji rûyê welat û zemîn.

Hurmiz dibî serdar, cihan tev dixî bin dest,
Ehremen û leşkerê xwe, tev perîşan û sermest.

Germ xwe li çiya dixî zevî dibî agir,
Hin şênayî hişk dikî çi hûr û çi gir.

Giya hişk dibî, dibî dasî û pelax,
Kanî û newal, ziwa dibin dibin ax.

Ji deştan kulîlk diçin, dimînin tûm û qorat,
Li çiya hin şînî dimînin, hin tirbik û hin kat.

Institut kurde de Paris

Mêwe li çolê dimînî, hin bexçe û hin gwîz,
Ev çend roj diçin, bi pê ve tê Paîz.

Paîz e, Ehremen gazî dikî leşker,
Bayê reş xwe jê re dikî rêber.

Serma ranawestî dîsa dikî giz-giz,
Leşkerê xwe dîsa dişînî ser leşkerê Hurmiz.

Hurmiz direvî û Ehremen didî dûv,
Beyar namînin, giş dibin xubarî û şûv.

Rengê zeviyê dimînî reş û zer û gewr,
Dîsa ji banî ve, bi him-him, tên ewr.

Germ baz didî û serma didî pey,
Ba li daran dixin, dihêjin wek ney.

Ji van her sê mehan dibêjin xezan,
Ne Hurmiz dibî Yezd û ne Ehremen dibî Yezdan.

Ji ber Ehremen û Hurmiz zevî dibî dojeh,
Bihuşt stêra Merîx e yan qurix e, yan meh.

Bê ziman û xwendin kurd maye bê zanîn,
Guh nadin te, ey seydayê Cegerxwîn.

---

## DINYA NE HÊJA YE

Emrê min çû bi xiyala emrê xeyamî telef,
Can ko yek bit ferqê nîne çi selef bit çi xelef.

Durê nasufte dibênim pak e ew her dem û gav,
Zaneyek qet îtibarê nake carek bi sedef.

Fabrîka dinya dibînim xalîça rengîn birî,
Meqlebê dewranê emr-im wa li xwe pêça kelef.

Xelkê ev dinya dibînim warisê qarûn e tev,
Sed şikir men warisê Xeyam û pir şan û şeref.

Qedrê xweşxwan im çi zanin alê dinya tev nexweş,
Gewherê şêrên di min kes nakirî ya lil-esef.

Ko Çegerxwîn tête bajêr xelkê sûkê hûr û gir,
Hin ji vir de hin ji wir de, tên temaşa sef bi sef.

## MIRÎ DIMRÎ JI NÛ VE ŞÊRÎN DIBÎ

Kelaşekî hişk, bê deng û reng û bê jîn,
Di nav nivîna de, gundî li ser dikin şîn.

Bêzar û dîtin û bihîstin û bê tevger,
Zerî û çavbelek, li ser xweş digirîn.

Pîrê avê germ dikî û qerqer dipîvî,
Seyda û suxte li ser dixwînin yasîn.

Dê û bav gazî dikin: ciwano, lawo!
Û bira dibêjî: Keko! û zarok dikin qîrîn.

Bersiva wan nadî, ev miriyê canbêzar,
Ji xwe nizanin, li ser çi digrîn wek dîn.

Bêr û bivir, bi destê wan, gora teng,
Dikolin, wek dojeh, li jêrê zemîn.

Li ser tenişta rastê datênin ber bi jêr,
Li mişk û mara dibî dabaş û mizgîn.

Axê davêjin ser û li ser kevir û şel,
Seyda hê ji nû ve lê dixwîne telqîn.

Çima di nav nivîna de te li ser ne dixwend,
Li vir raweste ey seydayê Çegerxwîn..

Institut kurde de Paris

*ŞIHRÊN EVÎNDARIYÊ:*

## Bi dil herkes Gunehkar e

Ji tîrê her du ebrûyan me dil her qîr û aman e,
Ji ber wan tîpê zilfê reş dilê min tev kul û jan e.

Bi topê jermenê çava me dil her dem birîndar e,
Bi dîlî, ma di bendê de bi rengê Sirp û Yewnan e.

Tu zanî dil birîndar e ji tangê zilfê reş tarî,
Ji wan lêvên şeker barîn dizanî maçe derman e.

Tu guh med gotinê dînan were da maseyê deynin,
Ji her rengî meyê fir kin dirist kir pîrê meyxane.

Bihayê yek qedeh ava lebê le'la bidim carek,
Bihuşt û agir û ezman li cem dil hê çi arzan e.

Eger wek min evîndar î, kerem ke qehweya Kerbîs,
Di locê de me nabînin ne Agop û ne Dikran e.

Evîndaran guneh nîne wisa ferman kirî Zerdeşt,
Bi dil herkes gunehkar e bi dev herkes misilman e.

Di bajarê evînê bes Cegerxwîn şah û xunkar e,
Evîndara bi dest ala li ser taca me hildane.

Institut kurde de Paris

## Xanimekî Ciwan

*— Bi zarê sorî —*

Ey xanimekem fermû were hucrê mutala,
Da şerhê bikim bo te evan fikr û xiyala.

Destên te bi destim li derê qesrê wizaret,
Alem civiya ref ref e ser tacê me ala.

Em leşkerê ko destî li ser darê tifing e,
Ew resmê selam bo me dikî her dem û sala.

Pêçawe li ser çerxê dîreksonê teyarem,
Destên te ê nazik ko birim ewceyê bala.

Ger ser xwe nejîn xanimekem pûç e xeyalem,
Bê ceng û edeb marûzekem hîç û betala.

Em hucreyekem bo te wekî xwendegeha kurd,
Şeb ta bi şebê dersî didim eynî meala.

Ger şuhretê dawe ke Cegerxwîn û ciwan im,
Bûm serwerê kala, bi xwe dilgirtiyê nala.

## JI DESTÊ YAR

Dîlber me dî sehergeh têsî ji rengê camê,
Ebrûhilal û rûmah qend û şeker kelamê.

Serpêçî rengê mûmê şîrînken û şekerlêv,
Delal û şeng û şox e, nazdar û meşxeramê.

Remzek ji gohê ebrû da dil digo celad e,
Paşê bi irf û adet girtim bi zilf û damê.

Hadir me gotî bil-lah dil nîne qet tehemil,
Kîjon can ji dest xwe bavê ranagirit meqamê.

Bi abê herdu çavan nagah me dest nimêj girt,
Carek di ber tewafê, dest kir bi istîlamê.

Camek ji abê le'lan da min û go Çegerxwîn,
Destûr ji bo te rabe binoşe vê medamê.

Institut kurde de Paris

## GEWRÊ

Ĥebîba min delal û naz û rind û gewr û pir qenc e,
Birû mah û şekerxend û dev û lêv herwekî ẍunce,
Di nêv baẍê ciwanî de bi xwe Xurşîdê deh birc e,
Ferişt û xweş perîzad e şepal û dîlber û gurc e,
Ji wan birhên ziravik min di dil da sed hezar senc e.

Bes e dîsa li min xeşmê meke ey Ristem û Xesro,
Çelemçîtê digel şarê bide ber goşeyê ebro,
Digel taca xo ya zêrîn were nik min tenê yek ro,
Bi me hişyar meke dilber ne Zeyd û Xalid û Emro,
Tu zanî ko ji te dûrî bi min jehra reş û benc e.

Ji ser dêmê xwe rake perdeyê da ez mînewer bim,
Bi gulav û bi ûd û enber û miskê miet-tir bim,
Ji rista zêr û yaqutan seraser têk bi cewher bim,
Cegerxwîn bû bes'e belkî bi bedgoyan mizef-fer bim,
Du sed rengê Bekir min dîn di lîz û bend û setrenc e.

## Çavbelekê

Tu zanî ey hebîba çavbelek min dil hemî derd e,
Ji benda zilfê reş-tûzî esîrê xo demek berde.

Li heyva çordehê îro, li ber paçê dinêrim ez,
Ji ser wechê xwe rake ey hebîba çavbelek perde.

Li min perde hilanî zû, di nav şewqê de wenda bûm,
Me sejde birye ber bejnê, miqedes kir li min erd e.

Ji remza bazinê zenda ji gustîla te ya zêrîn,
Me zanî ko şehê rindan, ji bona min gelek merd e.

Bi wan remzan işaret kir, bi zilfan dil me ẍaret kir,
Me zanî dil xesaret kir ko biskan lê kirin cerd e.

Cegerxwîn dil birîndar e, li ber pacê dinalî xweş,
Ji te maçek dixwazî, da di gorê de nebî derd e.



Institut kurde de Paris

## KEÇ

Kes dosta megirin ji bil dosta keç,
Firqan û Tewrat û Avêsta keç.

Sed remz û ayat û îşarat in,
Girêbend û derzî û rista keç.

Heyva li çarde keç û Zehra keç,
Meya rez keç û cama mesta keç.

Çen û lêv û çavê reş û ebrû,
Aletê sihr in belê hosta keç.

Sînem û Zîn û Xec û Şîrîn keç,
Sed xwezî bi wî kete desta keç.

Feleka etles kemer û jîna cîhan qulp,
Bi desta li bejna xwe besta keç.

Xeftanekî sayî bi xwe ew roj,
Li xwe rapêça û rawesta keç.

Dinya hejiya û tev li hev ket,
Gava ko bi nazdarî hesta keç.

Cegerxwîn dîn e gavanê hirça,
Bî kir dost û da gurperesta keç.

Institut kurde de Paris

---

## Perîzade

Perîzade bi meş hatî, senoberbejn û bala ye,
Li ser çavê me xweş hatî, bi ehla û bi sehla ye.

Me destê toqeyê da hev, ji min dil xwest û gul da min,
Li min ronî dibû ew şev, bi şewqa dêm û xala ye.

Li min ew der dibû rewşen, li min şîn bûn gul û reyhen,
Şeker barî, bi guft û ken, ji abê lêvê lala ye.

Me noşî şerbeta lêvan, şeraba hunguv û sêvan,
Me jîn daye, bi dest Zînê cehenem şarê ala ye.

Di eşqê Ristemê kurd im, cihangir im çi xweş merd im,
Li ber te bê çek û gurd im, Cegerxwîn deste vala ye.

# EZ Û BILBIL

Dilo rabe bes e ev nal û zarî,
Li x̆unce w' sorgulan şebnem dibarî.

Binêre wa di xew da maye bilbil,
Wekî min ew bi yarê nake yarî.

Evîndar e ne wek min dilbirîn e,
Di bax̆an de dikî herdem guzarî.

Li bin dar û li ber wî royê dildar,
Çiman ew her bi ah û nal û zarî.

Ne yek lê sed hezar sorgul di himbêz,
Ji dinîtî dikalî geh diqarî.

Tenê carek wekî bilbil digel gul,
Ez û yarê di çend rojê biharî.

Diçin geşt û guzarê ber çem û deşt,
Geya xalîçe bû çadir xumarî.

Qedeh lêv û meya tê avê şêrîn,
Du sêvên sor xelatî bûn diyarî.

Li ser sîngê dibûn destê me gerson,
Dîdin alî ji ser zêr û mirarî.

Bi şev hîv û hevala min dibûn yek,
Kirin ronî li banî hem li xwarî.

Tenê dil bû bi çavên reş re dijmin,
Bi wan çavên di reş ma kî dikarî?

Li bejnê zend û bendem bûne kember,
Me kir talan bi şadî irqê arî.

Ji destê min nikarî xwe derînî,
Xwedê jî bête arî qet nikarî.

Nema êdî dirêjim hêstirê sor,
Wekî bilbil ji bo yarê tucarî.

Heta dimrim bi dilşadî bi ken bim,
Çi kim Şêrîn û Zîn û Da'd û Marî.

Di dil de her dimînî ev şeva xweş,
Heta bimrî Cegerxwînê hasarî.

Institut kurde de Paris

## DILBERÊN CENGÊ

Her du ebrûyê te canan qîblegah û camî ye,
Ê li dor ke'bê diçîtê vajî ma ew hacî ye.

Xoceyê xidrî xelet çû kaniya ava heyat,
Lêvê le'lê te'y şeker-rêz bê guman ew kanî ye.

Dêm û gerden mishefa xal û xetan xwendim seher,
Sîne wek Zend û Avesta xetê sansekrîtî ye.

Bejn û bala maneya şi'ir û riwayet dane pêş,
Dîden û dîdarê yarem ateşê îranî ye.

Awirên keç leşkerê sor tîpê zilfan tang û top,
Aniya keç xetê ceng e, lê Sitalîn daniye.

Leşkerê fikr û xeyalan ceyşê heştê Îngilîz,
Ber bi Roma tim êrîş e, şerker û pir xazî ye.

Dil Digol e nabî carek ew ji doza xwe vebî,
Ta di Paris de nemînî yek ji xortê nazî ye.

Rengê Kayşek pir inad e bostekê nadî ji Çîn,
Bê şer û talan û ceng japon ji desta pir diye.

Nameya Rozwelt û Çorçil sozê lêvê tey şîrîn,
Ez perîşan kurd û dîl im, min ji te pir hêvî ye.

Can û dil bîr û hişim wan sond bi hev ra xwarine,
Doz û daxwaz kuştina vî hikmê dîktatorî ye.

Rengê Hîtler wa te milkê dil ji min kir ihtîlal,
Wa Cegerxwîn çenteyê xwe wî bi desta girtiye.

Institut kurde de Paris

## Daye derê Evînê ye

Me daye şande nêv Birca-Belek da ew keçê bîne,
Li min xanî dibû zîndan me can rêkir sera Zîn e.

Ko sawîrek li ber dertê dil-im ·bawer dikî keç hat,
Evînê ez hilavêtim li dil bû heyhey û şîn e.

Bi min şev bûye sed sale ji nû keç tê civanê min,
Digel wê daye nazik tê, me can mijde sivik tîne.

Li min ew şev dibû ronî û loksa dil ji nû vêket,
Ko can bû peykê mizgînê, me ew daye di mizgîn e.

Li ber dermame nobetdar, me dî nagah li dergeh dan,
Me resm û pate avêtin ji bo Keyxusrewa jîne.

Me destê toqeyê dan hev pirêzante kirim daye,
Li min nêrî bi çavên reş kenî go: ho Cegerxwîn e!..

Ji nû ve ez kirim himbêz bi şiranî bi dilşadî,
Dilê ko xerqeyê xem bû, ji nişka ve giha mîna.

Bi daye keç kenî û min temaşa kir li bejna wê,
Di mizgînê diçin hor û fereşt û Zîn û Şîrîn e.

Ji ber min perdeya şermê hilanî û veda destûr,
Me kirne yaxme û talan birû, dêm û leb û sîne.

Di sîng û gerdena dîlber me dîn resmên piling û şêr,
Ko neqşê Maniyê neq-qaş bi wan deng daye Maçîn e.

Me xew daye bi sehra meyxwiran û abidê kuncan,
Keçê zor da ken û şadî, me dil her ah û nalîn e.

Keçê rixset ji min xwest û me dil hê jî dikir qêrîn,
Çegerxwîno eger dîlber herî ez dê bibim dîn e.

Institut kurde de Paris

## GULFIROŞ

Ez ji xew rabûm, gulfiroşek dî,
Pir gelek şa bûm, gul bi dil didî.
Gul bi dil didî.

Hebû me yek dil, tev jan û kul bû,
Ne bûme bawer, gul bi dil bidî.
Gul bi dil bidî.

Bazar me kir go, ser bi ser nadim,
Ê gulperest bî, can û dil didî,
Can û dil didî.

Min go kî didî, can û dil bi gul,
Go ev bazar e, dil bi kul didî.
Dil bi kul didî.

Min can û dil dan, dil kiriye qêrîn,
Go ho Cegerxwîn, dil bi gul didî.
Dil bi gul didî.

## ÇI YE DERMANÊ DILÊ MIN

Di welatê te de dîlber wekî ba ez digerim,
Li sera û der û xan û kelehan ez dinerim.

Axê dergahê kelatê te dibosim bi leban,
Ew e dermanê dilê min xweş dibit pê ceger im.

Ji cihan min tiwî daxwaz û tu armanca min î,
Ji evîna te ye dîlber têne dil sed keser-im.

Çi dibî ko me vexwînî ji du salan demekê,
Ko bibênim te bi çeng û per û bazik difirim.

Ji du ebrûyê te cana têne dil xencer û tîr,
Ji ser enguştê me xanim biwe xwîn ta bi ser im.

Ger dixwazî tu Cegerxwîn bikujî lê ne bi şûr,
Bi du lêvên şekerî bêje bimir ez dimirim.



Institut kurde de Paris

## Wek Siyamed

Şahê xoban dil ji min bir mame ez tev derd û xem,
Wek Siyamed çûn di pişta min de sed xîp û kelem.

Ger li min xeşmê dikî carek heye litfê bikî,
Her ji karê padîşahan xeşm e geh litf û kerem.

Dîlbera min bes ne şah e lê şehînşaha cihan,
Padîşaha textê Kurdistan û Îran û Ecem,

Min sibê dî ew ji bircê hate eywana bilind,
Tebl û saz û xweşnewaz û şadiman û pir heşem.

Nagihan ez çûm ji der de merheba got û kenî,
Wey li ser çavê me hatî ey hevalê mihteşem.

Min digel wê kir telet-tif ta ji min kir yek sual,
Go: Cegerxwîn dil çilo ye? Min digo, derd û elem.

## ÇAVREŞA MIN

Şîrîn e çavreşa min, gelek delal e dîlber,
Ya Reb çi şox û şeng e, ciwan û rind û nûber.

Narîn û bînxweş û geş, qibla me aşiqan e,
Letîf û zehre-sîma şepal e wek gula zer.

Sîne çi gewr û boz e berdane ser du fincan,
Sed heyf û sed mexabin destên çepel herin ser.

Çen gewher û diran-zêr şekir ji dev dibarî,
Di guh de zerguhar in, gerden belor û mermer.

Çavên nekilkirî, reş xweya ye poz bilind e,
Rû pût û lat û mabûd zilfên siyah du ejder.

Qews û qezeh du ebrû bisk û kezî ji maran,
Runiştî textê Dara taca keyan li ser ser.

Bi Ehremen nizanim, pesnê wê ez çi bêjim,
Pûtxane bû ji bo min, min ser keşî li hember.

Yarê te ez Cegerxwîn, bêdîn kirim, kirim dîn,
Miftî ez im di eşqê, rabe bikuj bi xencer.

Institut kurde de Paris

# ÊRÎŞ

Cana tu bi xwe qaid û serleşkerê jermen
Êrîş e li Polon.
Awir bi xwe topên ko li ser sahilê Manş in
Min dil biwe London.

Min quwet û canê xwe hemî kiriye fîdakar
Wek leşkerê Holend.
Min tac û sera hiştine bo dijminê xwînxwar
Bûm hemdemê Hakon.

Dil jar û esîr e bi xwe pir maye perîşan
Wek leşkerê Belçîk.
Bê sûc û guneh xeşmê dikî tu li esîran
Ka mezhebê Mason!..

Ew sûc û xetayên ko di Lozan de te dîne
Imzayê me nîne,
Imzayê Liwîd Corc û Kilêmenso û Wîlson
Pey weq'eyê Verdon.

Ew tabiyeyên zilfê di reş tîpê mekanîk
Êrîş dibirin dil.
Çi bikim ko nema fêde dikî bome hiyadî
Bê fêde ye pardon.

Ma şerm e ji bo min ko çek û darê xwe deynim
Rûnim bi esîrî,
Pir mîr û milûkên ko te dîl kirne dibînim
Wek rencber û garson.

Der mehfelê işqê çi ser û şah û emîr im
Sed sale esîr im.
Wek kurdê di lora û di baba û di Sason
Seydayê Cegerxon.

Institut kurde de Paris

## REŞ MEPOŞE

*— Bi zarê sorî —*

Tu Xwa ey şahê Xesro reş neposî,
Reşî poşîn nîşanê xwînfirosî.
Le wan çawên belek bo min diyare,
Ke tû xoşî be min ya Xwa nexoş î.

Emin noşîm le abî le'lê lêwit,
Etû xûnî dilem bo çi enoşî?
Be laşem a'eşî berda serapa,
Ke fermîskî du çawem hel ecoşî.

Be gorî modeyê tu kewnê kurd im,
Be tacê zêr û çar û şar û boşî.
Cegerxwînim bihayê maçî lêwit,
Dil û can û ser û pa dem bi xoşî.

---

## ŞEVA QEDRÊ

Şeva Qedrê li min rewşen dikir şewq û şemala keç,
Li min xanî dibû gulşen bi wê hisn û cemala keç.

Berî dînê çi Ristem bûm, bi dînê dîn kirm dîlber,
Vejandim ez fîraqa keç, pijandim ez wîsala keç.

Di xweşxwanê cihangîr bûm, li ser textê suxen mîr bûm,
Şeva dînê kirim lal û ji hiş xistim peyala keç.

Me dî lê ez neşim bêjim ji pesnê dîlberê mûyek,
Dizanim bes şeha rind û perîzad e delala keç.

Ne bûne, nabitin carek di semta mareza rindan,
Bi dîdarî bi nazdarî bi dildarî hevala keç.

Li ber masa sedef rûnişt du mihwer bûne yek dîsa,
Ji meydanê ketim carek bi tenha ma xiyala keç.

Şikandî leşkerê firset welatê dil giha dîlber,
Cegerxwîn ma di bendê de digel fikr û mitala keç.



Institut kurde de Paris

## WERE YARÊ

Were yarê hilî çarê ji neçarê meke bas,
Guh bidêre tu li zarê ji nizarê meke bas,
Were ser vê çil û çarê tu ji sê sed û hezarê meke bas,
Tu ji gulzarê gulê bîne ji xarê meke bas,
Tu peyalê bide yarê ji xisarê meke bas.

Tu kerem ke were bê perde di wextê seherê,
Durê nasufte bibarîne ji xwe lêv şekerê,
Bide teqrîr û beyanê bi fesahet xeberê,
Dilê bêçare ji derdan mexe fikr û kederê,
Di civanê tu ji bil halê xwe yarê meke bas.

Nexweş im dax û birînên me dirêjin elemê,
Ceger û dil herişandin ji me vê reng-setemê,
Ger nebînim te şeh û padîşeh û muhteşemê,
Me du sed cewr û cefa têne li ser derd û xemê,
Were da dil bikewînin qe ji arê meke bas.

Me ji ber dax û birînên xwe nehin sebr û hedan,
Were dîlber ji birînê me bike bas û beyan,
Tu bi destê xwe ê nazik bide ber dax û keyan,
Mebê ey dil tu çima wer dikî her zar û eman,
Tu dizanî sebebê can ji mecarê meke bas.

Elem û derd û kulan kuştime ey zêrkemerê,
Ko bi destê xwe te girtî celewa reşqemerê,
Ey şehê baxê evînê nazikê mi'teberê,
Dil ji wê çaxê dinalî û dikêşî keserê,
Me li meydanê bixwaze û ji Qarê meke bas.

Gelo dîlber tu nizanî ji Xwedê nîne rewa,
Ko dikêşî tu bi destê xwe li dil dax û kewa,
Ji evîna te herişţim ser û pa badîhewa,
Ketme benda sermiyana surşîrîn û bedewa,
Te Cegerxwîn wekî Dara kir ji Darê meke bas.

## YAR BI XÊR HAT

Mizgîn li dilê kul ko bi şev yar e, bi xêr hat,
Teşrîf dikirî, odeyê mexsûsê ziyarat..

Ev şev bi me esra ye ko yar hate civan-im,
Yek yek ko li ser tûrê dilim hatine ayat..

Ew zilf û enî, çav û birû, dêm û kep û lêv,
Ew bejn û çen û gerden û sur, remz û işarat.

Destûr ji me re da û şeker vê re şikandî,
Şev, qadiyê hacat û dema maç û minacat.

Min dest bire talanê çen û dêm û leb û rû,
Ser mezhebê mezdik ko esil tê de îbahat.

Min maçê leb û dêm û çenê biriye bi talan,
Lê yar ji me bir, dîn û dil û mezheb û adat.

Vê naz û delalê dil ji me biriye bi talan,
Vê şox û şepalê li me kir keşfê meqamat.

Meşhûr e di nêv alemê seydayê Cegerxwîn,
Bo alê dilan, bê şik e ew sey-yidê sadat..

## SORGUL

Keç sorgula baxê evîn, nûbar e ew, tenha gihişt,
Şahîcivîn û xemrevîn, dojeh li min wê kir bihuşt.

Wê dîlbera nazikbeden, xunce dibişkavtin bi ken,
Pir xweş kir in çol û çimen, deşta xeten bê nave hişt.

Pir nazik û zaro ye keç, taca serê Xesro ye keç,
Rû wek riwa nîvro ye keç, dinya ji tavê maye mişt.

Xob û bedew, şox û şepal, ebrû kevan û dîn betal,
Sed Rıstem û Ferhad û Zal, kuştin bi remz û tîr û xişt.

Wey nazikê wey xanimê bê mirwetê ey zalimê,
Herdem li ser dil hakimê, seyda Cegerxwîn bo te kuşt.



Institut kurde de Paris

## ZERIYA MIN

Navê te me xwend û çerixîm, ez ji riya xwe,
Serxweş me bi navê te, revandê fediya xwe.

Gorî te bitin rojê hezar serxweşê wek min,
Hêja ya bibim gorî ji bona zeriya xwe.

Rojê bi derew gote te, ez bo te hewî me,
Min go de here ma te dikî wek hewiya xwe?

Sed roj û stêr in, wekî sêlin bi me reştir,
Carek ko dibînim keleş û rûperiya xwe.

Ezman û zevî, herdu dibûn kavil û wêran,
Ger carekê dîlber, di dilê min bidiya xwe.

Zanim ko cihan tev de li ber mûke ji biskan,
Wêran dikî ger ew bidî ber yek tiliya xwe.

Birhên xwe li Ristem bihejênî dikujî zû,
Pir xwîn te nivîsîne li ser wê eniya xwe.

Ma qey tu dixwazî bikujî min, ji te hêvî,
Azad bike, dev berde ji wê berberiya xwe.

Karî bikujî min, tu bi çavê xwe ê mêrkoj,
Pir kuştiyê çavê te me dîne beriya xwe.

Ferhad ko nexweş bî, vedijênî bi du remzan,
Tenha bidî ser laş û dilê wê keziya xwe.

Carek were camê ji te re ez bigerînim,
Bavêjime meyxanê, ji ber ve kefiya xwe.

Pêxemberê derda me, wekî «Ehmedê Xan» im,
Tiştek me nizanî qe ji kurdperwerîya xwe.

Meynoşî dibin kurdê me, serxoşî dibim ez,
Lew bûme Cegerxwînê mey û serxweşiya xwe.

Institut kurde de Paris

## × Ez Dilbirîn Im

Dîlber tu were carekê da ez te bibînim,
Ez dil bibirîn im,
Ez îro li ser textê suxen pîrê evînim,
Der royê zemîn im.
Ger ez te dibînim, di şevan fi:.r û xeyal e,
Yan xewn e betal e.
Ger laf û guzafan ji xwe carek dirijînim,
Mêxûlî û dîn im.
Ger pesnê te carek ji nedî ve ko dibêjim,
Ez serxweş û gêj im.
Yekta û tenê, her li dinê ez te dibînim,
Lew xweş dihebînim.
Zanim ko di bîstanê ciwanî de tu sorgul,
Ez bo te me bilbil.
Ez hêstir û xwînê ji xwe tev dicivînim
Carek dirijînim.
Ger carekê dilgir di-mirin, ez hero sed car,
Pawer bike ey yar,
Pêtek ji evîna te di dil de digerînim
Dil pê dikewînim.
Dermanê evîna me çi ye bo me bibêje,
Ger dûr û dirêj e.
Dermanekî pir qenc e mirin ez dinivînim,
Ferhad ê Şirîn im.
Ristem bî ko gerden bikevî nêv ben û davê,
Dê can ji xwe bavê.
Ez îro di benda te de yek murxê hezîn im,
Pir nal û enîn im.
Ger carekê min tu ko li gorî xwe dibînî,
Tenha me vexwînî,
Şahî bigirim ez kul û derdan birevînim,
Da camê vejînim.
Sed sondê dixwim ez, bi «kenişt» û bi «berê reş»
Sed carî «bi Laieş».
Yek bose, ji royê te bidim ser nehilînim,
Ta can biderînim.
Carek tu bi fermanê bibêje kesera min,
Ey lêvşekera min.
Ka canê Cegerxwîn ji me re bîne dişînim,
Bes ten digerînim.



Institut kurde de Paris

## TEMAŞA DÎLBER

Dîlber, gelek delal e, yaşa delalê, yaşa,
Wek te hebin şepal e, sed haşa sum-me haşa.

Di pesnî gewr û rind î, çeleng û pir lewend î,
Xwesroê serbilind î, serdarê mîr û paşa.

Rû kehreba û roj î, pertavê dil disojî,
Agir di kunc û dojî, jana zirav di laşa.

Sade ji rengê avî, şêrîn î wek dirav î,
Geravî newq zirav î, sertîpê gewr û paşa,

Çîn çîn e zilf û reyhan, enî taca Şerefxan,
Ebrû kevan û eywan, rû gulgeş e di kaşan.

Çavên di reş sitêr in, kep û çilak û şêrîn,
Sedef-diran û zêrîn, ziman qelemtiraşa.

Çen gewr û biskê reş-qer, almas guhar û gewher,
Gerdenbelor û mermer, sînga sipî qumaşa.

Memik sipî bilind in, bejin bi gulk û bend in,
Ser pêçî mûm û find in, yaqût û dur di qaşa,

Çak û çeleng û bengîn, xeftan bi ser de rengîn,
Ey seydayê Cegerxwîn, de fermo wer temaşa.

---

### ŞEHİNŞAHÊ KEÇAN

Di evîna te herîştim dilbera nâzik û terx,
Bi Xwedê kî wekî rojê, xwe di pacê re tu derx.

Ez ditirsim ko ji nişka te bibênim, bihejim,
Ji cemala te şepalê ser û pa herwekî çerx.

Bisk û zilfên te sema girtine ser dêmê gulî,
Lê di royê me vebûne du hezar kortik û erx.

Tu şehinşahê keçan û ez Çegerxwînê cihan,
Me vexwîne li serayê, bicivin şahek û ferx.

Institut kurde de Paris

## × ROJÊ JI BIRCÊ DAYE RÊ

Dîlber me dî ji pencerê, Jê re me zû temane kir,
Roj bû ji bircê daye rê, Min ji xwe re temaşe kir.

Hatin temaşayê gelek, Dîlber bi çavê reşbelek,
Ez rakirim birca felek, Dîsa li min delale kir.

Wê nazika rind û delal Da min qubale dêm û xal,
Firset me dî hate mecal, Min bi xwe bê qiyale kir.

Çûm paleya xalên di qer, Min dî li dor eswed hecer,
Elî û Osman û Emer, Mehem-med û Ebabekir.

Eswed-hecer çavê belek, Hacî li dorê lek bi lek,
Hatin tewafê pir gelek Wek me kesî eda ne kir.

Ez çûm tewafa wan riwa, Ser dayê taqê ebriwa,
Wan bir ji min rûh û rewan, Cama dila sed pare kir.

Sed perçe kir cama dile, Zanî Cegerxwîn dilkul e,
Bû hemneşînê bilbile, Zilme bi min xweş yare kir.

---

## × ŞOX Û ŞENGÊ

Dîlber seher hatî sema biskan li xalan kirne ceng,
Alem ji hiş çû kes ne ma, gava ko dîn ew şox û şeng.

Şoxqametê wê saetê da min peyala bade tê,
Wê zalimê bê mirwetê berdane dil tîr û xedeng.

Wê zalimê dilgawirê ez dame ber wê awirê,
Hiş çû, derêxistim ji rê, dinya li min bû tar û teng.

Dinya li min reş tarî ye xeşme li ser dil bariye,
Her şev bi nal û zarî ye, qîrîn e rengê nay û çeng.

Qîrîn e dil şeb ta seher, her dem bi axîn û keser,
Dil kuştiyê xalên di qer, lê dane wê sed gurz û seng.

Pir gurz û tîrin lê reşîn cobar ji xwîna wî meşîn,
Em kuştiyên çavên reş în, lewra li min zer bûye reng.

Geh zer dibim geh reş dibim, geh wek gulan pir geş dibim,
Geh bê hiş û serxweş dibim, lewra Cegerxwin daye deng.

Institut kurde de Paris

## Dûrî Dijwar e

Vê dûriyê ez dîn kirim, aman ji destê dûriyê,
Bê xwendin û bê dîn kirim, aman ji destê dûriyê.

Dûrî ji pêta agirî dil girtiye qet namirî,
Her dem ji ber nal û girî aman ji destê dûriyê.

Tirsim ji te pir dûr kevim, dîsa di axa kûr kevim,
Nêv pencê mar û mûr kevim, aman ji destê dûriyê.

Vê dûriyê em da kirin, çavên belek winda kirin,
Em girtiyê derda kirin, hawar ji destê dûriyê.

Çavên di reş, dêmên gulî biskan xwe da ser wî milî,
Tîr dane dil çi bikim gilî, hawar ji destê dûriyê.

Cênîk û zilf û bisk û bêş, wek top û tang û tîp û gêş,
Min dil ji wan her dem bi êş, hawar ji destê dûriyê.

Êdî bes e ey dîlberê, carek ji pişt perdê derê,
Wer cem, rûnê wek berê, hawar ji destê dûriyê.

Wer em herin nêv bexçe tev, badê binoşin roj û şev,
Rengê gulan dil bidne hev, aman ji destê dûriyê.

Her du dilan pir xweş bikin, em sorgulan rûgeş bikin,
Van bilbilan şûreş bikin, hawar ji destê dûriyê.

Bilbil dikî qîr û eman, tenha li cem wî gulciwan,
Ne g'haye remza ebriwan, aman ji destê dûriyê.

Ew çav li dîdara te kî, wê ariyê l'yara xwe kî,
Bêzî ji gulzara xwe kî, hawar ji destê dûriyê.

Şanî bide wextê seher, zilfên di reş xalên di qer,
Cênîk û zêran deyne ber aman ji destê dûriyê.

Da çav li wê bejna te kî, carek li ber min tobe kî,
Pesnê gulan dîsa nekî, hawar ji destê dûriyê,

Rengê gulê ew kirye dîn, her dem dikî qîrîn û şîn,
Wek min ceger nabî bi xwîn, aman ji destê dûriyê.

Institut kurde de Paris

## XESRIWA RINDA

Ey şahê keça, xusriwa rinda, bi delalî,
Tîra ko li dil da, te ji birhên xwe hilalî.

Ew tîreke sertûj û hinarî ne hinermend,
Guhderz î bi xwe, yan bi xwe wek Ristemê zalî.

Biskên te ne marên di reş in, erqemê ser wan,
Pêçan xwe li dil, herwekî ahengê dinalî.

Ew birhê kevanî ko li ser dêmê te wek hîv,
Ûstadê nivîsîne wekî goşeyê dalî.

Navê ko nivîsî me bi lêvên xwe li dêma,
Heyhat me bi dil xwendiye ew navê cemalî.

Çerxa felek î, yan melek î, tê û diçî zû,
Wek Xocê xizir nakî bi kes re tu hevalî.

Nabî demekê, çavbelekê, eşkere bê vir,
Perda xwe bidî carekê ber bayê şimalî.

Na, kufr e eger carekê bê û bibêjî,
Seyda.. tu Cegerxwînê min î, her bi çi halî.

## LEYLÊ

Di baxan dîlber im sorgul, wekî bilbil dikim meylê,
Sehergahan dinalim ez, eman Leylê eman Leylê.

Tu Leyla ez wekî Mecnûn, sitem kir pir li min gerdûn,
Xemê dil Dicle û Ceyhûn, felek hey lê.. felek hey lê..

Bi nîşanî, bi şîranî, tu latê rind û xoban î,
Li te pîroz e şahanî, bi bejn û kêsim û şeylê.

Tu şêrîn î şekeramîz bi ken, her dem dîkî paîz,
Tu şêrîn î li cem «Perwîz» me dil Ferhad e sed key lê.

Li ser textê evîn «Dara» Mesîha ye ji derda ra,
Cegerxwîn .bû, ji dîdara te pirsek lê ne kir qey lê.

## Zilfê Meqesî

Tîra te li dil daye ji zilfê meqesî,
Daxa ko, di mil da ye ji zilfê meqesî.

Min can û ceger têk heliyan, badîhewa,
Dil kuştiyê tîra serê zilfê meqesî.

Derd û elem û cewr û cefaya ko me dî,
Pêk ve ji meraqa serê zilfê meqesî.

Ev emrê ezîzî ko hemî çû bi cefa,
Têk de, ji firaqa serê zilfê meqesî..

Carek tu gulavê bireşîne serê biska,
Deşta xetenê xweş ke, bi zilfê meqesî.

Lakin tu li ser dêm û hinara yeke dîsa,
Ta ta bike bisk û serê zilfê meqesî.

Winda meke zilfa mexe bin şar û şeda,
Çîn çîn bike carek serê zilfê meqesî.

Carek bi Cegerxwîn zû bide wê lêv û çenê,
Têkel ke tu sembêla bi zilfê meqesî.

---

## AVA HEYATÊ

Meygera ava heyatê, mest û dîwanê te me,
Sorgula baxê xelatê, murxê bîstanê te me.

Sosin î, yan çîçek î, yan reyhen î, yan yasemîn,
Bilbilê mest û hezîn im, der gulistanê te me.

Horiya reşkakil î, ebr û kevan û rojerû,
Xoş perîşan î welê ez tim perîşanê te me.

Ger tu Zîn û şahê xoban, text û bextê eşq û dil,
Ger şêrîna şahê kurd î, milkê Îranê tè me.

Ristemê Îranê eşq î, Xusrowê zêrinkulah,
Keyqubadê milkê Furs î, kurdê bê canê te me.

Der dil û canê Cegerxwîn şah Selahedinê kurd,
Ger tu Betlîsa welat î, ez Şerefxanê te me.



Institut kurde de Paris

## HÊVA LI ÇARDE

Di bendê mame deh sala, me heyva çardehê nû dî,
Bi min her cejn û sersal e, dema dîlber bi min rû dî.

Nîşanê rûperîşanê, hinarê Şax û Şeqlawe,
Li min ferz e tewafa ber Sefîn û Heblêr û Cûdî.

Reqîbê lewmeker, dîsa nefes da agirê eşqê,
Seraser pêt e canê min, di nêv wî ateş û dûdî.

Li min ev agirê eşqê berê yek pête bû, hil bû,
Ji lewmê dijminê bedgo, li min her zêdetir bû dî.

Bi vî rengî ne dî çare teres maye di mabeynê,
Dizanim tut kirê dilber, ji ber der, wek sehê mûdî.

Cegerxwîn û reqîb, îdî nema karin bibin hemreh,
Cegerxwîn mihdiyê wext e, reqîb fir'ewn û nemrûdî.

Institut kurde de Paris

## SERWESEHÊ

Ey dil tu ji ber xemzeyê xoban nexweş î,
Wan serwesehan xalemehan xemnekeş î.

Tenha ne şehîd î, tu bi wan xemzeriman,
Hingî ko hebin xob û perî kê dî xweşî?

Min ah û sifet dîlber e, zilfên di siyah,
Wek tûreyê şahan ko bi zêrhel neqîşî.

Qamet ko sînemsa ye, çimenserw e binêr,
Wek er'er e carek ko di baxan de meşî.

Şahane kulah, zêreguhar, Xusrewê rinda,
Belqîs bi cemalê, bi futoxrafê weşî.

Durzî ne, ko rê girtine zilfên di siyah,
Çendan te enî quble ye, an berdereş î..

Dil bilbila bedbext û siyah, hemdemê zaxan,
Der bezmê terebkêş e Cegerxwîn lê tu reş î..

## Mahîtab

Ya ilahî ev çi sûret bû, me dî nêv came'ê,
Mahîtab û xal û nîşan neqşê nêv secade'ê.

Guft û ken, şêrînşeker bû, ebriwên qews û qezeh,
Miskê tatar bisk û zilf in, tureya ser name'ê.

Rûhîlalê, gûn-semalê, rengê xurşidê bi nûr,
Min dil û canê xwe dayê, herwekî perwane'ê.

Wê seher xwendim, bi teşrîfa xwe ez anîme pêş,
Min ji destê meyfiroşê, nûşî şîra bade'ê..

Deng û awazê guhar û gerdenî ser dane dil,
Kî ji remza sur dinasî, bil ji xam û xame'ê.

Çûm tewafa xanûmana sur ji remza hate der,
Ketme nêv zilfan û bendan, ez bi qesda dane'ê,

Mam di benda zilfê tarî ta ebed mest û hezîn,
Go Çegerxwîno esîro.. ev cezayê bose'ê..

## ÇILO YE KEÇ

Ya Reb te çilo daye keçan ev qed û bala,
Ser ta bi qedem xob û bedew husn û cemala.

Çavên di belek biskê di reş zilfê siyagûn,
Rû mahê felek her du birû rengê hilala.

Ev neynik û cam in, te bi hev kirne miqabil,
Dil can û evîn, ateş û ten, find û şemala.

Ev xal û xetên ko te bi destê xwe nîvîsî,
Yek aletê sêhrê ye û yek eşqê zelala.

Dîlber bi tebîet gul her cî dike bistan,
Dil bilbil e daxwaz e lebê nazik û lala.

Ya Reb tu Cegerxwîn ji cemalê meke bê par,
Estolê xeman lê dikişin behrê xeyala.

## ŞEPALÊ

Sipîdê hate der îro şepala nazik û şeng e,
Zilif tîpê mîkanîkî kevan ebrû perî reng e.

Me bawer bû ko ew roje ji lew min ser kişî ber pê,
Dizanî yar ji hiş çûme ji nişka kir li min deng e.

Bi dengê yar ko ez rabûm bi dîdarê gelek şa bûm,
Me destê toqeyê da hev li min dinya dibû teng e.

Me dil bû agir û pêtî ko perwane giha loksê,
Guhar û bisk û cênîka li wê navê kirin ceng e.

Du leşker çûne meydanê bi tang û awir û topan,
Birîndar ma li wê navê dilê ko tev gul û jeng e.

Di gola Erẍewayê de du estolan li hev dane,
Şikestî keştiya dil tê, ne leşker ma ne serheng e.

Heçî ko dil nedî kuştin nikarî bighê armancê,
Kî carek dil bidî yarê li wî pîroz dibit beng e.

Cegerxwîn dil bi dest yar e, meger ew şah û xunkar e,
Nema êdî dikî qêrîn wî dil hişk e wekî seng e.

## PERÎ

Periyê da me serek, hatî bimeş,
Şevereş bû bi me xweş kir şevereş.

Dame destê xwe mesîhayê kenî,
Li me xweş kir cegerê sade nexweş.

Wê ko tîrek ji kevanan diweşand,
Me birînê xwe jimartin sed û şeş.

Ma gelo xweş dibitin daẍ û birîn,
Kê xweşî dî, ta hebin xob û keleş.

Ji evîna te dinalim şev û roj,
Ne tenê kurd û ereb, çîn û hebeş.

Ger Cegerxwîn wekî Ristem ne biwa,
Di evîna te de, ne dima we bi leş.

Institut kurde de Paris

## MEY û NÊY

Bedewê da me qedeh, go vexwe mey,
Me qedeh noşî ji desta hey û hey.

Felekê girtî tereb, hate sema,
Dil û can tev de hejandin mey û ney.

Me bi xweşxwan û ẍezel, xan û mezel,
Dane ber deng û newayê ey û wey.

Wekî şoxê xuşiyan em, ji xweşî,
Wê di rex min de şepalek şeh û key.

Nazik û xob û perî, şeng û bedew,
Çîn di mizgînê diçî, Raîd û Rey.

Bend û dil in pir di bendê de welê,
Em di nav wan de, dinalin ay û ey.

Me li pê xwe hemî hiştin bi tenê,
Ez û dîlber mane bes bê pişt û pey.

Muẍbeçan xweş digerdandin mey û cam,
Çûne govend û semayê muẍbeçey.

Me li hev dane bi dest cam û qedeh,
Tên ji salon û serayê qîr û qey.

Şewişîn em ji meyê, çeng û neyê,
Dane qîrîn û newayê deng û dey.

Dil û can dan me bi nazî û bi ken,
Wê li sîna me kişandin daẍ û key.

Me bi daẍê, bi çiraẍê geş e dil,
Man li ber vê şewq û tavê tor û tey.

Ey Cegerxwîn tu şehê textê evîn,
Li dinê her tu tenê bê xal û xey.

Institut kurde de Paris

## LI SEYRANÊ

Evîna te hemî sotim ji ber perdê xwe zù derxe,
Li hember min tu rista zêr ù yaqûta li kember xe.

Tu birh û qoziyên çavan li min bişkîn, bide destûr,
Li hember te wekî dergûşê sergerdan bidim çerxe.

Li hev zendan bipêçin em, digel hev biçne seyranê,
Ji şopa qondera xanim, di ser çav im vebin erxe.

Li ser royim bikin cengê, guhar ù morî ù cênîk,
Kum ù kofî li ber lingan, herin bên wek mî ù berxe.

Bi biskê sorgulî bigrim, ji bexçê gul'ezarê ez,
Du sêvê sor bi dest bênim, ji bejna nazik ù terxe.

Bes e êdî te ez kuştim, perîşan ù nexweş hiştim,
Dused wek min Cegerxwînî, di vê rê de kirin kerxe.

### NEXWEŞÊ EVÎN IM

Çil sal e ezab ù elemê wa dikişînim,
Bêçare nexoş im ko hemî derd ù birîn im.

Der Londena eşqê ko tu serdarê tebîban,
Derdê me çi derman e birîndarê evîn im.

Me ji seydayê Stalîn girtiye ev waz ù nesîhet,
Wer guh bide carek bi xwe seydayê Lenîn im.

Kî dil bidî yarek divê pir sebr ù tehemil,
Lew ez bi evîna te birînan dikewînim.

Bê çare ye derdê ko wî dermanî mirin bit,
Şeb ta bi seher ez bi xwe pir jar ù hezîn im.

Ger yar me neyê dest, me çi hacet bi delîlan,
Der rahê beyaban bi xwe bê mezheb ù dîn im.

Litfa te nebî kî me bi dergê te gehênî,
Hêj ez ne mirim litfê bike da te bibînim.
Elbet tu dizanî bi te riswa me di eşqê,
Cana ko ceger tev ji fîraqa te bi xwîn im.



Institut kurde de Paris

## XEZALA KEPEZ

Dilber sibehê rabû ji xew, zû qevizî,
Naka, li xwe pêçane ilêmî, temezî,
Xweş hatî ji bircê, bi xwe nazik lerizî,
Wek şêr û piling, daberizîn bisk û kezî,
Bû roj, li dinê da, û cîhan pê tewizî...

Da destê evînê, ji me kir pirs û sial,
Go: ma li dinê, wek me hene şox û şepal,
Min go: me ne dî, wek te xudan keys û fesal,
Wek te me ne dî, kes bi we tewratê cemal,
Pesnê te çi bêjim tu xezala Kepez î...

Dilgirtî, perîzade, bi lêvê xwe kenî,
Go: min tu di ilmê de, hesêb kir mezin î,
Ma ez ko xezal im, çi ne ev toq û benî?
Aya te li kê dîtine ev zilf û enî?
Bawer ke, di pesnê me de, suxtê hewez î.

Paşayê ser im, girtî tereb hatiye bîr,
Ezman û qelem zû xebitîn, bûne wezîr,
Min go: tu şeh û padîşeh û begler û mîr,
Ruhul-qudus î, lê ne kes î ma çi ye tefsîr,
Winda me, di hisna te de, ez tu, tu ez î.

Ez tu, li dinê, gerçî weke roj û şev in,
Şewqa te ne mînî, ji xwe em tevlihev in,
Sed carî, xwezî yek şevê em tev bicivin,
Sed carî xwezî, ko bimirin, tev binivin,
Bes bêje Cegerxwîn, çi ne ev ah û xwezî.

Institut kurde de Paris

## ŞEVA HÎCRAN

Di tarîka şeva hicran çiraxek sîfet im ya Reb,
Ji ser heta piyan ar e, bi carek vêketim ya Reb.

Nema min sebr û aramek ji ber jana evîna dil,
Evîn behr e belê tenha di ber pêlan ketim ya Reb.

Ji dîlber dûr ketim lewra bela ser daye can û dil,
Temaşa nakî ey zalim kî ez bê taqet im ya Reb.

Meger pirsê li min nakî belê tim tê xiyala min,
Şev û rojan bi nalînim bi ah û hesret im ya Reb.

Şev û rojan bi kovan im bi bilbil re dilovan im,
Hevalê xuncê baxan im, ji gul ez dûr ketim ya Reb.

Digel bilbil dinalim ez, zirav im wek hilal im ez,
Şikestî rengê dal im ez, di halê hirqet im ya Reb.

Di kûra eşqê borî me, yeqîn ez pîrê torî me,
Di «lailma» derûrî me, di qeyda hîcret im ya Reb.

Meger ez Ristemê kurd im firaqê ez nexweş kerdim,
Cegerxwîn im siyahçerd im, di kunca xelwet im ya Reb.

Institut kurde de Paris

### ÇARŞEFÊ BAVÊJ

Çi cejn e ko perî tên ji gulşenan bi ref ref,
Çavên belek leb û dêm winda dikin bi çerşef,

Min dest bi destê yar e bê çarik û xumar e,
Meynuşî min ji destan ateş meger di qerqef.

Geş bûye rengê sorgul bi ah û dengê bilbil,
Meyger ketî semayê bê nay û çeng û bê def.

Şeker bi ken dibarî can û qedeh bi destan,
Zilfên siyah û ebrû, li dil dixwin hezar gef.

Ava çeman xumîn e, ba daye ber xwe kîne,
Masa sedef li ber me, cam û kebab û mersef.

Emrê me çûye wenda li kunc û xan û gunda,
Lewra ko bûm Cegerxwîn, bi Laleş û bi mishef.

## Ey Dîlber

Ela ey dîlbera nazikbeden wek cam û belor î,
Nîşan û dêm û ebrûyên te neqşê çîn û ferfûrî
Perîşan û sifet-horî fereşta kaniya nûr î,
Bi dîdara xwe wek xurşîd ko der afaqê meşhûr î.

Eger xwabî ko gul bînî ruxê xod ra temaşa kun,
Eger meylê xezandarî nezer ber sûretê ma kun.
Eger ey dost evîndar î tu vê sirê mie'ma kun,
Hilîn perdê ji bo Yezdan, ji ser wan dêmê mesturî.

Eger dîlber nebînim ez ji cama dûrî serxweş im,
Sevên tarî di gulzara wekî meyxwarê medhoş im.
Di meyxanê tu meyger bî lebaleb dê meyê noşim,
Ji bo dilgir bide meyger şeraba şîre engûrî.

Me xweş noşî meya eşqê ji destê meyger û rindê,
Vewesta bûm li ser yek pê, li hember wê şekerxendê,
Benî û rist û cênika bi ceng, deng dane govendê,
Newa têtin ji wan xweş wek bilûr û ûd û tenbûrê.

Ji pêta vê perîrengê felekbêçareyek merd im,
Wekî bilbil bi deng û ah û nal û zarî û derd im,
Xerab hatim ji meyxanê ji xemrê ez siyah-çerd im,
Nehin kafî di tehrîma şerabê qewlê cemhûrî.

Ji derdê nazika xweşken dizanin ez Cegerxwîn im,
Siyah bext im wekî zaxan di nêv baxan de ez dîn im.
Di gulzara cemala keç ji bo dil yek gulê tînim,
Bi wan levên şekerbarîn bide ferman û destûrî.

Institut Kurde de Paris

## Gazin ji kê?

Îro ji ber jana di dil,
Dil jar û mest û xeste ye.
Agir li ser daxê di kul,
Bê gazin û bê lome ye.

Ma dê ji kê gazin bikim,
Gazin ji ber bazin bikim.
Derdê li dil mazin bikim,
Çendan bikim bê fêde ye.

Bê fêde ye ev nale-nal,
Borîn li min, pir mah û sal.
Dîlber li ber çavan xiyal,
Lewra evîn yek niqte ye..

Niqat evînê ateşî,
Laşê ko pêtek tê kişî.
Kengî dibînit ew xweşî,
Ma kî nizanî ev we ye.

Zanim evîn, pir şewq û tav,
Peyda dikî jana zirav.
Sînga ko pêtek çûye nav,
Wek mûm û find û lukse ye.

Danî di dil sed mûm û find,
Wê nazika pir gewr û rind.
Wek Xwesriwê Îran û Hind,
Ez kirme dîl û bende ye.

Bû'm dîl û jar û bend û mest,
Wê nazikê girtim bi dest.
Zin-nar û kember min vebest,
Sîne me kir pûtxane ye.

Vê zalimê gawir kirim,
Carek ji dîn ez der kirim.
Geh reş kirim, geh zer kirim,
Bêçare poşîm xirqe ye.

Institut kurde de Paris

Xirqe li min kir, ne bi zor.
Êzîdiya Şengar û Tor.
Gazî me kir em birne jor,
Zanî me Laleş, kabe ye..

Min ser tewand ber Laleş e,
Armanc bi xwe zilfa reş e.
Herçî ko yar bêjî xweş e,
Wer, rakî fermana me ye.

Zilman li min dîlber bikî,
Agir li ser dil wer bikî.
Canê Cegerxwîn ker bikî,
Dîsa me jê hêvî heye.

## LI SER MASÊ

Di dil de agir û pêt e, ji eşqa dilbera taze,
Dilê daxa evînê lê şev û roja neşî raze.

Şev û roja me nayê xew, di wêrana «cehenem» de,
Tu zanî ez birîndar im, me şahid deng û awaz e.

Bi lêvên xwey şekerbarî, vexwîne min bi şîranî,
Ko ez rûnim li dîwana te şehbal û hinerbaz e.

Li ser masa me gerson deynî cama xemr û qonyaqê,
Ko sazbendê me ê dengxweş bikî qîrîn digel saze.

Bi destan em bikin tewqe li min birhê xwe bişkînî,
Enî û çav û dêm û lêv, li ser masê bibin maze.

Bi şêranî bi dilşadî, bi serbestî, bi azadî,
Li salona serayê em, herin bên wek sî û qaze.

Bi şadî û bi ken bin em, gilî û gazin me qet navê,
Ko ev murxê xem û derdan, ji dil bavêje perwaze.

Çiman em dê bikin gazin ko her du dil bi hev xweş bin.
Di vê rê de gelo dilber, te dî kes wek me dilxwaze.

Li gerdûnê evînê min, çikandî beyreqa eşqê,
Bizane ko Cegerxwînê te yekta û serefraz e.



Institut kurde de Paris

## SILAVA JI YAR

Xwesriwê işqê li ser textê evînê girtî rav,
Murxê can û dil xeşîm bû wê ne dî bûn bend û dav.

Biskê tarî bend û dav in, dêmê sorgul dane bû,
Dil ko ew dêmê gulî dî, daye perwaz çûye nav.

Ketme benda surşirînê mame gerden xwar û dî,
Zalimê berdaye dil tîra kevanê mal ziray.

Wê firingê da xedengê kirme amanc û hedef,
Min digo cenga selîb e, min diye îro bi çav.

Ne tenê kuştim bi nazan lê şehîdê bê jimar,
Xwîn ji van çavan dizêtin tê û tê manendî av.

Bend û dîl im, bê bedîl im sed şikir ma ev ne bes,
Hudhudê işqê ji dîlber bo me anî sed silav.

Key xwedayê çû serayê da me destê sihbetê,
Go tu xweş bûye Cegerxwîn dê efû kim bê dirav.

## BELÎX

Cobarê evîna te di sînga me belîx,
Dengê me gihaye ji evîna te Merîx.

Ûsif ko ji ken'anê giha textê Misir,
Bawer ne dibû, ger ne diya ruyê Zelîx.

Bû şahê Misir ew, di evîna te de lê,
Min çûne di dil de, du hezar keyber û mîx.

Gewher hebitin, kengî dibînî xwe li jêr,
Ma têne veşartin li dînê, rim di selîx?

Pir dax û birînên te li sîna me kişand,
Ma xweş dikitin, dax û birînê me lebîx.

T'ez kirme Cegerxwîn, te cihan tev de hejand,
Ev kurd û dilawer, te kirin tev de pelîx..

Institut kurde de Paris

# CANA

Canê cana me li bala diye bawer tu ew î.
Te cihan girtî bi dîdara xwe nazik bedew î,
Bendewarê te bitin sed key û pê sed emewî,
Mûyekî ez ji te nadim bi rebîa edewî,
Li dinê her te dibênim ne heval û ne hewî.

Nazik û xob û perîzade şehinşah key û beg,
Awirin tîrê Keyo her dû birû mahê] felek.
Te li ser dêmê gulî biskê siyah kirne xelek,
Te cihan girtî seraser bi du çavê xwe belek,
Dê ji difra te cihan tev bitewî ger netewî.

Rûperî şeng û bedew naz û delal şox û şepal,
Bend û dîl in di evîna te de sed Ristem û Zal.
Kuştiyê tîrê du çavên te Rizaxan û Kemal,
Kî heye ser netewînî ji te re her meh û sal,
Çi misilman û yezîdî, çi firing û elewî.

Nav û dengê te gihan çerx û felek bûne belav,
Tac û kofî te li ser daniye tev zêr û dirav.
Pişt û kember te girêdane li bejna xwe zirav,
Tu li bejna xwe dibarînî hero misk û gulav,
Ji xwe şebnem diweşênî ko sehergeh direwî.

Te ji min sîne kirî kêlik û amacê evîn,
Ne ji derbê te ji ber kerbê te ez ketme nivîn,
Me ẍem û derd û elem, êş û keder tev de civîn.
Me ji ber derd û ẍeman dil kul e, şadî me revîn,
Mirẍê davî tu Cegerxwîn ji xwe bê xurd û xew î.

Institut kurde de Paris

## LI SERAYÊ

Çana te cîhan girtî seraser bi ciwanî,
Roj î di cîhanî.
Min dî ji serayê dixuşî tê bi giranî,
Zû perde hilanî,
Gava ko me dî, ser me tewand ber nigê yarê
Sermest û xumarê.
Lingê xwe ji nêv qondereyê, wê ne deranî,
Ser çavê me danî.
Lingê te ji bo dax û birînê me re derman,
Zanim bi xwe luqman.
Nafiz bi xwe destê xwe li ser canê me danî,
Derdê me nizanî.
Bawer bike ser ta bi piyan, derd û birîn im,
Ferhadê şirîn im.
Tîra ko li dil da te ji ebrûyê kevanî
Ey pertewê canî.
Cama ji lebê laîê te ez îro dinoşim,
Bawer be li hoş im.
Miftî me Zeradeşt e, jinik mezdik û manî,
Fetwa me deranî.
Îro di evîna te de wek Ristemê Zal im,
Çendan ko dinalim.
Barê ko me hilgirtî, dizanim, ne hesanî,
Kî bit ne tewanî.
Dilber tu dixwazî bikujî min ne bi xencer,
Carek tu her û wer.
Lê ger te divêtin nemirim ez bi xizanî,
Wer rûne li banî.
Emrê me î şêrîn tu çima wer dibiwêrî,
Çawa tu di wêrî.
Ne stêle ye seyda bi xwe wek Ehmedê xanî,
Riswa meke wanî.
Çana tu dizanî bi xwe ez bûme Çegerxwîn,
Her şev bi xwe di girîn.
Çavên me dirêjin ji xwe sed Dicle û kanî,
Ma qey tu nizanî?

Institut kurde de Paris

## ŞEKERLÊVÊ

Ez li hember, dost li hember,
Awir vedan dil bû du ker.
Şîfre bi wan birhên xwe dan,
Pir kir li dil jan û keder.

Ez li hember dosta xwe mam,
Hîv bûm, li ber roja te mam.
Wê nazika şêrînkelam,
Da min bi lêvên xwe şeker.

Qend û şeker da min ji lêv,
Da min ji bexçê xwe du sêv.
Tenha go min, da te du şêv,
Ev bexçe ey murxê seher.

Ez çûme baxê gulîzar,
Min jê çinî cotek hinar.
Minet ji yar ev yadigar,
Şêran li ber girtin çeper.

Şêr û piling dan ber çenê,
Wê nazikê şêrînkenê.
Yanî du şev da min, tenê,
Lê bûme bexçevan li ber.

Bûm bexçevanê wî rezî,
Şehne li ser min bûn kezî.
Min sorgulek tenha dizî,
Wan dil ji min girtin di ber.

Wan dil birin, çûm pêşî şah,
Wê xusriwa zêrînkulah.
Da bersiva min bê gunah,
Go, dil bi gul hat ser bi ser.

Piştî me dil dayê bi gul,
Tîr dane nêv mêlak û dil.

Institut kurde de Paris

Zinar û kember dane mil,
Sîng bexçeya tev sor û zer.

Sîng bexçeya Îran û Firs,
Yan Ceneta Zinar û Xurs.

Ez çûme nêv, bê tirs û pirs,
Pişkoj û tilyan kirne şer.

Ew pişkiwên zêrîn sedef,
Girtin li sîngê sef bi sef,

Rengê sipa hê Xan-şeref,
Girtin li dor textê Qecer.

Wek bextiyan wek gurdilan,
Mertal û şûr dan ser milan.

Hatin li ber min rim kilan,
Talan kirin can û ceger.

Can û ceger dan ber rima,
Bisk û kezî hatin sema.

Alem ji hiş çû, kes ne ma,
Gava ko dilber hate der.

Ew dilbera qamet ji şox,
Sed keyber û sed tîr û dox,

Berdane dil sed ax û ox,
Dil ma, bi nalîn û keser.

Nalîn ji dil çûne felek,
Xemgîn kirin cin û melek.

Vê zalimê kuştin gelek,
Wek min Cegerxwîn bê mefer.

Institut kurde de Paris

## DAẌÊN SÎNGÊ

Dîsa ji ber jana evîn,
Min tên ji dil sed ax û ox.

Daẍên li sîngê axivîn,
Her jê dizêtin xwîn û zox.

Xwîn tê ji van daẍê di kul,
Ker ker dibit, mêlak û dil.

Dişkên li min tev pişt û mil,
Gava ko tê ew şeng û şox.

Şoxqametê wê saetê,
Da min nişan xal û xetê.

Gava me dî bû dil ket-ê,
Min secde bir ebrû û rox.

Ebrû-qezeh, çavin qedeh,
Min pê dikir kêf û fereh.

Bejna-zirav, misk û gulav,
Xeftan bi ser de şal û çox.

Xeftan li bejnê çox û şal,
Sed Ristem û Ferhad û Zal.

Wê nazika rind û delal,
Kuştî ne, heryek ew bi dox.

Sed dox li singê xistine,
Mêlak û dil derxistine.

Zinar û kember bestine,
Lê rakişandin tîr û hox.

Pir tîr û hox, wê lê kişand,
Agir bi ser de lê reşand.

Tîra kevanê reş weşand,
Danî ceger, xwîn bû kulox.

Institut kurde de Paris

## DIYARIYA YARÊ

Yarê diyarî da me ew badaya meya xweş,
Min bade girt û noşî tev bûme pêt û ateş.

Destê me girtî yarê serbest birim serayê,
Em dest bi dest û mest in ne serxweş û ne bê heş.

Keç rengê pedîşahî rû dêm û ebrû mahî,
Taca Keyo li ser şan rûnistî textê guhreş.

Gazî dikir nedîman danîne ber me tawle,
Zarê me tim yek û du zarê keçê şeş û şeş.

Wê nazika keç û rind şeş deste kirme bin dest,
Xwestin ji min dil û can şehmatê kir ne go keş.

Qend û şeker şikandin pirşa cihan û can kir,
Wê nazika perîrû ebrû hilal û mahweş.

Zanî ko feylesûf e, seyday e rengê Zerdeşt,
Wê bersivê sivik dî namênî ew mişeweş.

Naka me gotî zanim xana dîna ye dinya,
Pûtxane ye ji bo me mizgeft û dêr û Laleş.

Can pak e lê du par in, herdu ji hev cida ne,
Benda me rengê xar in benda te wek gula geş.

Yeksû ne xar û sorgul em tev de xak û av in,
Yekrû ne tev de candar çi henteş û çi menteş.

Seyda û pîr û zana pir wek me bûn cegerxwîn,
Çerxa cihan revandin dijwar e cerx û kerkeş.

Institut Kurde de Paris

## Pîrî û Ciwanî

Ji remza ebriwên tey qews û heyvî,
Ne maye min ji emrê xwe tu hêvî.

Li ser palên ecel hey hey dibazin,
Ji ser jor daberisitin ser nişêvî.

Bi min pîrî gişiht û çû ciwanî,
Şikest û çû ji ber boxê birîvî.

Bi min tenha hebû canek ciwanek,
Me nîvî da evînê maye nîvî.

Ewê dî tev me daye ber piyên te,
Di emrê xwe ne dî bû min kirîvî.

Me ahû çavbelek dî û me da pey,
Li ber min bû beranê qertekovî.

Me nêçîra xwe girtî wek Siyamed,
Di pişta min de xîpek zirbehîvî.

Li Sîpanê Xelatê ez dinalim,
Tu maye wek Xeca dota silîvî.

Cegerxwîno gelek şêrên wekî te,
Di vê rê de qelistin bûne rêvî.

Institut kurde de Paris

## GULA BÊXAR

Me j' bexçeya gulsor û zer, Tenha gula bê xare girt.
Me j' nazikên zêrîn kemer, Ew nazika nûbare girt.
Dîlber di baxan çîne çîn, Hatin sema şêrîn û zîn.
Yexma kirin canê şirîn, Min ew şirîn reftare girt.
Wan nazikan dur dehenan Wan dîlberan şêrînkenan.
Mane di bax û gulşena, Lê me b'tenê qûntare girt.
Em man li qûntarên çiyan, Baz û îqab û qumriyan.
Hatin digel min naliyan, Min dil keçe xwînxware girt.
Dil ma bi dest a çavbelek, Marên di reş lê bûn xelek.
Biskan li dor çerx û felek, Jana di dil mûmare girt.
Dijwar e pir ev jan û kul, Çala kul û derda ye dil.
Vala ne mane kunc û qul, Xemba li dor eşare girt.
Derd û xeman ser daye min, Efrîtekî tey-yar û cin.
Ez birme bala hin bi hin, Min ew perî ruxsare girt.
Min ew perî ruxsare dî, Destê me girt xweş amedî.
Malpêşberî zuhra cedî, Xwe l'sebayê sey-yare girt.
Seyrek li istêran me kir, Meyla jin û mêran me kir.
Çerxek li ser jêran me kir, Min laleş û zen-nare girt.
Min ser tewandî laleş e, Doza me her zilfa reş e,
Emrê me hê sî û şeş e, Pala li ser tibare girt.
Palê bi dest cama elest, Alem bi carek kirye mest.
Ihrame hin zen-nare best, Min ew riya kevnare girt.
Çûm Laleşê wek toriyan, Gok û guhar û moriyan.
Wek leşkerê nestoriyan, Textê şehê şobare girt.
Kê selsila işqê hejand, Kê wek Cegerxwîn dil heband.
Perde ji ber koran çirand, Wî dîlberek sed yare girt,

Institut kurde de Paris

## KEÇÊ DİLBER

Keçê dîlber evîna te ji bo dil pir cefa ye,
Tu xweş rind i, şekerxend î gelo ma ev rewa ye?

Te sotî cerg û canê min ji her alî ser û pa,
Belê dîna te bo derdê dilê min xweş dewa ye.

Ne ten hiştî, ne dil hiştî, bi xwîn reştî seranguşt,
Bes e êdî ji min çi dikî qe dilnermî ne maye?

Mirin yek car e lakin ez hero sed carî dimrim,
Ji dilgîran me ev pirsî dibêjin xweş wefa ye.

Şeva tarî bi min dojeh di kunca xaniyê reş,
Gelo xewn e heçî min dî û yaxud macera ye.

Bihuşta ko nebî dîlber ezê çi bikim bi baxan,
Di wê çaxê bi min doje xweş û xana Xuda ye.

Heta kengê dilê xemgîn bidî ber awir û topan,
Bes e, ey dîlbera mêrkuj te can û dil revaye.

Ko carek tête bîra min qed û bala te ya şîrîn,
Di çavê min hemî dinya wekî derya hevaye.

Xwezî bimrim belê ez tu bi hev re herne gorê,
Evîn dijwar e dil rengê Zelîxa bê heya ye.

Çegerxwîn im dibînî hêstirê min reş dibarin,
Bi qurbana te bim êdî cegerxwîn tê ne ma ye.

Institut kurde de Paris

## LI BEXÇE

Xanim me dî li bexçe, Min can ji dest xwe avêt.
Bê can û dil vewestan, Ez mame wek şel û şêt.
Destê me girtî xanim, Zû gazî muxbeçan kir.
Danîne ber me mase, Cam û kibab û pakêt.
Em mane serxweş û mest, Bê zare em dilîzin.
Cam û qedeh li hev dan, Tê û diçî Gerabêt.
Min dil ji bo keçê re, Naçare kirye maze.
Camek ji abê lala, Me b' gerdena xwe da rêt.
Pir gewr û rind e yar im, Marên di reş ji biskan.
Ebrû kevanê Ristem, Berfa çiya mil û hêt.
Ez jê re xweş dinalim, Zîn û Meman dibêjim.
Qawan dinalî ya lêl, Keç her dinalî ya lêt.
Masa sedef li ber me, Hey hey li ser mey û cam.
Keçê di bin piyên wê, Veşarti bûn dinamêt.
Dîlber bi ken hejandim, Ji hiş birim kirim dîn.
Naka me dî ji nişka, Ser ta piyan kirim pêt.
Naka me dî du polîs, Hatin mekîne anîn.
Em birne xestexanê, Dektor ne da me raçêt.
Go rih ke saẍ ne maye, Ser ta piyan Cegerxwîn.
Ev kuştiyê evîn e, Derman li wî nema têt.

Institut kurde de Paris

## Dîlbera Nazik

Me dî bû dîlberek nazik sehergahan xweyanî bû,
Kitan û perde û çarik ji ber dêman hilanî bû.

Hilanî perde û poşî qumaş û etles in boşî,
Bi lêvan şerbetek noşî ji rengê zaferanî bû.

Bi min da şerbetek meyxweş ji şîra paqij û bê xeş,
Dema noşî nema min heş di kasa kamiranî bû.

Ji wê kasê ji wê tasê ko noşî min li ber masê,
Me hiş çû girtî weswasê ji remza « lenteranî » bû.

Ji remza dûriya yarê giha dil pêtiya arê,
Me ten bû herwekî darê pirîsk û şe'şeanî bû,

Pirîsk û pêt û lem'ane disojit her ten û can e,
Belê dil rengê perwane li hawêr helqe danî bû.

Li hawêr hat û xweş reftî li min ew tîreya keftî,
Birîn kir dil diaxiftî ji reşbirhê kevanî bû.

Çi ebrûyek qezehreng e, di bin de rû wekî peng e,
Semawî xetê erjeng e, ne şaş im neqşê manî bû.

Li rû sed neqşê Qefqas in di çavan heybet û bas in,
Kepo leb rengê elmas in û dil derya meanî bû.

Cegerxwîn kurdiyê Torê di benda dîlber û horê,
Şekerxend û gulîsorê ji dil mirxê zemanî bû.

Institut Kurde de Paris

## Hahî Felekê

Tacê sertacê şahî, Ebrû ji rengê mahî.
Ev qed û bejn û bala, Te dane kê îlahî,
Şepal û şeng û şêrîn, Şewqa dilê Mem û Zîn.
Pir pir mirin di bendê, Wek min egîd û dahî.
Pîr û mela û zahid, Xaxam û qes û abid.
Tîra keçê li wan ket, Bûn rêberên melahî...
Şoxa me dil, li bal e, Pir nazik û delal e.
Çi û çi me dîn ji desta, Hahî felekê, hahî..
Keç hate nêv bihuştê, Rûniştim ez teniştê.
Pêşkêşî xanim êm kir, Du gotinên şifahî,
Dostan re doste karî, Dijmin re, tim neyarî.
Seyda û feylesof im, Xanim ji min çi xwahî?
Keça delal û cindî, Wê gote min efendî.
Dengê me tev cihan girt, Ji mahê ta bi mahî..
Ey seydayê Cegerxwîn, Çi bkim, ji ilm û zanîn.
Zanîn û felsefa te, Tev bûne rûsiyahî.

Institut kurde de Paris

## SURŞIRÎNÊ

Surşirînê rim li dil dan nagihan ez çûm ji heş,
Wê ji min dil bir bi talan mame sergerdan nexweş.
Xweş li ber dil çûn kemînê bisk û zilfên tey di reş,
Dame ber çerxan hejandim malxerab zalim felek.

Êş û derdan ez revandim dilbera zêrîn kemer,
Hate ser min pêlewanek ê di bin de reş qemer,
Ez bi bala hilfirandim ma cihan zêr û zeber,
Ketme ber fikr û xeyalan ez di vê seyrê demek.

Paketeb'an wan temaşa çerxê bala her divêt,
Xaketeb'an wan di dil de agir û dûman û pêt,
Dicleyê derd û ẍeman her dem di singa min dizêt,
Min di dil de tîr dibazin hê ji wan çavên belek.

Rojperest im dîn û mest im pirê meyxane me yar,
Wi li pişta min vebestin kember û ben û zinar,
Zaliman mirwet çunîne fêde nakin ah û zar,
Min bi van axin û nalan ker kirin cin û melek.

Ev çi wijdan û çi bext e ji Xwedê nîne rewa,
Ko bi destê xwe dikêşê tu li dil daẍ û kewa,
Emrekî erzan didim vê alema badîhewa,
Perdeya ẍeybê hilênin ka sema kanî semek.

Ne tenê riswayê işqa te Cegerxwîn bû ji dil,
Bilbilê şeyda di baẍan daîma dil daye gul.
Zahidê xelwetnişîn zenar û kember dane mil,
Ristem û Ferhad û Zal tên vê semayê yek bi yek.

Institut kurde de Paris

# SERTACA KEYAN

Kesrayê eywan tiwî,
Şah û Şeref-xan tiwî,
Sertacê keyan tiwî,
Ê dil di bendan ez im.

Adil bi şahî tiwî,
Rû rengê mahê tiwî,
Zêrîn-kulahî tiwî,
È tim bi kovan ez im.

Şêrîn li soran tiwî,
Zîna li Botan tiwî,
Xeca li zozan tiwî,
Memê di zîndan ez im.

Dîlber û yarê tiwî,
Gula Biharê tiwî,
Zêrîn-guharê tiwî.
Bilbil di bistan ez im.

A nûgihiştî tiwî,
Dilê me kuştî tiwî,
Mil hildimiştî tiwî.
Dil çû bi talan ez im.

Guhderz û hem Zal tiwî,
Êzdiya Şengal tiwî,
Bi şûr û mertal tiwî.
É nîvmisilman ez im.

Awirpilingê tiwî,
Hunerfiringê tiwî,
Xwedya tifingê tiwî,
Armanc û nîşan ez im,

Taca şepala tiwî,
Kewa li bala tiwî,
Kara xezala tiwî.
Dînê li çolan ez im.

A lêv ji qendan tiwî,
Paşayê rindan tiwî,
Bazin di zendan tiwî,
Serdarê dîlan ez im.

Keça nûhatî tiwî,
A dil dipatî tiwî,
Qend û nebatî tiwî,
Kuştiyê zilfan ez im.

Şox û şepalê tiwî,
Şewq û şemalê tiwî,
Qenc û delalê tiwî,
Dilfind û perwan ez im.

Nazik û nazdar tiwî,
Çîçek û gulnar tiwî,
Roja li êvar tiwî,
Serxoş û meyxan ez im.

A dil bi desta tiwî,
Zend û Evêsta tiwî,
Yezdan û hosta tiwî,
Zerdeştê kurdan ez im.

A dil birîn kir tiwî,
Ceger bi xwîn kir tiwî,
Ez har û dîn kir tiwî,
Bêçar û derman ez im.

Institut kurde de Paris

## LAVLAV ÇI NE

Felek destê xwe nadî kes bi lava,
Ne wek kew tête girtin ew bi dava.

Ne ahû ye ji dur ve lê binêrim,
Ne kîrgo ye ko bigrim wê bi rava.

Keçê bo çi ji bo min sergiran î,
Wekî hevdî ne, her du em bi bava.

Te gotî min eger carek tu bê vir,
Emê rûnin li pişt perdê du gava.

Heye deh sal li ber der ez dinalim,
Tu nabêjî bes e mala te ava.

Ji min canê şirîn ger tu dixwazî,
Ji min bistîn bibe ser her du çava.

Belê bistanê emr im kirne wêran,
Di paîza evînê hewr û tava.

Ji destê te sipî bûm bûme wek kak,
Digel bilbil dinalim ez li Mava.

Me go belkî di birca şaneşînê,
Emê rûnin di kincê bûk û zava.

Bi van xapan te ez kirme Cegerxwîn,
Bes e îdî felek mala te n'ava.



Institut kurde de Paris

## Te zû Têderanî

Hate ber derî,
Lê gava ew çû,
Ka ew çavên reş,
Ka ew bîna xweş,

Gava min ew dî,
Ez çûme desta,
Rû geş û bi ken,
Ket himbêza min,

Ketin mekînê,
Destê min li ser,
Çiyakî bi dar,
Rêçek xwar û mar,

Em zù derketin,
Me pir civandin,
Li ser vê latê,
Xweş tê şêrîna,

Yara min ba kir,
Li ser çi digirî,
Yara te va ye,
Ev deşt û çiya,

Derdê dilgîra,
Lê dijmin kî ye,
Gul ko bişkivî,
Keçik ko bû jin,

Ne we ye bilbil,
Bi qîr û nalîn,
Bilbilê dilkul,
Ne tu dîn bûye,

Bilbil ko şêrîn,
Mixabin ko tu,
Te arî gul kir,
Hevalê te qet,

Min lê ne nêrî.
Min dil daye dû.
Ka ew dêmê geş.
Ka ew reng û rû.

Lê bûme xwedî.
Bê şerm û fedî.
Da min lêv û çen.
Kevoka kedî,

Şifora me ew.
Wa ranê qelew.
Newal û nizar.
Daxwaza me hew.

Dilxweş û bê kul.
Çîçek û sorgul.
Li ser wê katê.
Şalûl û bilbil.

Ey bilbilê dîn.
Qêrîn û nalîn.
Li ber çava ye.
Tev xweş kir bi bîn.

Dîdara yar e.
Çarik û xar e.
Pîr û rûsar e.
Parsiwa xar e.

Ne rast dibêjî.
Xwînê dirêjî.
Pîr nabî ev gul.
Serxweş û gêj î.

Tu rind û pak î.
Ji av û xak î.
Dilê me kul kir.
Arî me nakî.

Institut kurde de Paris

Bilbil tu zanî,
Tu tim serbest î,
Bê lîs û hêlîn,
Ez im Cegerxwîn,

Navê te rast e,
Şahê dilgîran,
Navê yara te,
Dibînim îro,

Çawa ez zanim,
Derdê me kûr e,
Tu gul naxwazî,
Vîna bi nazî,

Ev derdê min bû,
Seyda te çawa,
Gul bû yara min,
Çû destê dijmin,

Derdê te kûr e,
Gelek tolaz e,
Dijmin diçênî,
Herkes dibênî,

Dilketin yek e,
Evîna ji dil,
Ez bûm Cegerxwîn,
Bi ah û nalîn,

Gelo ez kî me?
Lê ez girtî me.
Bê ol û bê dîn,
Xortê kurdî me.

Xweş e Cegerxwîn.
Seydayê evîn.
Perê Kurdistan.
Va bûye şêrîn.

Bilbil ne gêj e.
Derdê xwe bêje.
Gul te naxwazî?
Jana dirêj e.

Lê kes nizanî.
Zû tê deranî,
Ev bû para min.
Ez mame wanî.

Ev rast e bilbil.
Yara te sorgul..
Perdê hiltênî.
Bê derd û bê kul.

Divê yek bî yar.
Dîdar e dijwar.
Tu bûy dilbirîn.
Ji destê neyar.

Institut Kurde de Paris

## DENGBÊJ

Ey dengbêjê zana, Wey dilge ê cana
Sazên we kevnar in, Lewra hun bêzar in.
Şazên nû peyda kin, Dilê me pê şa kin.
Mûzîka bixwênin, Tiştne nû derênin.
Bi vî rengê nûjen, Dil bi şadî devken.
Li xan û eywanan, Bixwênin xweşxwanan.
Em hemî dilgeş bin, Meynoş û serxweş bin.
Roj û şevan şadî, Bikin kurd û madî.
Gav û dem û çaxan, Di nav rez û baẍan.
Bi kurdan wexş bibî jîn, Nebin kes Cegerxwîn.

## JI SERLEŞKEREKÎ RE

Ey şehê alîcenab Cibrîl ji ezman dakevî,
Piştemêrê te Keyo bit, da tu serbest rakevî.

Ristem û Ferhad û Çopîn, bendê fermana te bin,
Ta ko jîndarî ji ser textê seadet nakevî.

Ew serê herdem di fermana te xwar û pêl nebî,
Ew li ber şemşîr û tîẍê te bi lerz û ta kewî.

Ez Cegerxwîn wek Zeradeşt her diagoyê ezmeket,
Wek Selahedîn û Kesra rûtbeket bala kevî.

Institut kurde de Paris

## Bi kurtî Jîna min

Sala hezar û nehsed û sê ez hatim dinyayê,
Bi navê siltan Şêxmûs ez çêbûme ji dayê.

Heta bûm sêzde salî li gundê me y Hesarê,
Jîna xwe min diborand paşê ji wê me da rê.

Bavê min ê rîsipî xwedî mirov û rûmet,
Ne mrovekî malgenî bi namûs û bi xîret.

Ji tengasî, neçarî me ew gundê xwe berda,
Hatin Amûda rengî bavê min zû emir da.

Diya min a belengaz pêncî salî dilovan,
Salek piştî bavê min ew jî li wî bû mêvan.

Birayê min ê nivmele ji alema rohanî,
Rast û dirist çi bêjî ew tiştekî nizanî.

Wî pîreka xwe anî bê wijdan û bê mijî,
Bi gotinên xwe ên çors, ew min bê derb dikujî.

Xweşka min a xwendewar bê insaf û bê wijdan,
Ez reviyam hatim cem wê jî ez kirme şivan.

Geh li vir û geh li wê min ezabek mezin xwar,
Ya El-lah û ya Xwedê paşê bûme xwendewar.

Jîna min ya kevnare îdî hate guhartin,
Tev xweşî û zanebûn heft heşt sala hin bi hin.

Min dest bi kurdiyê kir peyda kirim çend mirîd,
Bi xweşxwan û reşbelek xesma piştî Şêx Seîd.

Paşê çûme Iraqê ji wê ez çûme Îran,
Heçî kesê bidîma ji min dimane heyran.

Berî sala rehmetî bi çar salan dilbirîn,
Di şi'rê de navê xwe min datanî cegerxwîn.

Min îcaza xwe sitand bi serbestî mêranî,
Ji nû keça xalê xwe ji Hesara xwe anî.

Bûm melayê Hasda jor cibepoş û ser bi şaş,
Ji nû riya rast û xweş bû ser jor û rêl û kaş.

Institut kurde de Paris

Min bi dûvê dinê girt, vîna wê ket dilê min,
Barê gund û ê kulfet, hemî ket ser milê min.

Paşê hate bîra min ko ez bibim xwedî gund,
Dilê min jî gote min gelek baş û gelek rind.

Min ji axa Cizîrê du gund girtin kul û xem,
Navê yekî Çêlek bû, êdî me kir Cehen-nem.

Di nav me de ne ma bûn ne axa û ne kêxwe,
Elo Çelo kum bi qul, min tev kirin wekî xwe.

Roja me gund ava kir kete rastê mixtarî,
Gundên me bûn berberî dijminahî, neyarî.

Tevan girtin darên xwe bûne weke gurên har,
Ji wî bextê min ê reş kurê Potê bû mixtar.

Sermiyanê wî derew li ser wî bû berberî,
Wek Dûçeyê talyanî paşê wî jî bi xwe de rî.

Xwedî mal û xwedî gund li bergîlê bû siwar,
Rê jê xiste mala xwe Tiro paşê bû etar.

Piştî ilmê xwe ê pir bûm Dodoyê qulingvad,
Bûm hevalê kum bi qul kurê Potê sermiyan.

Ev cihana xapînok heta me jê xwe nas kir,
Çi b'kim fêde ne maye emrê xwe min xelas kir.

Çima rastî dibêjim li nav dîna bûme dîn,
Heta bimrim ji nû ve xelk ê bêjin Cegerxwîn.

**HEW**



Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## ESERÊN CEGERXWÎN ÊN NEÇAPKIRI

1 — *Çîroka Gulperî (roman)* (Kitêbxana Hawarê, no 20,
2 — *Rastkirzimana Kurdî (serf û nehw).*
3 — *Tarîxa Kurd.*
4 — *Şerefnama menzûm.*
5 — *Gotinên pêşiyan (mamik û medhelok)*
6 — *Hespên xweşxwanên kurdî (erûza kurdî).*

## KOVAR Û ROJNAMEYÊN KURDÎ

**RIYA TAZE** — Li Rawanê bi zarê kurdmancî û bi tîpên kurdî dertêt.
**JÎN** — Li Silêmaniyê ( Iraq ) bi zarê soranî û bi tîpên erebî dertêt.
**DENGÎ GÎTIYÎ TAZE** — Li Bexdayê (Iraq) bi zarê soranî û bi tîpên erbî.
**GELAWÊJ** — Li bexdayê (Iraq) bi zarê soranî û bi tîpên erebî dertêt.
**HAWAR** — Li Şamê (Sûriye) bi zarê kurdmancî û bi tîpên kurdî dertêt.
**RONAHÎ** — Li Şamê (Sûriye) bi zarê kurdmancî û bi tîpên kurdî dertêt.
**STÊR** — Li Bêrûtê (Libnan) bi zarê kurdmancî û bi tîpên kurdî dertêt.
**ROJA-NÛ** — Li Bêrûtê (Libnan) bi zarê kurdmancî û bi tîpên kurdî dertêt.
**NÎŞTIMAN** — Li Lehîcanê (Îran) bi zarê soranî û bi tîpên erebî dertêt.

**Behayê Diwanê: 5 Lireyên Sûrî**

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

## ESERÊN CEGERXWÎN ÊN NEÇAPKIRI

1 — *Çîroka Gulperî (roman)*( Kitêbxana Hawarê, no 20,
2 — *Rastkirzimana Kurdî (serf û nehw).*
3 — *Tarîxa Kurd.*
4 — *Şerefnama menzûm.*
5 — *Gotinên pêşiyan (mamik û medhelok)*
6 — *Hespên xweşxwanên kurdî (erûza kurdî).*

## KOVAR Û ROJNAMEYÊN KURDÎ

RIYA TAZE — Li Rawanê bi zarê kurdmancî û bi tîpên kurdî dertêt.
JÎN — Li Silêmaniyê ( Iraq ) bi zarê soranî û bi tîpên erebî dertêt.
DENGÎ GÎTIYÎ TAZE — Li Bexdayê (Iraq) bi zarê soranî û bi tîpên erbî.
GELAWÊJ — Li bexdayê (Iraq) bi zarê soranî û bi tîpên erebî dertêt.
HAWAR — Li Şamê (Sûriye) bi zarê kurdmancî û bi tîpên kurdî dertêt.
RONAHÎ — Li Şamê (Sûriye) bi zarê kurdmancî û bi tîpên kurdî dertêt.
STÊR — Li Bêrûtê (Libnan) bi zarê kurdmancî û bi tîpên kurdî dertêt.
ROJA-NÛ— Li Bêrûtê (Libnan) bi zarê kurdmancî û bi tîpên kurdî dertêt.
NÎŞTIMAN — Li Lehîcanê (Îran) bi zarê soranî û bi tîpên erebî dertêt.

Institut kurde de Paris

**Behayê Diwanê: 5 Lireyên Sûrî**

Institut kurde de Paris

PRE.803

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris